

Mikaîl BILBIL

Bahoz BARAN

# Rêzimana Kurmancî



Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Amedê: 13  
Rêziman: 3

**RÊZIMANA KURMANCÎ**  
Mikaîl BILBIL-Bahoz BARAN

**Sererastkirin:**  
Serwet DENÎZ

**Berg û Rûpelsazî:**  
Azad ZAL

**Çapa Yekem:**  
Berfanbar 2008

**Çapxane:**  
Gün Matbaacılık  
Reklam Film Basın Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti.  
Adres: Beşyol Mahallesi Akasya Sokak 23/A  
Sefaköy Küçükçekmece İSTANBUL  
Tif: (212)580 63 80

**ISBN: 978-975-01719-2-5**

**EDUBBA**  
*Sosyal Bilim Bilgi İletişim Merkezi*  
*Basın Yayın Reklamcılık*  
*Eğitim Sanayi ve Ticaret Limited Şirketi*

**Navnîşan:**  
Huzurevleri Mah. 63. Sokak No: 32 Kat: 4  
Kayapınar / DİYARBAKIR

**Tif/Fax:** (0412) 237 43 16

**e-mail:** enstituamed@hotmail.com

**Mikaîl BILBIL**

*Di sala 1978'an de li gundê Mêrdîn'ê, li Cîmîkê çê bûye û li Qoserê mezin bûye. Li Zanîngeha Çûkorova'yê Beşa Mamostetîya Koma Felsefeyê xwendîye.*

**Bahoz BARAN**

*Bî navê xwe yê fermî Bahattin TAMAN di sala 1982'yan de li navçeya Amedê, li Lice'yê çê bûye. Li Zanîngeha Dicle'yê Beşa Mamostetîya Tirkî xwendîye.*

*Vê pirtûkê diyarî diya xwe Xanimê, Mahabadê û Şevger Jakaw dikim.*  
**Bahoz BARAN**

*Vê xebatê diyarî diya xwe û hevjinê xwe Aslîxanê dikim.*  
**Mikaîl BILBIL**

## NAVEROK

Pêşek .....	7
Pêşgotin .....	9
Kurmanci .....	11
Alfabe-Dengzanî .....	13
Wateya Peyvan .....	23
Peyvsazî / Qertafên Kurmancî .....	30
Navdêr .....	37
Rengdêr .....	48
Cînavk .....	54
Hoker .....	60
Daçek .....	63
Gihanek, Baneşan .....	67
Lêker .....	70
Avaniya Lêkeran .....	93
Lêkernav .....	96
Hêmanên Hevokê .....	99
Cureyên Hevokê .....	106
Şaşıyên Vegotinê .....	112
Rastnivîs .....	121
Xalbandî .....	132
Ferhengok .....	141
Çavkanî .....	144



## PÊŞEK

Kurdî Der di sala 2006'an de ji bo ku di warê Kurdî de xebatên lêkolîn, lêgerîn û pêşvebirinê bike ava bûye. Ji avakarina wê û vir de xebatên atolyeyî û di warê rêbazên fêrbûn û fêrkirina ziman de gihâştîye qonaxekê. Bi taybetî di vê pêvajoyê de ji ber rewşa ku Kurdî tê de ye, pêwistiya bi xebatên ziman hîn girîngtir bûye. Kurdî Der ji ber radeya ku têkoşîna gelê Kurd gihîştîyê û xebatên lêkolîn, lêgerîn û pêşvebirina ziman weke lingekî têkoşînê yê jiyânî û jênegar dibîne, her cure xebatên li ser ziman weke karên pîroz, bi xweşbînî pêşwazî dike.

Di çerçoweya xebatên ziman de di navbera demên 10.12.2007 û 10.06.2008'an de Kurdî Derê bi saziya Qatalanî Ciemen (Centre internacional escarré per a les minories étniques i les nacions) re xebata gihandina mamosteyan kiribû; ev xebat bû sedema fikirîna xebateke rêzimanî ya sistematîk, hêsan û xwerû bi Kurdî ku xitabî perwerdekarên Kurdî bike. Bi vê armancê du endamên komeleya me yê ciwan Mikaîl Bilbil û Bahoz BARAN pirtûkeke rêzimanî ya Kurmancî ku sistematîk û perwerdekirinê hêsantir bike amade kirine. Em jî weke komele vê xebatê bi alîkariya saziya Qatalanî Ciemen'ê pêşkêşî pêwendîdarên ziman dikin û hêvî dikin ku ev xebat di warê rêzimana Kurmancî bikêr û sûdewer be. Ji bo alîkariya Ciemenê , em bi dilgermî spasîyên xwe pêşkêş dikin.

Ligel silav û rêzên xwe .

***Revebiriya Kurdî Derê***





## Pêşgotin

*Ev pirtûk, bi taybetî ji bo ku kesên ku li ser rêzimana Kurmancî dixebitin û perwerdehiyê an mamostetiyê dikin; ji bo ku xebateke xwerû bi Kurmancî, sîstematîk û hêsan li ber destê wan hebe, hatiye amadekirin. Xebatên li ser rêzimana Kurmancî her çiqas ji mêj ve hatibin kirin jî, ji ber şertên tarîxî, civakî û polîtîk xebatên li ser Kurmancî ne pir zêde ne û warekî beyar maye.*

*Li ser rêzimana Kurmancî bê şik û şek, heta îro xebata herî bingehîn, berfireh û girîng pirtûka Celadet A. Bedirxan û Roger Lescot a bi navê “Rêzimana Kurmancî” ye. Her çiqas beriya vê û piştî vê xebatê jî xebat hebin jî tu xebateke ku mîna vê xebata giranbûha bûye referans û çavkanî, tune ye. Lê ew xebat jî dema em bala xwe didinê em dibînin ku xebateke akademîk e û weke xebatên din ên ku piştî wê jî hatine kirin, ji bo hînbûn û hînkirinê ne pir guncav in.*

*Di vê pirtûkê de hin ravekirin, babet û rêbazên cuda hene. Mijara tewangê bi pîvan û awayekî cuda hatiye ravekirin; qertafên ku weke yê tewangê dihatin zanîn weke yê diyariyê hatine dayîn. Hin mijarên weke “lêkernav, şaşiyên vegotinê hwd.” nû li rêzimanê hatine zêdekirin û bi hûrbîna hatine ravekirin. Dem û mijara raderê bi awayekî din hatiye dayîn. Hema hema li ser hemû mijaran, pîvan, rêbaz û ravekirinên cuda û mijarê hêsantir dikin hene.*

*Heta ku ji me hat, me mijar hêsantir û xwerûtir kirin ku rehet bîna famkirin, loma jî di serê her mijarê de, şemaya mijarê hatiye dayîn.*

*Weke her xebatê di vê xebatê de jî mimkûn e ku kêmanî û çewtî hebin. Jixwe di rêzimana Kurmancî de li ser têgeh, sîstematîk û ravekirinan hevgrîtinek xurt tune ye. Em hêvî dikin ku ev pirtûk, rê li ber nîqaşên rêzimanî veke û di rêzimana Kurmancî de hin tişt bêtîr rûnên û bi pêş kevin.*

### **Spasdarî**

*Di serî de ji hemû heval û xebatkarên Kurdî-Dera Amedê û saziya Qatalanî Ciemen (Centre internacional escarré per a les minories étniques i les nacions) ku alîkarî û desteka vê xebatê kirin, em spasiyên xwe pêşkêş dikin. Her wiha hevalên ku rexne û dîtînen xwe li ser pirtûkê bi me re parve kirin û kirin ku em gelek kêmaniyên xwe bibînin ji Lokman Koçhan, Zilkîf Xweşnav, Israfil Bilbil û Meral Varişli re jî em gelekî spasdar in .*

*Berfanbar 2008*

**Mikaîl BILBIL - Bahoz BARAN**

# KURMANCÎ

Kurdî di nava malbata zimanên Hînd-Ewrûpî de ye. Di nava vê malbatê de jî dikeve beşa Zimanên Îranî. Kurdî şaxa li bakûrê rojavayê Îranê ye. Li ser zaravayên Kurdî lihevkirinek tune ye û ev karê zimanzanan e, lê ji aliyê nêzîkbûna zaravayan ve dema em bala xwe bidinê em dikarin bikin du beş: 1) Kurmancî û Soranî 2) Zazakî, Goranî, Hewremanî, Loranî. Yanî Kurmancî û Soranî nêzî hev in û Zazakî, Goranî, Hewremanî û Loranî jî nêzî hev in û ev yek hebûna du zaravayên bingehîn tîne bîra mirovan.

Zimanzan, zimanên cîhanê ji aliyê sazûnê ve dikin sê beş: 1) Zimanên Yekîteyî, di van zimanan de qertaf tune ne û hemû peyv ji kîteyekê pêk hatine. 2) Zimanên qertafî, qertafên çêker û qertafên diyarker tên ser koka peyvên û di kokên peyvên de tu guhertin çê nabe. Weke mînak Tirkî dikeve vê beşê û zimanekî parkîtî ye. 3) Zimanên tewngbar, dema peyv tîne çêkirin û diyarkirin di koka peyvên de guhertin çê dibe. Yanî tewang rêbazên çêkirin û diyarkirina guherîna hundirê peyvê ye. Zimanê Erebi jî bo tewangê mînakeke baş e; Peyvên “kitûb”, “katîb”, “mektûb” “mekteb” ji koka xwe ve guherîne û bi riya tewangê peyvên nû çê bûne. Kurmancî jî dikeve nava vê malbatê lê ji aliyê tewangbariya xwe ve pir cuda ye. Di Kurmancî de çêkirin û diyarkirina peyvên bi riya qertafan çê dibe û bi vê taybetiya xwe nêzî zimanên qertafî ye. Jixwe di Kurmancî de peyvên nû bi riya tewangê qet çê nabin lê di diyarkirina hin peyvên ji aliyê zayenda xwe ve nêr in de (bajêr, nêr, mêst) û hin cînavkên kesane ve bandora tewangê heye. Her wiha di kişandina lêkerên xwerû de ku ev lêkerên bêrist in û hindik in (xwarin, kirin, bûn, dan) guhertin ji hundirê peyvê çê dibe. Zimanê Îngilîzî jî zimanekî tewngbar bû lê tewangbariya Îngilîzî bi awayekî xurt ji holê rabûye; ji bilî lêkerên bêrist (go/went/gone) û formên diyarkirî yên cînavkan û forma pirjimariya hin navdêran (man/men, child/children) mirov rastî guhertina hundirê peyvê nayê.

Kurmancî zimanekî fonetîk e, yanî çawa tê nivîsîn wisa jî tê xwendin. Kurmancî zimanekî ergatîf û aqûzatîf e. Di kurmancî de ergatîfî ew e ku pêveber li gorî bireserê qertafan distîne. Loma jî Kurmancî di dema boriya gerguhêz de ergatîf e. Aqûzatîfî jî ew e ku navdêr karibin bi qertafan bi awayekî din bên diyarkirin. Di Kurmancî de diyarkirina navdêran bi qertafan çê dibe; qertafên diyarkirinê (î,ê,an) jî hem mêjer hem jî zayenda navdêran diyar dikin. Di Kurmancî de, di dema niha û bê de bireser divê bên diyarkirin (Ez hevalan dibînim) lê di dema borî de diyarkirina bireserê, ji ber ergatîfîyê, bi alîkariya pêveberê çê dibe û hew ji aliyê mêjerê ve ye; (Min heval dîtin).

# ALFABE-DENGZANÎ

- Dengzanî
- Alfabe
- Taybetiyên Dengdêran
  - Pevguherîna Dengdêran
  - Ketina Dengdêran
  - Dengdêrên Alîkar
  - Kurtbûna Dengdêran
  
- Taybetiyên Dengdaran
  - Pevdeng
  - Rengedeng
  - Dengdarên Alîkar
  - Pevguherîna Dengdaran
  - Ketina Dengdaran
  
- Racivîna Peyvan
- Veguhêzîn
- Derbandin
- Kîtekirin

# DENGZANÎ

Taybetiyên her zimanî hene; zanista ku dengan, bûyîna dengan û guherînên dengan vedikole û dişopîne dengzanî (fonetîk) ye.

Parçeyê herî biçûk ê peyvê “deng e”. Di alfebeyê de em ji nîşana wê re dibêjin “tîp”. Her tîp navê dengekî ye. Alfebe jî ji tîpan pêk tê. Tîp kîteyan, kîte jî peyv, peyv jî hevokan çê dikin.

Alfabeya Kurmancî ya latînî cara yekemîn ji hêla Celadet A. Bedirxan ve di Hawar’ê de hatiye ceribandin. Di alfabeya Kurmancî de sih û yek tîp hene.

## ALFABE

### Tîpên Girdek:

A, B, C, Ç, D, E, Ê, F, G, H, I, Î, J, K, L, M, N, O, P, Q, R, S, Ş, T, U, Û, V, W, X, Y, Z

### Tîpên Hûrek:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

### Dengdêr:

Tîpên ku di gotinê de rastî tu astengiyên nayên tîpên dengdêrin.

a e ê i î o u û

### Dengdar:

Di gotinê de rastî astengiyê tên û bêyî tîpên dengdêr der nakevin.

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

## TAYBETIYÊN DENG DÊRAN

**A-** Dema der dikevin rastî tu astengiyê nayên. Bi tena serê xwe dikarin bî xwendin.

**Dengdêrên Kurt:** e, i, u

**e:** ber dev, ser (pêşdevkî-nizm )

**i:** bir, kir, mir (paşdevkî-bilind)

**u:** gul, kul, kur (paşdevkî-bilind)

**Dengdêrên Dirêj:** a, ê, î, o, û

**a:** hal, kal, mal (paşdevkî-nizm )

**ê:** bêr, kêr, mêr (pêşdevkî-navîn)

**î:** bîr, mîr, şîr (pêşdevkî-bilind)

**o:** kol, mor, pol (paşdevkî-nizm )

**û:** hûr, kûr, şûr (paşdevkî-bilind)

**Dîrêj, kurt:** Li gorî domkirina tîpê

**Pêşdevkî, paşdevkî:** Li gorî cihê derketinê

**Bilind, navîn, nizm:** Li gorî asta derketinê

	Yên dirêj		Yên kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		î, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

### **Pevguherîna Dengdêran**

Di kişandina hinek lêkeran de tîpa “-a” dibe “-ê.”

**Mînak:** Bijartin → bibijêre

Haştin → di+hê+im→têim

Parastin → biparêze

**B-** Di Kurmancî de dengdêrên ku herî pir tîpên bikaranîn “e” û “î” ne. Di gelek peyvan de cih diguherin.

**Mînak:** Çel-çîl

merov-mîrov

tejî-tijî

wenda-wînda

**C-** Peyvên nêr li hin herêman dema ku tîpa “a”, “e” di wan de hebe û tîpên diyarkirin ji nava xwe de ditewin.

**Mînak:** Bajar-bajêr

gavan-gavên

maşt-mêst

xanî-xênî

**D-** Di hin peyvan de pevguherîna tîpên “î”, “o” û “û” çê dibe.

**Mînak:** jîjo-jojî- jûjî

kîso-kosî- kûsî

sîsin-sosin-sûsin

honandin -hûnandin

kovî -kûvî

rovî-rûvî

E- Di hin formên lêkerên cêwî de pevguherîna tîpên “î” û “a” çê dibe.

**Mînak:** çêrî<sup>n</sup>-çêra<sup>n</sup>      jiyî<sup>n</sup>-jiya<sup>n</sup>  
kolî<sup>n</sup>-kola<sup>n</sup>      kutî<sup>n</sup>-kuta<sup>n</sup>

F- Di hin peyvên de pevguherîna tîpên “e” û “ê” çê dibe.

**Mînak:** herem-herê<sup>m</sup>      dersim-dê<sup>r</sup>sim  
tekoşîn-tê<sup>ko</sup>şîn      mejî-mê<sup>jî</sup>

### Ketina Dengdêran

A- Hin peyv dema ku di kîteya wan a dawîn de tîpa “î” hebe û dengdêrekê bistîne “î” dikeve.

**Mînak:** qetî<sup>l</sup>+a→ qetla wî      kevî<sup>n</sup>-e→ kevn e  
bihî<sup>n</sup>+ok→bihnok

B- Carinan di qîşandina lêkeran de dema lêker bi dengdêrê dest pê bike “î”ya bi- û di-‘yê dikeve.

**Mînak:** bî<sup>+</sup>ajo= bajo      dî<sup>+</sup>îne= tîne  
dî<sup>+</sup>avêjim= davêjim      bî<sup>+</sup>îne=bîne  
bî<sup>+</sup>avêj=bavêje      na<sup>+</sup>ajo-im=najom

C- Dema qertafa kesê yekemîn –im berî dengdêrekê bê tîpa “î” dikeve.

**Mînak:** bû<sup>+</sup>im= bûm  
di+dirû<sup>+</sup>im= didirûm  
di+ajo<sup>+</sup>im=dajom

D- Hin cînavk dema ku qertafên diyariyê distînin dengdêra serê wan dikeve.

**Mînak:** ew<sup>+</sup>î= vî      ew<sup>+</sup>î=wî  
ew<sup>+</sup>an= van      ew<sup>+</sup>an= wan

E- Dema radera lêkeran “-in” piştî dengdêrekê bê, “-i” jê dikeve.

**Mînak:** ken+î+î<sup>n</sup>=kenî<sup>n</sup>      rev+î+î<sup>n</sup>=revî<sup>n</sup>  
kol+a+î<sup>n</sup>=kolan      pêç+a+î<sup>n</sup>=pêçan

F- Cînavka qertafî “-ê” dema ku tê dawiya daçekên “li, di, ji, bi” dengdêra daçekê “î” dikeve.

**Mînak:** lî+ê= lê      lê vegere      dî+ê= tê      tê de ye  
bî+ê=pê      pê bixwe      jî+ê=jê      jê bistîne

G- Dema ku daçekên “bi, di, li, ji” bi cînavka “hev” û “êk” re dibin yek dengdêra xwe winda dikin.

**Mînak:** lî+hev=lev      dî+hev=tev      jî+hev=jev  
bî+hev=pev      lî+êk= lêk      dî+êk=têk  
jî+êk=jêk      bî+êk=pêk



## Dengdêrên Alîkar

**A-** Di peyvên hevedanî de dengdêrên alîkar tên bikaranîn.

**Mînak:** Germ+germ=germegerm  
Rast+rast=rasterast  
Ser+nav=serenav

**Nîşe:** Gihaneka “û” jî carinan weke tîpeke alîkar tê bikaranîn.

**Mînak:** Got+bêj=gotûbêj, Kel+girî=kel(û)ogirî

**B-** Di hin lêkeran de dengdêra alîkar “î” tê bikaranîn.

**Mînak:** Ez hat+i+bûm wî bir+i+ye ew keti+bû

## Kurtbûna Dengdêran

**A-** Beriya tîpa “y” yê dema ku tîpa “î” were ev tîp kurt dibe û dibe “i”. Ji ber ku “y” tîpeke nîvdengdêr e û “î”yê qebûl nake, wê kurt dike.

**Mînak:** Sîya darê çî xweş e.  
Li hêvîya te mam.

**B-** Beriya tîpa “y” yê tîpa “ê” bê kurt dibe û dibe “i”.

**Mînak:** Dê → dîya min.  
Rê → rîya me.  
Pê → pîyê wê.

**C-** Beriya tîpa “w”yê “û” û “u” nayên dema tên jî kurt dibin û dibin “i”.

**Mînak:** Tû → tîwa reş                      du → dîwemîn  
Xwesû → xwesîwa min                      rû → rîwê min

**Nîşe:** Sedem ev e: w+i= u    “w” û “u” ji aliyê jêderkê ve nêzî hev in û dengên ku dişibin hev tehemûlî hev nakin.

Dema em li şûna “w” yê ‘y’yê bi kar bînin hewce nake ku “û” bibe “i”. Bi vî awayî koka peyvê jî tê parastin.

**Mînak:** Rûyê min, tûya hewşê

**D-** Hin navdêr dema ku dibin lêker tîpa wan ya dirêj kurt dibe.

**Mînak:** şewat- şewîtîn,                      xebat-xebîtîn  
tebat-tebîtîn                      serad- serîdîn  
xenaq-xenîqîn                      şenaq-şenîqîn

## TAYBETIYÊN DENGARAN

Dengdar di derketinê de rastî astengiyan tên û bê alîkariya dengdêran der nakevin.

### Li gorî cihê derketinê tabloya dengdar

Yên lêvkî	Yên diranî	Yên pêşarikî	Yên qirikî û arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	c, ç, ş, j, y	g, h, k, q, x

### Li gorî asta derketinê û domdariyê tabloya dengdar

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

### Pevdeng

Di Kurmancî de tîpên “x” û “w” pevdengê çê dikin. Di derbekê de tên xwendin; ji ber ku tîpa “x” û tîpa “w” dema tên ber hev û tên xwendin dengê wan tevlihev dibe û êdî ne mîna du tîpan tên xwendin, pevdeng tê gotin.

**Mînak:** Xwişk, xwarin, xwarzê

### Rengedeng

Tîpên me yên p, ç, t, k hişk in lê di hinek peyvan de asta hişk-bûna wan dikeve û bêbêhn tên xwendin.

**Mînak:** Hişk (bibêhn)

Pol, pak

Çar, çawa

Tax, tor

Kosî, kambax

Nehişk (bêbêhn)

pez, penîr

çem, çiv

teng, tarî

kew, kevir

### Dengdarên Alîkar

Di Kurmancî de dema ku peyvek bi dengdêrekê xilas bibe û qertafa ku bi dengdêrê dest pê dike bistîne dengdarên alîkar “h, y, w” dikeve navbera wan û vegotinê hêsantir dike.

**Mînak:** Rû+ê te = Rûyê te

Xweda+î= Xwedahî,

Kurê Leylayê yê mezin

Firense+î = Firenseyî

tahde+î= Tahdehî

tu mamoste yî.

## Pevguherîna Dengdaran

**A-** Dengdarên ku jêderka wan nêzî hev in musaît in ku bi hev biguherin. Di kişandina hin lêkeran de hin tîpên dengdar diguherin. Qertafên demê jî carinan diguherin.

**Mînak:** **ş-j**→ kuştin → dikuje biraştin→ bibirêje  
**d-t**→hatin → dihêm→têm dînim→tînim  
**s-z**→lîstin →dilîzim parastin→diparêzim  
**f-v**→hingaftin →dihingêvim axaftin→diaxivim

**B-** Di hinek peyvan de pevguherîna tîpên “**t-ç**” çê dibe.

**Mînak:** Tune çune  
Tu çu  
Têjik çêjik

**C-** Di hin peyvan de pevguherîna tîpên “**l-r**” çê dibe.

**Mînak:** Şalûr şalûl  
Arîkar alîkar  
Kermêş kelmêş

**D-** Di hin peyvan de pevguherîna dengên “**b-v**” çê dibe.

**Mînak:** Babb bayv  
Bibê bivê  
Xirabb xiravv

**E-** Dema ku daçekên mîna ji, li, bi, di bi cînavka qertafî “**ê**”yê re dibin yek pevguherîna

dengên “**d-t**” û “**b-p**” çê dibe.

**Mînak:** Bi/ê=pê di+/ê=tê

**F-** Di hin peyvan de pevguherîna tîpên “**q-k**” çê dibe.

**Mînak:** Qizwan-kizwan, fêqî-fêkî, kutan-qutan

## Ketina Dengdaran

Ji ber ku ziman dînamîk e û peyv her dem wek xwe namînîn û guhertin di wan de çê dibin; deng ji wan dikevin, guhertin di dengên de çê dibe û peyv hêsantir û pratîktir dibin. Bi ketina dengdaran re jî gotin hîn hêsantir û herikbartir dibe. Ketina dengdaran bi van awayan çê dibe:

**A-** Di Kurmancî de tîp xwe dubare nake; yek jê dikeve.

**Mînak:** Xurt+tir=xurtir Rast+tir=rastir  
Paş+şîv=Paşîv Yek+kîte=yekîte

**B-** Di hin peyvan de “**t**” ketiye.

**Mînak:** Hefttdeh→hevdeh Heşttdej→hijdeh  
Desttgeh→desgeh Dottmam→domam

**C-** Hinek lêker di forma xwe ya raderîn û dema borî de hinek tîpan winda dikin.

**Mînak:** Avêjtin=avêtin /avêt                      Doştin=dotin/dot  
Sojtin=sotin/sot                                      firoştin=firotin/firot

**D-** Peyvên Kurmancî piranî bi dengdêran naqedin. Lê hêdî hêdî ev guherîn çê bûye.

**Mînak:** Roj→ro              destşok→destşo              pey→pê  
Fireh→fire              tirîh→tirî                      gilîh→gilî  
Cih→cî                      mih→mî                              sih→sî

**E-** Peyvên Kurmancî pir bi dengdêran dest pê nakin. Berê li serê wan peyvan “h” hebûye.

**Mînak:** Hêvar→êvar              hêş→êş                      hênan→înan  
Hûçik→ûçik                      hozan→ozan

### **RACIVÎNA PEYVAN**

Peyv, her ku tên bikaranîn meyla wan a kurtbûn, pratîzebûn û hêsanbûnê heye. Loma jî di fonetîka wan de hin guherîn çê dibe û racivîn pêk tê.

**A-** Di Kurmancî de bi taybetî di peyvên ku di bilêvkirina wan de zehmetî hebe an jî hinekî dirêj bin meyla wan a kinbûnê û racivînê heye.

**Mînak:** Tihin→tî              kehî→kani              tirîh→tirî  
Dihîtin→dîtin              xweher→xwar              behwer→bawer  
Çehlek→çêlek              cih→cî                      dihun→don

**B-** Di hinek bikaranînan de daçekên “li, ji,” radicivîn “-î”yê û bi peyvan ve tên nivîsîn.

**Mînak:** Ez rast li wî hatim.              Ez rastî wî hatim.  
Min telefon li wî kir.              min telefonî wî kir.  
Di zanebûnê de ne kêma ji wî ye.  
Di zanebûnê de ne kêmaî wî ye .  
Ez bêhtir ji wî dixebitim.  
Ez bêhtirî wî dixebitim.

**C-** Hinek peyv jî ji racivîna du an bêhtir hêmanan pêk hatine.

**Mînak:** kî+ji+wan=kîjan              çî+awa=çawa  
eger+çî=gerçî                      çîma+ku=çîmkî  
ji +bûyîna= ji bona              belê+ku=belkî  
ji+hev=jev                              bi+hev=pev  
dî+hev=tev                              li+hev=lev  
wanên+ha=wana                      vanên+ha=vana  
vê+derê=vir                              wê+derê=wir  
ji+wî/wê/wan=jê                      li+wî/wê/=lê  
bi/wê/wî=pê                              di+/wê/wî=tê

**D-** Lêkerên gerguhêz û dançêker bi qertafa **-and'**ê çê dibin. Di hin lêkeran de **-and'** bûye **"t"**.

**Mînak:** Guvêşandin= guvaştin  
qeşirandin=qeşartin  
mijandin=mijtin

bihîsandin=bihîsttin  
guherandin=guherttin

### VEGUHÊZÎN(Metatez)

Di hinek peyvên Kurmancî de dengdar cihê xwe vediguhêzin hev.

**Mînak:** desgirtî→ dergistî  
berf →befr  
derwêş→dewrêş

şerwal →şelwar  
nîvro→nîrvo  
hevrişim →hevirmêş

### DERBANDIN

Derbandin ew tişt e ku di peyvê de kîteyek ji kîteyên din û di hevokê de jî peyvek ji peyvên din xurtir û bilintir tê bilêvkirin.

#### Derbandina Peyvê

Derbandin bi piranî di peyvê de, di kîteya dawîn de ye.

**Mînak:** kevir                      ferman  
          mase                      hatin  
          birin                      qelandî  
          daristan                  pênaûs

**Nîşe:** Di hin bikaranînan de dibe ku cihê derbandinê biguhere.

**Mînak:**                      Hevaltî,                      Sipîsor,                      Amed,

#### Derbandina Hevokê

Derbandina hevokê li gorî pêveberê tê diyarkirin. Di hevokê de peyva berî pêveberê tê, tê derbandin.

**Mînak:** Min do li sûkê nan xwar. ("nan" hatiye derbandin)  
Min do nan li sûkê xwar. ("sûk" hatiye derbandin)  
Min nan li sûkê do xwar ("do" hatiye derbandin)  
Li sûkê do nan min xwar ("min" hatiye derbandin)

**Nîşe:** Di lêkerên berbiçûnî (datîf) de pêveber tê nava hevokê, lê dîsa peyva berî pêveberê derbê digire ser xwe.

**Mînak:** Ez do bi lez çûm dibistanê.  
Do ez çûm dibistanê.  
Ez bi lez do çûm dibistanê.

## KÎTEKIRIN

Di perçekirina peyvê de hêmana ku di yek carê de ji devê mirov der dikeve kîte ye. Dengdarek bi tena serê xwe nikare bibe kîte; lê dengdêrek bi tena serê xwe dikare bibe kîte. Kîte ji yek dengî heta çar pênc dangan jî dikare pêk bê.

**Kîteyên ji tîpekê:** a-lim, a-gir, e-vîn, î-lan

**Kîteyên ku ji du tîpan pêk tên:** ka, tu, çi, ev, ew, em

**Kîteyên ku ji sê tîpan pêk tên:** ker, ber, bar, şal, hal

**Kîteyên ku ji çar an pênc tîpan pêk tên:** stêrk, stran, strî

Em kîtekirinê li gorî bêhnstendinê dikin. Dibe ku koka peyvê ji hev bikeve ev ne girîng e; lewre parçekirin ne li gorî wateyê ye.

**Mînak:** Hi-la-nîn, da-ge-rîn, pê-ka-nîn, têk-çûn, tê-ko-şîn

**Hişyarî:** Kîteyên ku bi dengdaran xilas dibin dema piştî wan dengdêrek were dikarin parçe bibin.

**Mînak:** Hil-a-nîn (Çewt)

Hi-la-nîn (rast)

Tîr-a-vêj (Çewt)

Tî-ra-vêj (rast)

## WATEYA PEYVAN

- Wateya Rastîn
- Wateya Bingehîn
- Wateya Lêkirî
- Wateya Mecazî
- Wateya Têgînî
- Têkiliya Wateyî di Navbera Peyvan de
  - Peyvên Hemwate
  - Peyvên Nêzwate
  - Peyvên Dijwate
  - Peyvên Hevdeng
  - Peyvên Tevahî û Taybet
  - Peyvên Çawanî û Çendîniyê
  - Peyvên Şênber û Razber
- Di Navbera Peyvan de Guhêzhevî
  - Guhêzheviya Navdêran
  - Guhêzheviya Biwêjan
  - Guhêziya Mirovan a bi Xwezayê
  - Guhêziya Xwezayê ya bi Mirovan
  - Guhêziya Xwezayê ya bi Xwezayê
  - Guhêziya Sehekiyan a bi Sehekiyan
- Cudanavî
- Xweşnavî
- Peyvên Olanî
- Komên Peyvan
  - Dubestî
  - Biwêj
  - Gotinên Pêşyan
  - Gotinên Navdaran
  - Gotinên ku Bûne Qalib

## WATEYA PEYVAN

**Peyv:** Peyv ew tişt e ku em bi wê têgihîştinên xwe bi nav dikin. Tiştên razber û şênber, hemû hewcedarê peyvê ne. Peyv ji bo wan tiştan formek e.

**Mînak:** Welat, azadî, jin, jiyar, tu, mase, xwarin...

### Ji Aliyê Wateyê ve Peyv Dibin Sê Beş

**A- Wateya Rastîn:** Wateya rastîn ew tişt e ku wateya yekemîn a peyvê ye. Dema ku ew peyv tê bîra mirov pêşiyê ev wate tê bîra mirovan. Ev wate wateyeke hevpar e. Di nava xwe de dibe du beş.

**Mînak:** Min dîwar xera kir.

Darên me şewitîn.

Devê kêrê ko bûye.

**a- Wateya Bingehîn:** Ev wate bingeha peyvê çê dike, wateya wê ya yekemîn e. Li gorî her kesî heman tişt e ev wate.

**Mînak:** Min ew kuşt.

Te dîwar xera kir.

Wê mal paqij kir.

Li jor, her sê peyvên ku binê wan hatiye xêzkirin di wateya xwe ya bingehîn de hatine bikaranîn. Heman wate tê hişê hemû mirovan.

**b- Wateya Lêkirî:** Peyv bi guhertin û pêşketina mirovahiyê, hêdî hêdî hin wateyên din jî dikarin li xwe bar bikin. Ev wateyên lêkirî ne. Ev wate, têkiliya xwe bi wateya bingehîn re nabire. Di wateya bingehîn de çî peywir girtibe, di ya lêkirî de ew peywir derbasî heyber an jî giyanberan dibe.

**Mînak:** Bi milê derî bigire û derî veke. (mil aîdê mirovan e, ji bo derî hatiye bikaranîn)

Devê kêrê ko bûye. (dev aîdê mirovan e, ji bo kêrê hatiye bikaranîn)

Defa singê min, min ditengijîne. (def aîdê xwezayê ye, ji bo mirovan hatiye bikaranîn)

Dema ku em bala xwe didinê, em dibînin ku her sê peyvên ku binê wan hatiye xêzkirin, di wateyeke din de hatine bikaranîn. Lê di bingeha xwe de ji wateya rastîn ne dûr in.

**Nîşe:** Wateya rastîn û ya bingehîn dişibin hev. Lê divê em zanibin ku wateya rastîn, wateya lêkirî jî dihundurîne. Bi vê cudahiye ji wateya bingehîn vediqete.



**B- Wateya Mecazî:** Peyv ji wateya xwe ya rastîn dûr dikeve, peyvek ji dêvla peyveke din ve tê bikaranîn. Êdî peyv ne di wateya xwe ya yekemîn de ye. Bi taybetî biwêj vegotinên mecazî ne.

**Mînak:** Te malik li min xera kir (mal ne bi awayeke fîzîkî hatiye xera kirin).

Bi awirên pîs li min nihêrt (pîs di wateya gemarî û qilêrî de nehatiye bikaranîn).

Serê min dike biteqe (teqîn dêvla êşa zêde de hatiye bikaranîn).

**C- Wateya Têgînî:** Hin peyv hene ku li gorî war û beşa xwe tèn bikaranîn. Ev war dibe ku beşeke pîşeyî, sporî, mîmarî, hunerî, erdnîgarî, hwd. dibe ku beşeke din be. Lê divê neyê ji bîr kirin ku peyv têkildarî warê xwe tê bikaranîn.

**Mînak:** Nota-Muzîk , Keval-Wêne , Patalojî-Tip, Rengdêr-Rêziman,

**Nîşe:** Eger peyvek, ne bi war û beşa xwe ve têkildar bê bikaranîn êdî ne di wateya têgînî de ye.

**Mînak:** Dinya pênc hezar salî ye(ji ber ku têkildarî erdnîgariyê hatiye bikaranîn,wateye têgihî ye).

Li dinyayê pir dîn hene (“dinya” ne di wateya têgehî de ye)

## TÊKILIYA WATEYÎ DI NAVBERA PEYVAN DE

**A- Peyvên Hemwate:** Ev peyv ji hêla teşeyê ve ji hev cuda ne; lê ji aliyê wateyê ve yek in; xwediyê heman wateyê ne.

**Mînak:** Axaftin-peyivîn xarkirin-tefandin, pilûl-sihorik, wisa-wilo

**B- Peyvên Nêzwate:** Peyvên ku ji aliyê wateya xwe ve nêzî hev in.

**Mînak:** heval-hogir, qilêr-gemar

**C- Peyvên Dijwate:** Ev pey di binyada xwe de li dijî hev in. Ne ku bi qertafan ev dijberî tê çêkirin.

**Mînak:** Reş-spî, kin-dirêj, zirav-stûr

**D- Peyvên Hevdeng:** Ev peyv ji hêla teşeyê xwe ve yek in; lê li gorî bikaranînê wateya wan diguhere.

**Mînak:** Xwendevan rêz bûn. Rêza wan ji mirovatiyê re tune.

Ji bîra min çûye. Ava bîra me çikiyaye.

Min nan xwar. Dar xwar bûye.

**E- Peyvên Tevahî û Taybet:** Peyvên ku gelek tiştan di hundirînin peyvên tevahî û yên ku tenê tiştêkî di hundirînin peyvên taybet in.

**Mînak:** Mirov, heyber, nebat, heywan (tevahî)  
Amed, Mamoste Azad (taybet)

**F- Peyvên Çawanî û Çendîniyê:** Peyvên ku mêjera tişteki didin, peyvên çendîniyê ne. Peyvên ku taybetiyên tiştan vedibêjin jî peyvên çawanîyê ne.

**Mînak:** Çar sêv, bîst û pênc derece, pir hez dike... (çendîni)  
Sêva xweş, Pirtûka sor, mirovê pîs (çawanî)

**G- Peyvên Şênber û Razber:** Peyvên ku têkildarî poz (bêhn), ziman (tehm), guh (deng), çerm (destdan) û çav (dîtin) in şênber in. Evên ku tên hiskirin û di fikran de hene razber in.

**Mînak:** Evîn, xeyal, raman (razber)  
Kevir, dil, deng, bêhn (şênber)

### DI NAVBERA PEYVAN DE GUHÊZHEVÎ

**A- Guhêzheviya Navdêran (Mecaz-i mursel):** Peyvek dema ku, bêyî ku pê ve eleqedar be, ji dêvla peyvek din ve bê bikaranîn guhêzhevî çê dibe. Yanî vediguhêzin hev.

**Mînak:** Welat ji xew şiyar nebûbû→ peyva “welat” ji dêvla mirovên nava welat hatiye bikaranîn.

Pol çûye gerê→ pol neçûye gerê, xwendekarên ku tê de ne çûne gerê.

Ez niha Ehmed Huseynî dixwînim→ qest, berhemên wî ne, ne ew e.

**B- Guhêzheviya Biwêjan:** Carinan di navbera bûnewer û têgehên de têkilî çê dibe û taybetiyên wan derbasî hev dibin. Guhêzheviya biwêjî, bi çar şiklan çê dibe.

- **Taybetiyên mirovan derbasî xwezayê dibin:** Bayekî dîn digobilî, baran digiriya (peyvên ‘dîn û girîn’ ji bo mirovan in lê ji bo xwezayê hatine bikaranîn.

- **Taybetiyên xwezayê derbasî mirovan dibin:** Qîzikeke pir asê ye , mirovekî hişk e. (peyvên ‘asê û hişk’ ji bo xwezayê tên bikaranîn lê ji bo mirovan hatine bikaranîn)

- **Taybetiyên xwezayê derbasî hev dibin:** Stêrk dibariyan bi ser me de. (peyva ‘barîn’ ji bo baran, berf û hwd. tê bikaranîn lê ji bo stêrkan hatiye bikaranîn.

- **Taybetiyên sehekî derbasî hev dibin:** Bi dengekî germ ban dikir, bi awirên tûj dinêrî (peyva ‘germ’ têkilî destdanê ye lê ji bo ‘deng’ hatiye bikaranîn.

## CUDANAÎ

Hinek nav hene ku em dixwazin wan bi awayekî din vebêjin ji ber vê yekê ew nav xurtir dibe. Ev nav wateya wî navî xurtir û berztir dike.

<b>Mînak:</b> Baran	→	Xêr û rehmet
Birûsk	→	Xalê gurgur
Heftreng	→	Bûka baranê

## XWEŞNAÎ

Hinek peyv hene ku vegotina wan bi me giran tê û hestên me diêşînin. Em wan peyvan naziktir û cudatir dibêjin. Ango em xweş-naviyekê lê bar dikin.

### **Mînak:**

Ew mir → Wî jiyana xwe ji dest da. Ew çû ser rehmeta xwedê. Ez ê herim tiwaletê. → Ez ê herim destmêja xwe bişikînim. Xaltîka Fatê welidî. → Xaltîka Fatê ji hev xelas bû.

## PEYVÊN OLANÎ

Hinek peyv hene ku ji olanan anga ew ji texlîta xwezayê der ketine. Ji ber vê yekê em ji wan re dibêjin peyvên olanî.

**Mînak:** Orîna conega heta vir dihat.  
Şir şira avê bû.

## KOMÊN PEYVAN

Çawa ku mirov di navbera xwe de koman çê dikin. Peyv jî dibin hevalên hev û komên xwe ava dikin. Dema ku em bi baldarî li peyvan binêrin em ê tê derxin ku çawa kombêjîyeke xurt di navbera peyvan de heye. Peyv li gorî kombêjîyên xwe:

- A- Dubestî
- B- Biwêj
- C- Gotinên Pêşîyan
- D- Gotinên Navdaran (Meşûran)
- E- Gotinên Qalibî

### **A- Dubestî**

Ji bo ku wate xurtir û bi hêztir bibe dubestî bi kar tên. Ji ber ku du peyv bi hev ve bestiyane (hatine girêdan) “dubestî” tê gotin.

Çend awayên wê hene:

#### **a. Bi dubarekirina peyvan çê dibin.**

**Mînak:** Hêdî hêdî bimeşe, hûrik hûrik tu yê hîn bibî.

**b. Ji du peyvên nêzwate çê dibin.**

**Mînak:** Heval û hogirên me sax bin.  
Cî û war ji me re nehiştine.

**c. Ji du peyvên dijwate çê dibin.**

**Mînak:** Baş xirab me îdare dikir.  
Kêm zêde em jî meselê dizanin.

**d. Ji du peyvên yek bi wate, yek bê wate çê dibin.**

**Mînak:** Pirtûk mirtûkan berhev bike.  
Çewto mewto nepeyive.

**e. Ji du peyvên bêwate çê dibin.**

**Mînak:** Îşê me bi çirto virtoyan neketiye.  
Ez helê belê fam nakim, divê tu werî.

## **B- Biwêj**

Ji bo ku vegotin xurtir û bi derbtir bibe biwêj der ketine. Biwêj dûrî wateya rastîn in û wateya mecazî di hundirîn. Biwêj bûne qalib û êdî mirov nikare wan biguherîne. Peyvek tenê jî bê guhertin biwêj xirab dibe. Biwêj ji bo vegotina rewşekê tên gotin. Bi piranî di wan de tu daraz tune ye. Dibe ku biwêjên herêman ji hev cuda bin lê heman wateyê bidin.

### **Hin Taybetiyên Biwêjan**

**a.** Biwêj ji bo rewşê tên gotin. Gotinên pêşiyar darazekê di hundirîn, divê neyên tevlihevkirin.

**Mînak:** Hevala te pincara kîjan erdê ye **(biwêj)**.

Golikê malê ji gayê malê natirse **(gotina pêşiyar)**.

**b.** Hinek biwêj ji peyvekê pêk tên; hinek jî ji gelek peyvan pêk tên.

**Mînak:** Dîsa rûyê xwe tirş kir **(rû tirş kirin)**.

Çi serhişk e law! **(serhişk)**

## **C- Gotinên Pêşiyar**

Gotinên pêşiyar ji fikr û ramanên hevpar, bawerî, helwest, tevger û ceribandînen gel ava bûne. Taybetiyên civakekê vedibêjin û xwedî daraz in. Yê ku gotine ne diyar in; ji ber vê yekê bûne aîdê gel. Gotinên pêşiyar qalib in û mirov wan tu carî nikare biguherîne.

### **Hin Taybetiyên Gotinên Pêşiyar**

**a.** Bi piranî bi wateya mecazî ne lê yê ku wateya rastîn di hundirîn jî hene

**Mînak:** Kevirê havînê bavê kadînê **(mecazî)**.

Diz li şevreşan digere **(rast)**

b. Hinek ji wan ji aliyê wateyê ve nêzî hev in.

**Mînak:** Ecelê bizinê tê nanê şivan dixwe.  
Ecelê kûçik tê bi camiyê dimîze.

c. Hinek gotinên pêşyan hene ku ji aliyê wateyê ve li dijî hev in

**Mînak:** Bav çî seg be, wê law jî ew seg be.  
Ji weliya der tê xwelî, ji xweliyê der tê welî.

d. Gelek ji wan xwedî qafîye û aheng in,

**Mînak:** Kurmê şîrî heta pîrî.  
Axa havînê bavê kadînê.

### **Gotinên Navdaran (Meşhûran)**

Ev cure gotin jî weke gotinên pêşyan darazekê vedibêjin lê xwediya van gotinan eşkera ne.

**Mînak:** “Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf  
Di dinyayê tu nabî ne meşhûr û ne me’rûf”

(Ehmedê Xanî)

“Feyza me weke Nîl e lê em Dicle û Ferad in.”

(Melayê Cizîrî)

### **Gotinên Qalibî**

Ji ber pir bikaranînê hin gotin di nava ziman de dibin weke qalib û êdî bi wî awayî tên vegotin.

**Mînak:**  
Tu dibêjî qey...  
Rokê erê rokê na...  
Hebû tune bû...

## PEYVSAZÎ/ QERTAFÊN KURMANCÎ

- **Kok**
  - Kokên Navdêran
  - Kokên Lêkeran
- **Qertaf**
  - Qertafên Diyarker
  - Qertafên Neyîniyê
  - Qertafên Raweyî
  - Qertafên Kesane
  - Qertafên Raveberê
  - Qertafên Nediariyê
  - Qertafên Baneşanî
  - Qertafa Daçekî
  - Cînavka Qertafî
  - Qertafa Nîşanî
- **Qertafên Çêker**
  - Ji navdêran navdêrçêker
  - Ji Navdêran Lêkerçêker
  - Ji Lêkeran Navdêrçêker
  - Ji lêkeran Lêkerçêker

## PEYVSAZÎ - QERTAF

### Kok

Hêmana bingehîn a xwerû ya peyvan kok e. Kok bê qertaf in û nayên parçekirin. Divê koka peyvê bi wate be. Kok di nava xwe de dibin du beş:

**1- Kokên Navdêrî:** Ev cure kok di eslê xwe de navdêr in; di kokên navdêrî de tevger tune ye.

**Mînak:** Bav, av, dest, saz

**2- Kokên Lêkerî:** Ev cure kok di eslê xwe de lêker in. Hemû kokên lêkerên xwerû dikevin vê cureyê .

**Mînak:** Xwar, kir, bû, ket, mir, bir

**Nîşe:** Hin kok hene ku hevdeng in. Hem weke kokên lêkeran tên bikaranîn û hem jî weke kokên navdêran.

**Mînak:** Min nan xwar  
Ev dar xwar e.

## QERTAF

Di Kurmancî de du cure qertaf hene: qertafên diyarker û yên çêker. Qertafên diyarker peyvên nû çê nakin, lê qertafên çêker peyvên nû çê dikin û wateyên nû diafirînin.

**Mînak: Dikenim** qertafên **di-** û **-im** qertafên diyarker in; ji aliyê dem û kesî ve peyv hatiye diyarkirin lê peyveke nû çê nebûye.

Hevaltî qertafa **-tî** qertafa çêker e û peyvek nû çê kiriye.

**A- QERTAFÊN DIYARKER:** Qertafên diyarker peyvên nû çê nakin; lê ji aliyê demê, zayend, mêjer, pirjimarî, kesan û hwd. ve rewşa peyvan diyar dikin. Dema ku tên pêşiya peyvan pêrkît in, dema tên dawiya peyvan parkît in.

**1. Qertafên Neyiniyê:** Ev qertaf hem ji bo lêkeran hem ji bo navdêran (ne, bê) tên bikaranîn; û wateya neyîniyê çê dikin: **ne-,ni-, na-, bê-**

**Mînak:** Min **nexwest**. Ez **nikarim**. Ew **nayê**. Yekî **bê** kes e.

**Hişyarî:** Ev qertaf weke qertafên çêker jî tên bikaranîn.

**Mînak:** Bêkêr, nezan, nexweş.

**2. Qertafên Raweyî:** Ev qertaf ji bo raweyên demî tên bikaranîn: **di-, bi-, -a, -e**

**Mînak:** Tu pir **dîfikirî** (dema niha).

Em dê **bîmeşin** (dema bê).

Te nexwesta nedibû (qertafa çîrokîyê).

Dîsa hatimee vir (qertafa dûdariyê).

**3. Qertafên Kesane:** Ev qertaf ji bo kesên yekjimar û pirjimar tèn dawiya lêker û navdêran û dema tèn dawiya navdêran peywira lêkera 'bûn'ê bi cî tînin: **-im, -me, -î, -e, -in, -ne**

**Mînak:** Baş im Mamoste me Tu dimeşî  
Ew çi dike? Hûn werin Em hatine

**4. Qertafên Diyarîyê:** Ev qertaf zayend û mêjera navdêran diyar dikin: **-î, -ê, -an**

**Mînak:** Yekî dibînim.  
Hevalê nexwest bê.  
Ez xwendekaran diparêzim.

**Hişyarî:** Qertafa **-an**'ê carinan weke qertafeke çêker jî tê bikaranîn.

**Mînak:** Xalanên me, xwezûanên wî, Ji nava Botanê me

**5. Qertafên Raveberê:** Ev qertaf di ravekan de tèn dawiya raveberê: **-a, -ê, -ên, -e, -î**

**Mînak:** Yaraa min tu çi bedew î.  
Bavê te nayê vir.  
Dostên qenc bi pîvana zêran in.  
Hevalekee min hat.  
Hevalekîn min li vir e.  
Hevalinee min wenda ne.

**6. Qertafên Nedyariyê:** Ev qertaf wateya nediyariya yekjimar û pirjimariyê didin navdêran: **-ek, -in**

**Mînak:** Me welatek hebû. Zarokîn hatin.

**7. Qertafên Baneşanî:** Ev qertaf tèn dawiya navdêr û lêkeran û baneşanan çê dikin:

**-o, -ê, -ino**

**Mînak:**

- Tèn dawiya navdêran:

Hevalo tu were!

Keçê tu çima nayê.

Xelkîno li min kin şîretê!

- Tê dawiya lêkeran:

Te xêr nediyo Xwedê nehiştê

Xwedê li wan xistîno



**8. Qertafa Daçekî:** Ev qertaf di eslê xwe de ji racivîna daçekên “ji” û “li” tê û êdî weke qertaf tê bikaranîn û tê dawiya navdêran: -î

**Mînak:** Dûrî\_min be (dûr ji min be).

Bêhtirî wî xebitî (bêhtir ji wî xebitî).

Têrî\_min kir (têr li min kir).

Fêrî\_min kir (fêr li min kir).

Tevî\_hev bûn (tev li hev bûn)

**9. Cînavka Qertafi:** Ev qertaf tê dawiya daçek û lêkeran û şûna cînavkên “wî-wê” di hin cihan de ji şûna “wan”ê digire: -ê

**Mînak:** Min pirtûk da wî/wê: Min pirtûk dayê

Ji erdê rahişt pênûsê: Ji erdê rahiştê

Têr li wî kir: Têr lê kir: Têrê kir

Tev li wî/wê bûn: Tevlêbûn

**10. Qertafa Nişanî:** Ev qertaf di eslê xwe de ji peyva nişanî “ha” yê tê; lê êdî weke qertafeke aktîf tê dawiya navdêran û nişanê xurtir dike: -a

**Mînak:** Ev peyvana (ev peyvên ha)

Ev hevalaya (ev hevala ha)

Vana (evên ha) wana (ewên ha)

viya (evê ha) wiya (ew ê ha)

vaya (eva ha) waya (ew ê ha)

## B- QERTAFÊN ÇÊKER

### 1. Ji Navdêran Navdêrçêker

#### - Bi Alîkariya Pêrkîtan:

**Mînak:** ne-xweş, bê-wîcdan, bi-xwîn, bi-kêr, li-rê, li-dar, li-kar, bi-xêr, bi-sêr, ne-tê

#### - Bi Alîkariya Parkîtan:

Di kurmancî de qertafên ku pir tînen bikaranîn ev in.

#### **Mînak:**

-a: zan-a, bez-a

-ahî/ayî/: Dirêj-ayî, Şîn-ahî

-ak: Ron-ak, xur-ak

-al: Hev-al, del-al

-an: Sor-an, bot-an

-anî: Dost-anî, mêr-anî

-ane: Heft-ane, sal-ane

-at: Civ-at, gul-at

-ar: Gem-ar, kêr-ar

-as: Mis-as, Fin-as, kir-as  
 -asa: Hût-asa, dew-asa  
 -asî: Kêm-asî, teng-asî  
 -atî/etî: Mirov-atî, Serok-atî, însan-etî  
 -bar: Guher-bar,  
 -baz: Sêr-baz, rê-baz  
 -bend: Heval-bend, saz-bend  
 -ber: Rê-ber, pêxem-ber  
 -çe: Bex-çe, Xalî-çe,  
 -dar: Ser-dar, dil-dar  
 -e: Zan-e, heft-e, sor-e, gewr-e  
 -el: Kom-el, gend-el  
 -ek: Destek, serek  
 -em: Sêy-em, deh-em  
 -en: Çîm-en, rewş-en  
 -end: Nav-end, gov-end  
 -ende: Gew-ende, perg-ende, şerm-ende  
 -er: Koç-er, nivîs-er,  
 -êr: Dil-êr, gel-êr  
 -geh: Havîn-geh, zanîn-geh  
 -gîn: Xem-gîn, lez-gîn  
 -ij: Kel-ij, germ-ij, bêhn-ij  
 -ing/eng: Sor-ing, pêş-ing  
 -il: Paş-il, pax-il  
 -inc: Gaz-inc, sar-inc, nar-inc  
 -is: Tep-is, rep-is  
 -ix: Pel-ix, germ-ix, dew-ix  
 -î: Kurmanc-î, germ-î,  
 -în: Dar-în, zêr-în  
 -ik: Dost-ik, hol-ik  
 -in: Kev-in, tev-in, xew-in  
 -istan: Mor-istan, gul-istan  
 -kî: Ser-ser-kî, êvar-kî,  
 -ka: Qestî-ka, dizî-ka  
 -mend: Huner-mend, dewlet-mend  
 -ok: Şemam-ok, ger-ok  
 -ol: Tît-ol, mend-ol, zît-ol  
 -ole: Reş-ole, şîn-ole  
 -onek: Tirs-onek, bizd-onek

-or: Hil-or, kul-or  
 -oq: Bel-oq, zerd-oq, mezel-oq  
 -ox: Kub-ox, çar-ox, cot-ox  
 -tî: Heval-tî, wekîl-tî  
 -tir: Baş-tir, çê-tir  
 -ûd: Şer-ûd, sir-ûd  
 -ûk: Çir-ûk, Piç-ûk  
 -ûr: Dest-ûr, renc-ûr,  
 -van/ban: Helbest-van, ga-van, mazû-ban  
 -wan: Kar-wan, ser-wan, qiz-wan  
 -waz: Şaş-waz, per-waz,  
 -(e)war/wer: Bend-e-war, bext-e-wer  
 -yar: Hiş-yar, zan-yar  
 -zar: Gul-zar, lale-zar

**Hişyarî:** Hêmanên mîna **-tirîn, -emîn, -ele, -dank, -olekî, -otankî, -okî, -oke**, ji du qertafan pêk hatine; ne qertafeke bi tenê ne.  
**Mînak:** Mezin-tir-în, çar-em-în, kom-el-e, kil-dan-k, şîn-ole-kî, reş-o-tan-kî, dîn-ok-e  
 - Hêmanên mîna “**kar, saz, gir, xane, name, bed**” divê weke qertaf neyên dîtin; lewre evana peyvên hevedanî çê dikin.  
**Mînak:** Alî-kar, kar-saz, masî-gir, pirtûk-xane, roj-name, bed-bext  
 - Hin qertafên mîna “**-yar, -bend, -van, -gîn (gwîn)**” di eslê xwe de peyv in; lê êdî weke qertaf tên bikaranîn.

- **Bi Alîkariya Pêrkîtan û bi Alîkariya Parkîtan:** Hin peyvên kurmancî hem pêrkît û hem jî parkît girtine.

**Mînak:**

**Ne-xweş-î, bê-kes-î, bi-kêr-î, ne-dît-î, ne-xwar-î, ne-çû-y-î**

## 2. Ji Navdêran Lêkerçêker

- **Bi Alîkariya Parkîtan:** Di kurmancî de kokên lêkeran ji ber ku weke navdêr jî tên bikaranîn weke navdêr dikarin bînin qebûlkirin; dema weke navdêr bînin qebûlkirin qertafên ku berî raderan tînin weke qertafên ji navdêran lêkerçêker dikare bê dîtin. Ev qertaf pênc heb in; lê “**î**” û “**and**” herî pir tînin bikaranîn. Jixwe qertafa **-iya** û **-a** ji î’yê qertafa t’yê jî ji **-and’ê** tê.

**Mînak:**

**-î** : Pirs-î, ken-î, meş-î

**-and** : Ken-and-, gindir-and-, qurif-and-, rev-and

**-iya** : Meş-**iya** ,rev-**iya**-, bez-**iya**, çêr-**iya**

**-t** : hejmar-**t**, qefal-**t**-, -**t**, guher-**t**,

**-a** : Pêç-**a**, kol-**a**, kêl-**a**,

- Bi taybetî di çêkirina peyvên nû de qertafa **-and'**ê gelekî bi kêr e.

**Mînak:** Derew **+and:** Derewandin

Reng **+and:** Rengandin

Firçe **+and:** Firçandin

Nav **+and:** Navandin

Av **+and:** Avandin

### 3. Ji Lêkeran Navdêrçêker :

- Bi alîkariya pêrkîtan:

**Mînak:** **ne**-mir

**ra**-kir (yê ku ra dike)

**bi**-kuj (kujer, yê ku dikuje)

**ne**-zan

**wer**-bêj

- Bi alîkariya parkîtan:

**Mînak:**

**-e:** Xwend-**e**, şand-**e** bijart-**e** xwir-**e**

**-bar:** Dît-**bar**, xwar-**bar**;

**-î:** Çûy-**î**, hat-**î**, keland-**î**

**-yar:** Kir-**yar**,

**-in:** Hat-**in** ket-**in** kenand-**in**, pirsî-**n** kenî-**n**

(radera **-in** navê lêkerê çê dike yanî dike navdêr)

4. Ji Lêkeran Lêkerçêker: Dema qertaf bên pêşiya lêkeran ji lêkeran lêker çê dibin.

-Bi alîkariya pêrkîtan :Bi piranî qertafên '-hil,-ra, -ve û -da' tên bikaranîn.

**Mînak:** **ra**-ket,

**hil**-kir,

**ve**-xwar,

**ve**-bû,

**da**-xist,

**ve**-kir,

**ra**-kir,

# NAVDÊR

- Cureyên Peyvan / Bêjeyan
- Peywira Peyvê
- Navdêr
  - Li Gorî Navlêkirina Heyberan Navdêr
    - Navdêrên Taybet
    - Navdêrên Cins
  - Li gorî hebûna xwe navdêr
    - Navdêrên Şênber
    - Navdêrên Razber
  - Li Gorî Mêjera Xwe Navdêr
    - Yekjimar
    - Pirjimar
    - Komenav
- Ergatîf-Aqûzatîf-Tewang
- Qertafên Diyariyê
- Di Hejmaran de Qertafên Qiyariyê
- Ravekên Navdêrî
  - Ravekên Resen
  - Ravekên Rêzikî
- Li gorî sazûna xwe navdêr
  - Navdêrên Xwerû
  - Navdêrên Pêkhatî
  - Navdêrên Hevedanî

## NAVDÊR

### Cureyên Peyvan/Bêjeyan

Bêje ji aliyê binyada xwe ve dibin du bir; yê n ku ji aliyê binyada xwe ve navdêr in; yê n ku ji aliyê binyada xwe ve lêker in. ( bûyînekê, tevgerêkê, karekî diyar dikin) Peyvek dema ku bi tena serê xwe be yan navdêr e yan jî lêker e. Hoker, cînavk, rengdêr, baneşan peywirên wan ên nava hevokê ne.

**Peyvên ku ji aliyê binyada xwe ve navdêr in evin:** Navdêr, cînavk, rengdêr, hoker, daçek, gihanek, baneşan:

**Mînak:** Mase, tu, xweş, pir, li, û

**Peyvên ku ji aliyê binyada xwe ve lêker in:** Ev jî tevger, bûyîn û karekî diyar dikin. (radera –(i)n navê wan çê dike):

**Mînak:** Xwar(in), bû(n), kir(in), bir(in)

### Peywira Peyvê

Peyv dema ku bi tena serê xwe be yan navdêr e yan jî lêker e. Rêngdêr, hoker, cînavk, gihanek, daçek peywirên peyvê yê n nava hevokê ne.

**Mînak:** “Xweş” ev peyv ji aliyê binyada xwe ve navdêr e; lê li gorî bikaranînê di nava hevokê de hin peywirên din jî digire.

Tu xweş dipeyîvî.

(Hoker e, ji ber ku rasterast tesîrê li lêkerê dike.)

Ev xwarina xweş kê çê kiriye?

( Ji ber ku çawaniya xwarinê diyar kiriye rengdêr e.)

Ev mal pir xweş e.

(Ji ber ku bi tena serê xwe hatiye bikaranîn navdêr e û bûye pêveber.)

## NAVDÊR

Nav ew tişt e ku li hemû tiştan tê kirin. Têgeh, term û hemû bûnewerên ku hene bi navan tên nimandin. Navdêr li gorî hin taybetiyên xwe jî tên dabeşkirin.

### 1. Li Gorî Navlêkirina Heyberan Dibin Du Beş:

**a- Navdêrên Taybet:** Ev cure navdêr li ser rûyê dinyayê yek bi tenê ne; bi tena serê xwe ne. Di nava hevokê de jî bi tîpa mezin dest pê dikin. Dema ku qertafên çêker bigirin, ew qertaf ji wan bi dabirê tên veqetandin.

Navên kesan, navên welat, nijad û dewletan, navên ol, ziman, mezheb, eşîret û tarîqatan, navên cihan, navên sazî, komele, dibistanan, navên rojname, kovaran, navên heywanan yê n taybet, navdêrên taybet in.

**b. Navdêrên Cins:** Navdêrên ku ji wan gelek hene navdêrên cins in. Dema ku em dibêjin “pisîk” hemû pisîk têne bîra me, ji ber vê yekê ev navdêrên cins in.

**Mînak:** Dar, çûk, mirov, çiya, dibistan

## 2- Li Gorî Hebûna Xwe Navdêr Dibin Du Beş

**a. Navdêrên Şenber:** Ev cure navdêran li ser rûyê erdê cihêkî dadigirin û bi lebatên sehkirinê (poz, guh, çav, ziman, çerm) mirov dikare wan his bike.

**Mînak:** Bêhn, çiya, deng, pirtûk,

**b. Navdêrên Razber:** Ev cure nav bi lebatên sehkirinê nayên hiskirin. Em tenê dikarin wan bifikirin. Em bi aqil û bi fikirinê digihên wan.

**Mînak:** Hezkirin, xeyal, kamranî, xemgînî, maf, raman

## 3- Li gorî Mêjera Xwe Navdêr Dibin Sê Bir:

**a. Navdêrên Yekjimar:** Ev navdêr li gorî hejmariya xwe yek tenê ne; ne pir in. Yekjimariya navdêran bi alîkariya qertafên diyariyê û qertafên raveberê çê dibin.

Qertafên diyariyê yên yekjimariyê –î û –ê’ ne. Di van qertafan de wateya zayendî jî heye.

**Mînak:** î→yekjimar û nêr: yekî li min nihêrî.

ê→yekjimar û mê: yekê li min nihêrî.

Bi qertafên raveberê wateya yekjimariyê çê dibe.

**Mînak:** ê→yekjimar û nêr: Bavê min ne li mal e.

a→yekjimar û mê: Diya min jî ne li mal e.

Qertafa nediyariyê -ek jî wateya yekjimariyê çê dike.

**Mînak:** -ek→yekjimar û nediyar→ zarok**ek**, dare**k**

**Nîşe:** Bi alîkariya peyva –yek’ê jî wateya yekjimariyê çê dibe. Du peyvên nediyar bi gihanekê bi hev ve bîna girêdan, qertafa nediyariyê tenê tê paşya peyva dawîn.

**Mînak:** Heval û dost**ek** (hevalek û dostek)

**b. Navdêrên Pirjimar:** Ew navdêr in ku ne yek in; Ji aliyê hejmariya xwe ve pir in. Di zimanê me de pirhejmarî bi van awayan çê dibe:

**Bi qertafa diyariyê -an’ê:**

**Mînak:** Ew dar**an** dibire.

Hevalan nan xwar.

Darên gwîzan.

**Bi qertafa raveberê - ên'ê:**

**Mînak:** Hevalên min,  
Xaniyên gundê me

**Bi qertafa nediyariyê -in'ê:**

**Mînak:** Min hevalin dîtin  
Hevaline min

Dema ku navdêr qertafên pirjimariyê ji ber ergatîfiyê nikaribe bigire bi alîkariya pêveberê pirjimarî çê dibe.

**Mînak:** Min pirtûk xwendin (pirjimar)  
Min pirtûk xwend (yekjimar)

Bi peyvên mîna gelek, pir, hin zahf, hemû, giş û bi hejmaran jî navdêr dikarin bibin pirjimar.

**Mînak:** **Gelek** mirov hatin  
**Çar** kes çûn

**c. Komenav:** Ev cure navdêr di xwe de pîrbûnê dihundirîne bêyî ku qertafên pirjimariyê bistîne. Dema ku em li peyvê dinêrin tu qertafên pirjimariyê pê ve tune ne lê dîsa jî pirjimarî û wateya kombûnê tê de heye.

**Mînak:** **Artêşa** wan têk çû.  
**Daristan** cihekî xweş e.

<b>Hişyarî:</b> Komenav, dema ku bibin kirde, pêveber yekjimar tê kişandin.
<b>Mînak:</b> Artêş ketiye başûr (rast). Artêş ketine başû (çewt, eger artêşek tenê be). Pez diçêre (rast). Pez diçêrin (çewt).

## ERGATÎF-AQÛZATÎF-TEWANG

**Ergatîf:** Kurmancî zimanekî ergatîf e. Li dinyê nêzî dused zimanên ergatîf hene û ergatîfiya wan hemûyan jî ne mîna hev in. Pîraniya zimanên Qafkasan (Çeçenî, Abazayî, Gurcîkî...) ergatîf in, her wiha zimanê Basqî, Hîndî, Japonî jî ergatîf in. Ergatîfiya hemû zimanan ne mîna hev e; di kurmancî de ergatîfî ew e ku pêveber li gorî bireserê bîn kişandin e. Dema bireser bi alîkariya pêveberê diyar dibe kirde jî dikeve forma diyarkirî ango aqûzatîf. Di Kurmancî de hew di dema bori de ku lêker gerguhêz bin, pêveber li gorî bireserê qertafan distînin.

**Mînak:** Min                      pirtûk                      xwend  
**kirde**                      **bireser**                      **pêveber**

(pirtûk yekjimar e, pêveber li gorî bireserê hatiye kişandin).



<u>Min</u>	<u>pirtûk</u>	<u>xwendin</u>
<b>kirde</b>	<b>bireser</b>	<b>pêveber</b>

(pirtûk pirjimar e, pêveber li gorî bireserê hatiye kişandin).

<u>Te</u>	<u>ez</u>	<u>dîtim</u>
<b>kirde</b>	<b>bireser</b>	<b>pêveber</b>

(pêveber li gorî bireserê, “ez”ê hatiye kişandin).

**Aqûzatîf:** Peyv bi taybetî jî navdêr dema ku bireser bin dema qertafên diyarkirinê distînin dibin aqûzatîf. Yanî formên diyarkirî yên navdêran, formên wan ên aqûzatîf in. Di kurmancî de di dema niha û di dema bê de bireser bi qertafên diyariyê diyar dibin. Formên diyarkirî û aqûzatîf ên cînavkan jî an bi riya tewangê tê diyarkirin an jî bi qertafan.

**Mînak:** Ez tenûrê dibînim  
 (Tenûr bi qertafa diyariyê –ê’yê hatiye diyarkirin.).  
 Ez wî hevalî nas dikim  
 (Heval bi qertafa diyariyê –î’yê hatiye diyarkirin.).  
 Ew pirtûkan dixwîne  
 (Pirtûk bi qertafa diyariyê –an’ê hatiye diyarkirin.).

- Dema bireser cinavkên kesane bin, formên wan ên oblîk/diyarkirî tên bikaranîn.

**Forma Xwerû    Forma Diyarkirî/oblîk/aqûzatîf**

Ez	min
Tu	Te
Ew	wî/wê (bi qertafên diyariyê –î, –ê diyar bûye)
Em	me
Hûn	we
Ew	Wan (bi qertafa diyariyê diyar bûye)

**Mînak:** Mamoste min/ te/me/we dibîne.

Qertafa diyariyê ya yekjimar û nêr –î jî ,di hin forman de, êdî pir nayê bikaranîn. Navdêrên nêr û yekjimar dema diyar nebin jî tevlihevî der nakeve. Ji ber ku navdêrên mê hemû qertafa diyariyê –ê’yê herdem distînin.

**Mînak:** Ez dew vedixwim.

Ew nan dixwe.

Dew û nan nêr in û qertafa diyariyê –î nestendine û ji aliyê wateyê ve tu kêmanî û tevlihevî jî çê nabe.

Ew pirtûkê dixwîne.

Ew maseyê dişo.

Pirtûk û mase mê ne û qertafa diyariyê –ê'yê distînin. Peyvên mê dema ku biwxazin bên diyarkirin her tim qertafa –ê distînin; loma jî navên nêr dema ku qertafa diyariyê –î nestînin jî tevlihevî der nakeve.

**Tewang:** Li gorî rê û rêbazên çêkirin û diyarkirana peyvan, eger guhertin di kokên peyvan de çê bibe ew tewang e. Yanî tewang teknîka çêkirin an jî diyarkirina ji hundurê peyvê ve ye; loma jî eger çêkirin û diyarkirina peyvan bi qertafan çê bûbe û tu guhertin di koka peyvê de çê nebûbe em nikarin qala tewangê bikin.

Di Kurmancî de çêkirina peyvan bi riya tewangê qet çê nabe; çêkirina peyvan bi pêrkîrî û parkîtan çê dibe lê di diyarkirina hin peyvên nêr, formên diyarkirî/aqûzatîf ên hinek cînavkan û kişandina lêkerên bêrist de di kokên peyvan de guhertin çê dibe.

**Tewanga navdêran:** Dema peyvên mîna “bajar, nan, mast” ku tîpa “a”yê di kîteya wan de heye tên diyarkirin divê bi qertafa diyariyê ya nêr “-î”yê bê diyarkirin lê li hin herêman guherîn ji hundurê peyvê ve çê dibe û li şûna forma diyarkirî ev form tên bikaranîn:

**Mînak:** Bajâr dibe bajêr            nan dibe nên  
Hawiz dibe hêwiz            mast dibe mêt

Qertafên “-î, -ê, -an” ne qertafên tewangê ne û tu guherînê di koka peyvê de çê nakin. Jixwe di navdêrên nêr de qertafa –î bihata bikaranîn ev guhertina mînakên jor jî çê nedibû. Ji ber vê yekê ye ku ji bo ku li herêmên Botan û Behdînan qertafa diyarkirina navdêrên nêr “-î” tê bikaranîn formên mîna “bajêr, nên, mêt” peyda nebûne.

Dema em dibêjin “Ez hevalan dibînim/Ez hevalê dibînim” qertafên diyarkirinê “-ê” û “-an” tu guherînê di koka peyvê de çê nakin.

Di Îngilîzî de jî tewangbarî bi awayekî xurt ji holê rabûye; tewang di formên aqûzatîf ên cînavkan, lêkerên bêrist (irregular verb) û formên pirjimar ên hin navdêran de şopa tewangê maye.

Mînak: Di Îngilîzî de pirjimarî bi qertafan (-s,es,ies) çê dibe, lê hin peyv ji hundirê xwe ve diguherin û ev jî weke tewang tê nirxandin.

**Mînak:** Car dibe cars            (pirjimarî bi qertafan çê bûye)  
Book dibe books            (pirjimarî bi qertafan çê bûye)  
Man dibe men            (pirjimarî bi tewangê çê bûye)  
Child dibe children            (pirjimarî bi tewangê çê bûye)

**Tewanga lêkeran:** Lêkerên xwerû ji koka xwe ve ditewin. Ev lêker hew çend heb in.

**Mînak:** Koka lêkera xwarin'ê di dema niha de dibe –**xw-** (dixwim)

Koka lêkera **çûn'ê** di dema niha de dibe **-ç-** (diçim)

Di lêkerên birist de (hema hema hemû lêkerên kurmancî birist in) guherîn di kokên lêkeran de çê nabe; loma jî ne tewiyane. Di mînakên jêr de jî xuya ye ku tu guhertin di koka lêkeran de çê nebûye.

**Mînak:** Koka lêkera **ken**în'ê di dema niha de dibe **-ken-** (dikenim)

Koka lêkera **meş**în'ê di dema niha de dibe **-meş-** (dimeşim)

## QERTAFÊN DIYARIYÊ

Kurmancî zimanekî ergatîf û aqûzatîf e. Ji ber ergatîfiyê di demên borî de kirde; ji ber akûzatîfiyê jî di demên niha û bê de bireser tê diyarkirin. Ev diyarkirin ji xeynî çend cînavkên ku ji koka xwe ve ditewin, bi alîkariya qertafên diyariyê çê dibe. Ev qertaf zayend û mêjera peyvan diyar dikin. Qertafên diyariyê û peywirên wan ev in:

<b>î</b>	→	nêr û yekjimar
<b>ê</b>	→	mê û yekjimar
<b>an</b>	→	pirjimar

Çend fonksiyonên qertafên diyariyê hene :

**1-** Di dema niha û bê de bireser qertafên diyariyê distîne.

<b>Mînak:</b> Ez pirtûkê dixwînim.	Ez ê pirtûkê bixwînim.
Ez pirtûkan dixwînim.	Ez ê pirtûkan bixwînim
Ez yekî dibînim.	Ez ê yekî bibînim.

**Nîşe:** Eger bireser ji van cînavkan yek be: **ez, tu, em, hûn**; formên wan yên oblîk/diyarkirî (min, te, me, we) tên bikaranîn. Cînavkên **wî, wê, wan** jixwe qertafên diyariyê girtine.

**Mînak:** Heval **min** dibînin (min forma diyarkirî ya ez'ê ye)  
Mamoste **wê** dibîne (wê qertafên diyariyê girtiye, ew+ê)

**2-** Di dema borî de lêker gerguhêz be kirde qertafên diyariyê distîne.

**Mînak:** Yekî giliyê me kiriye.

Eyşeyê nan xwar.

Hevalan stran gotin.

**3-** Di ravekan de tên dawiya ravekerê û ji aliyê mêjer û zayendê ve wan diyar dikin.

<b>Mînak:</b> Pirtûkên hevalê	Deriyê bexçe(yî)
Pirtûkên heval(î)	Rûpela pirtûkê
Pirtûka hevalan	Rûpelên pirtûkan

4- Dema ku daçekên mîna li, ji, bi, ser, ber, cem û hwd. berî navdêran bên ew navdêr qertafên diyariyê digirin. Dem û gerguhêziya lêkerê çî be jî eger daçek berî navdêrê hatibe navdêrê diyar dike.

**Mînak:** Min **ji** malê nan anî.

**Li** gundan digirim.

Were **cem** tenurê.

Ez **ji te** xeyidîme.

5- Lêkerên mîna hilkişîn, çûn, danîn, rapelikîn, kirin, xistin ku wateya berbiçûnê di wan de heye, dema berî navdêran bên divê navdêr qertafên diyariyê bistînin.

**Mînak:** Ez **çûm** gundan.

Ew **hilkişiya** çiyê.

Min ji destê xwe **xist** erdê.

Min pirtûk **da** wî.

### **Di derbarê qertafên diyariyê de çend xalên girîng**

a. Daçek dema ku lêkerên biwêjî çê bikin peyva piştî wan qertafên diyariyê nagire.

**Mînak:** Bi ser ket, bi dest xist

b. Dema ku piştî daçekê peyv bi gihanekan û bi bêhnokê bi hev ve hatibin girêdan, peyva dawîn tenê qertafa diyariyê distîne.

**Mînak:** Ez li Amed, Şirnex û Mêrdînê geriyam.

c. Di ravekên zincîrî de tenê ravekera dawîn qertafa diyariyê distîne.

**Mînak:** Pismamê xaltîka apê diya Rojbînê

Serokê Enstîtûya Amedê

### **Di Hejmaran de Qertafên Diyariyê**

Hejmara “yek”ê mê ye, ji duduyan heta nozdehan hejmar, pir-jimar in, ji xeynî hejmara “deh”ê hejmarên ku bi sifirê bi dawî dibin nêr in. Hejmar, mêjer û zayenda xwe jî didin peyva piştî xwe.

**Mînak:** Ji **yekê** dest pê kir.

Ji **duduyan** dest pê kir.

Ji **nozdehan** dest pê kir.

Ji **dehan** dest pê kir.

Ji **bîstî** dest pê kir.

Ji **sedî** dest pê kir.

Ji **hezarî** dest pê kir.

### Di derbarê diyarkirina hejmaran de çend xalên girîng

a. Dema ku weke cînavk be jî bi heman pîvanê çê dibin. Lê hejmara yek ji ber ku yekjimar e dikare bibe nêr jî û mê jî.

**Mînak:** Dehan nan xwar.  
Sedî nan xwar.  
Yekî nan xwar.  
Yekê nan xwar.

b. Hejmar ravekên rengdêrî çê kin mêjer û zayenda xwe didin peyva piştî xwe.

**Mînak:** Bist kesî nan xwar.  
Heşt kesan nan xwar.  
Hezar kesî nan xwar.

c. Eger berî hejmaran daçek hatibin û hejmar bûbe hokera mêjeriyê qertafa **-an'ê** digire.

**Mînak:** Mirov bi hezaran hatin.  
Xort bi sedan çûn.

d. Berî raveka rengdêrî a hejmarî daçek hatibe, hejmar qertafa pirjimariyê distîne û peyva piştî hejmarê eger qertafên di-yariyê bigire dîsa li gorî hejmarê digire.

**Mînak:** Bi hezaran mirov hatin.  
Bi hezaran mirovî nan xwar.

e. Di ravekê de hemû hejmar dikarin qertafa raveberê ya pirjimariyê **-ên'ê** bistînin.

**Mînak:** Bîstên min  
Duduyên te  
Sedên me

### RAVEKÊN NAVDÊRÎ

Ravek ew tişt e ku du an pirtir peyv tên ba hev û ji hinek aliyên ve hev temam dikin. Peyvek, peyva din rave dike bi vî awayî wê temam dike. Loma jî yek raveber e yek jî raveker e. Di Kurmancî de du cure ravekên navdêrî hene: Ravekên asayî, ravekên zincîrî.

<b>Mînak</b>	<b><u>Raveber</u></b>	<b><u>Raveker</u></b>
	Ser <u>ê</u>	pênûs <u>ê</u>
	Nan <u>ê</u>	tenûr <u>ê</u>
	Gul <u>ên</u>	bexçey <u>an</u>

Ya muhîm raveber e, raveker tê û wê temam dike.

**Ravekên Resen:** Ji du hêmanan pêk tên, yek ji wan raveber û yek jî raveker e. Raveber qertafên raveberê digire; raveker jî qertafên diyariyê digire.

**Qertafên raveberê**

-a  
-ê  
-ên

**Qertafên ravekerê**

-ê  
-î  
-an

**Mînak:** Dara tuyê ,  
Serê yekî  
Darên gûzan

**Ravekên Rêzikî:** Du an pirtir ravekên navdêran dikevin nava hev û raveka rêzikî çê dibe. Divê du ravek têkevin nava hev.

**Mînak:** Rûpela pirtûkê+pirtûka dîrokê  
Rûpela pirtûka dîrokê (du ravek di vir de hene)  
Kulîlka Çiya+Çiyayê Zagrosê  
Kulîlka Çiyayê Zagrosê

**Hişyarî:** Dema ku raveber an raveker hevpar bên bikaranîn divê bi ravekên rêzikî re neyên tevlihevkirin, ji ber ku ne rêzikî ne.

**Mînak:** Lênûsk û pênúsa min ( Min→ravekera hevpar)  
Pênûsên min û te (Pênûs→ravebera hevpar)

**LI GORÎ SAZBÛNA XWE NAVDÊR**

Navdêr li gorî avaniya xwe dibin sê bir:

**1- Navdêrên Xwerû:** Ev navdêr qertafên çêker nagirin; tenê dikarin qertafên diyarker bigirin.

**Mînak:** Av, çiya, mase, çûk

**2- Navdêrên Pêkhatî:** Ev navdêr qertafên çêker digirin û peyvên nû çê dibin. Divê di navbera peyva nû û ya berê de her tim têkiliyeke wateyî hebe.

**Mînak:** Mirov-atî, hel-best-van, bê-sûc, nav-çe, xap-î-n-ok, kom-ar, kurd-î, ne-zan-î

**3- Navdêrên Hevedanî / Yekbûyî:** Ev navdêr ji du an jî ji pirtir hêmanan pêk tên.

**Mînak:** Çavkanî, gotegot, pozbilind, diltenik, pirtûkxane

**A- Ji aliyê wateyê ve peyvên hevedanî**

a. Dibe ku carinan peyva pêş wateya xwe winda kiribe û peyveke nû çê bûbe.

**Mînak:** Zirbav, marmasî

b. Dibe ku carinan peyva paş wateya xwe winda kiribe û peyveke nû çê bûbe.

**Mînak:** Bareş, bakur,

c. Dibe ku her du peyvan jî wateya xwe winda kiribin û peyveke nû çê bûbe

**Mînak:** Bermalî, berpirs, kerguh, derpê

d. Dibe ku her du peyvan jî wateya xwe parastibe û peyveke nû çê bûbe.

**Mînak:** Pirtûkxane, cilfiroş, serêş,

**B- Ji aliyê teşeyê ve peyvên hevedanî**

a. Navdêr+navdêr

**Mînak:** mêrxas, giranbuha, pirtûkxane

b. Navdêr+Lêker

**Mînak:** Rastgo, kedxwar, dengdan, Xweda, xweza

c. Navdêr+daçek+navdêr

**Mînak:** Devbixwîn, dilbikul, çavlırê

d. Lêker+dengdêrek alîkar/gihanek+lêker

**Mînak:** Gotegot, danûstendin, hatûço, çûnûhatin

e. Lêker / Lêkernav+navdêr

**Mînak:** Dançêker,

## RÊNGDÊR

- Rengdêrên Çawaniyê
  - Rengdêrên Namdariyê
- Rengdêrên Diyarker
  - Rengdêrên Nîşanî
  - Rengdêrên Jimarîn
    - Rengdêrên Jimarîn ên Resen
    - Rengdêrên Jimarîn ên Rêzîn
    - Rengdêrên jimarîn ên Dabeşiyê
    - Rengdêrên Jimarîn ên Kesrî
  - Rengdêrên Nediariyê
  - Rengdêrên Pirsariyê
- Ravekên Rengdêran
- Payeya Rengdêran
- Biçûkirina Rengdêran
- Perçînkirina Rengdêran
- Sazbûna Rengdêran
  - Rengdêrên Xwerû
  - Rengdêrên Pêkhatî
    - Bi Pêrkîtan
    - Bi Parkîtan
  - Rengdêrên Hevedanî



# RENGDÊR

Ew peyv in ku tên ber navan û wan li gorî: reng, rewş, teşe, çawanî, cih, hejmar û rêzê dinimînin. Di Kurmancî de rengdêrên çawaniyê her tim li paş in; yên hejmarî jî hinek ji wan li paş û hinek ji wan jî li pêş in.

**Mînak:** Deriyê sor, xaniyê paqij, maseya gilover, deriyê rind, çar zilam, keçika pêncemîn

Rengdêr li gorî wate û peywira xwe dibin du beş:

## A- RENGDÊRÊN ÇAWANIYÊ:

Ev cure rengdêr reng, rewş û teşe û jêçêbûna navdêran diyar dikin.

**Rewş:** Jinika pîr, pola qirêj, keçika xweşik...

**Reng:** Pênûsa sor, mirîşka reş, pêlava gewr...

**Teşe:** Deriyê xwar, topa çargoşe, pênûsa stûr...

**Jêçêbûn:** Deriyê darîn, xencera zêrîn, şala hirî...

## Rengdêrên Namdariyê

Ev cure rengdêr jî paye, rade, peywir û asta civakî ya navên taybet nîşan didin. Carinan tên pêşiya navan, carinan jî tên dawiya navan. Rengdêrên namdariyê jî bi tîpên mezin tên nivîsîn.

**Mînak:** Kek Ehmed, Xalê Reşo, Xaltika Îsra, Nûriyê Nekar, Evîn Xanim, Xwişka Neslîxan

**Nîşe 1:** Peyvên mîna “xaltî, xal, ap” dema ku weke rengdêrên namdariyê jî û mîna navdêrê jî bin bi heman awayî çê dibin. Dîsa di hin bikaranînen din jî de ev tevlihevî çê dibe.

**Mînak:** Xaltîka Eyşeyê (raveka rengdêrî, xaltîk Eyşe bixwe ye)

Xaltîka Eyşeyê (raveka navdêrî, xaltîk ya Eyşe'yê ye)

Kûçikê Beşîr (raveka rengdêrî, kûçik Beşîr bixwe ye)

Kûçikê Beşîr (raveka navdêrî, kûçik ê Beşîr e)

**Nîşe 2:** Carinan rengdêr tê pêşiya peyvê jî.

**Mînak:** Ew xweş mirov e.

## B- RENGDÊRÊN DIYARKER:

Ev cure rengdêr jî navan di hin waran de dinimînin. Li gorî peywira xwe dibin çar bir:

**1- RENGDÊRÊN NÎŞANÊ:** Navdêran bi riya nîşanê diyar dikin. Rengdêrên nîşanê ev in: ew, vî, vê, wî, wê, van, wan. Rengdêrên nîşanê dema ku bên diyarkirin (**vî, vê, wî, wê, van, wan**) navdêrên ku piştî wan jî tên diyarkirin.

**Mînak:** Vê keçikê xwend.  
Vî kevirî ji vir rake.  
Wî xortî dibînim.  
Wê hevalê çi xwest?  
Van daran nabirin.  
Wan xwendekaran kêfa min anîn.  
Ev dinya bi min pir xweş e.  
Ew mamoste nema hat.

**Hişyarî:** Divê cînavkên nîşanî û rengdêrên nîşanî neyên tevlihevkirin. Cînavkên nîşanî rasterast cihê navan digirin; lê rengdêrên nîşanî tên pêşiya navdêran û wan dinimînin.

**Mînak:** Ew heval çi dike?  
 (peyva “ew” peyva “heval” nîşan dide û rengdêr e)  
 Ew çi dike?  
 (peyva “ew” cihê “heval” girtiye û cînavk e)

**2- RENG DÊRÊN JIMARÎN:** Ev cure rengdêr heyberan li gorî mêjerê diyar dikin. Di nava xwe de dibin çar beş:

**a. Rengdêrên Jimarîn Yên Resen :** Ev cure rengdêr hejmarê heyberan bi hejmarên resen vedibêjin.

**Mînak:** Deh dar, pênc şervan, bîst milyon

**b. Rengdêrên Jimarîn Yên Rêzîn:** Ev cure rengdêr jî rêza heyberan diyar dikin. Bi qertafên –an, -em, -em, -în çê dibin. Wekî din “xal” jî peywira van qertafan çê dike.

**Mînak:** Mala çaran, mala çaremîn  
 Dersa sêyem, dersa şêşemîn  
 Pirsra 7.

**c. Rengdêrên Jimarîn Yên Dabeşiyê:** Ev rengdêr mêjera parvekirinê diyar dikin. Bi piranî bi dubarekîna hejmaran çê dibe; bi daçeka “bi”yê û bi gihaneka “û”yê jî çê dibe.

**Mînak:** Rêzên çar çar. Guliyên şêş bi şêş. Darên heft û heft

**Nîşe:** Ev hejmarên ku hatine dubarekirin dema ku arasteyî lêkeran bibin dibin hoker.

**Mînak:** Daran çar çar av bidin  
 Pirtûkan yek bi yek bixwînin

**d. Rengdêrên Jimarîn Yên Kesrî:** Ev cure rengdêr jî hejmarên kesrî diyar dikin.

**Mînak:** Nîv nan kirî. Min ribik hîse kirî

**3- RENG DÊRÊN NEDIYAR:** Ev rengdêr wateya nediyariyê didin navdêran. Hin rengdêrên nediyar ev in: hin, hinek, gelek, filan, her, hemû, çend, yek, din, çi, tu, her, ev qas, pir, zehf...

**Mînak:** Gelek kes hatin serdana me.  
Hin mirov gêj bûne.  
Hemû xwendekar dersê dibînin.  
Tu kes nikare bi me.

**Hişyarî:** Divê rengdêrên nediyar û cînavkên nediyar neyên tevlihevkin.

**Mînak:** Hemû kes hatin ( peyva “hemû” berî navdêrê hatiye û rengdêr e.)

Hemû hatin ( peyva “hemû”, şûna kesan girtiye û cînavk e.)

**4- RENG DÊRÊN PIRSIYARIYÊ:** Ev rengdêr bi rêya pirsê navdêran dinimînin. Bersiva ku bê dayîn jî divê dîsa rengdêr be. Hin rengdêrên pirsiyariyê ev in: kîjan, çend, çi, çawa, çi qas, çilo...

**Mînak:** Te çend nan xwar?  
Kîjan çiya bilind e?  
Karê çawa rind e?  
Çi qas pirtûk lazim in?

**Hişyarî:** Divê rengdêrên pirsiyariyê û cînavkên pirsiyariyê neyên tevlihevkin.

**Mînak:** Te çend nan xwar?  
(peyva “çend” berî nan hatiye û rengdêr e.)

Te çend xwar?

(peyva ‘çend’ şûna navdêrekî girtiye û cînavk e.)

### RAVEKÊN RENG DÊRAN

Rengdêr jixwe di nava ravekê de ne. Di nava ravekê de rewşa raveberê diyar dikin.

**Mînak:** Sêva **sor**, deriyê **mezin**, **çar** sêv.  
Dibe ku du an jî pirtir rengdêr navekî binimînin.

**Mînak:** Mirovê **jîr** û **xebatkar**

Hinek rengdêr hene ku hêdî hêdî, ravebera xwe winda dikin û êdî di şûna navekî de tên bikaranîn.

**Mînak:** Mirovên pîr bi rê de dimeşin → **Pîr** bi rê de dimeşin  
Keçika xweşik di ber me re derbas bû.

**Xweşik**, di ber me re derbas bû.

## PAYEYA RENG DÊRAN

Radeya taybetmendî û payeya navdêran bi alîkariya rengdêran çê dibe. Ev, hem bi qertafan hem jî bi hin peyvên çê dibe.

### a. Bi qertafan

**-tir:** Ev qertaf dema ku bê dawîya rengdêran wateya “bêtir” dide wan.

**Mînak:** Zarokên xweşiktir, kuçeya paqijtir

**-tirîn:** Ev qertaf dema ku bê dawîya rengdêran wateya “herî bêtir” dide.

**Mînak:** Zarokê xweşiktirîn, kuçeya paqijtirîn

### b. Bi peyvên

**Bi qasî (wek, wekî):** Ev peyv jî wateya wekhevîyê dide rengdêrê.

**Mînak:** Marê weke şerîtê mezin, zarokên bi qasî axê pir

**Gelek, pir, zehf, zor...:** Ev peyv jî dema ku tîna beriya rengdêran wateya wan ji hêla zêdebûnê ve xurtir dikin.

**Mînak:** Zarokên baş→zarokên pir baş

Welatê xweş→welatê zehf xweş

**Herî:** Ev peyv jî dema ku tîna beriya rengdêran asta rûberiyê bilindtir dike.

**Mînak:** Zarokê baş→zarokê herî baş

### Biçûkirina Rengdêran

**-e, -ik:** Ev qertaf dema ku weke parkîr tîna dawîya navên rengan û navdêrekî dinimînin, wateya nêzîkbûna rengan dide.

**Mînak:** Keçika zere, xwendevanê sore, miya şîne

Keçika zerik, xwendekarê sorik, miya şînik

Bi peyvên mîna “piç, hin, heb, parî...” jî biçûkirin çê dibe, dema qertafa –ik’ê jî bigirin bêtir biçûk dibin.

**Mînak:** Piçek nan piçikek nan,

Hebek tirî, hebikek tirî

Hinek av hinikek av

### Perçînkirina Rengdêran

Perçînkirin ew tişt e ku mirov wateya peyvê an jî peyvên xurtir dike. Bi qertafên mîna -ip, -ipî, -im’ê perçînkirin çê dibe. Tîpa serê peyvê tîna berî van qertafan û dîsa bi peyvê re tîna bikaranîn. Bêtir bi qertafa –ipî tîna çêkirin.

<b>Mînak:</b> <u>tîpa serî qertafa</u>	<b>peyv</b>	<b>peyva</b>	<b>perçînkirî</b>
S	-ipî	sar	sipîsar
T	-ipî	tarî	tipîtarî
R	-ipî	rast	ripîrast
G	-ip	germ	gipgerm
S	-im	spî	simspî

**Nîşe:** Di Kurmancî de perçînkirin bi peyvên dubestî jî çê dibe:  
**Mînak:** Zarokê **şilûfazî**, zilamê **şilopilo**, welatê **tarûmar**.

### SAZBÛNA RENGDÊRAN

Rengdêr jî li gorî sazûna xwe dibin sê bir: Rengdêrên xwerû, pêkhatî û hevedanî.

**a. Rengdêrên Xwerû:** Ev rengdêr parçe nabin. Jixwe ew kok in. Qertafên çêker negirtine.

**Mînak:** Psîka **reş**, dara **mezin**, keçika **xweş**, mêrikê **kor**...

**b. Rengdêrên Pêkhatî:** Ev rengdêr ji navdêrên pêkhatî çê dibin. Navdêr dema ku qertafên çêker bigirin dibin pêkhatî û dema ku weke rengdêr jî bînin bikaranînin, rengdêrên pêkhatî çê dibin. Ev rengdêr bi alikariya pêrkîtan û parkîtan pêk tên.

**Mînak:**

**Bi Alîkariya Pêrkîtan:**

Keçika bênesîb zarokên bihêvî,  
qedera bêbext xwendekarên nezan

**Bi Alîkariya Parkîtan**

Mirovê nêçîrvan, însanên guhdar, deriyê darîn, kuçikên xewar  
Navdêrên pêkhatî ku bi parkîta -î'yê ji lêkeran çê bûne jî weke rengdêr tên bikaranînin.

**Mînak:** nanê şewitî, ava kelandî, hevalê çuyî, zilamê geryayî

**c. Rengdêrên Hevedanî:** Ev rengdêr herî kêr jî du peyvên pêktên. Carinan jî daçek dikeve navbera wan.

**Mînak:** Lawikê çavsor, mirovê pozmezin,

Dewletên kedxur, hevalên çiroknivîs, însanên rastgo,  
Evîndarên dilbikul, gurê devbixwîn

## CÎNAVK

- **Cînavkên Bêjeyî**
  - Cînavkên Kesane
  - Cînavkên Xwerû
  - Cînavkên Diyarbûyî
    - Cînavkên Nîşanê
    - Cînavkên Nedyariyê
    - Cînavkên Pirsyariyê
    - Cînavka “Xwe”yê
    - Cînavka “Hev”ê
- **Cînavkên Qertafî**
  - Cînavkên Pêwendiyê
  - Cînavka Qertafî “ê”
  - Cînavka Paşlêkerî
  - Cînavka Paşdaçekî

# CÎNAVK

Peyvên ku cihên navdêran digirin cînavk in. Lewre ji navê wê jî diyar e: Cî-nav-k.

<u>Mehmûd</u> nan xwar.	→	<u>wî</u> nan xwar.
<u>Diyarîyê</u> nan xwar.	→	<u>wê</u> nan xwar.
<u>Pirtûk</u> xweş e.	→	<u>ew</u> xweş e.
<u>Daran</u> nebirin.	→	<u>wan</u> nebirin.

Cînavk di nava xwe de dibin du beş: Cînavkên bêjeyî, cînavkên qertafî

## A- CÎNAVKÊN BÊJEYÎ:

**1- CÎNAVKÊN KESANE:** Cînavk, cihê navên kesan digirin.

Dema ku tên diyarkirin çar ji wan xwedî formên taybet in (oblîk form/aqûzatîf form) û diyarbûna wan ne bi qertafên diyariyê çê dibin. Sê ji wan jî qertafên diyariyê digirin.

### Xwerû-Yekjimar

- 1.Ez
- 2.Tu
- 3.Ew

### Diyarbûyî (oblîk form)

- min  
te  
Wê/wî

### Xwerû-pirjimar

- 1.Em
- 2.Hûn
- 3.Ew

- me  
we  
wan

**Mînak:** Evîn çûye malê→ ew çûye malê

Rojbînê xweş dixwend→ wê xweş dixwend

Mamoste zarokan dihejmêre.→ Ew wan dihejmêre

Weke ku ji mînakên li jorê diyar e, cînavkên kesane cihên navên mirovan û giyaneweran digirin.

- Lêkera 'bûn'ê li gorî cînavkan di dema niha de dikeve van forman.

	<u>Piştî dengdarê</u>	<u>piştî dengdêrê</u>
Yekjimar Ez	<b>-im,</b> ez baş <b>im</b>	<b>me</b> ez mamoste <b>me</b>
Yekjimar Tu	<b>-î,</b> tu baş <b>î</b>	<b>yî</b> tu mamoste <b>yî</b>
Yekjimar Ew	<b>-e,</b> ew baş <b>e</b>	<b>ye</b> ew mamoste <b>ye</b>
Pirjimar Em	<b>-in,</b> em baş <b>in</b>	<b>ne</b> em mamoste <b>ne</b>

Pirjimar Hûn	<b>-in,</b> hûn baş <b>in</b>	<b>ne</b> hûn mamoste <b>ne</b>
Pirjimar Ew	<b>-in,</b> ew baş <b>in</b>	<b>ne</b> ew mamoste <b>ne</b>

Ev qertaf dema tèn dawiya lêkeran qertafên kesane ne lê dema tèn dawiya navdêran lêkera ‘bûn’ê ne

**Mînak:** Ez dixwim (qertafa kesane)  
Ez baş **im** (lêkera bûn’ê)

**Nîşe:** Cînavkên xwerû bi lêkerên gerguhêz re di dema borî de bèn bikaranîn dibin bireser.

**Mînak:** Evînê **ez** dîtîm, Evînê **hûn** dîtîm,  
Evînê **tu** dîtî, Evînê **ew** didît.

## 2- CÎNAVKÊN NÎŞANÊ

Ev cînavk bi riya nîşanê cihê navdêran digirin. Cînavkên şanîdanê di eslê xwe de du heb in: ‘Ev’ û ‘ew’; dema ku qertafên diyariyê digirin formên wan ên nêr, mê û pirjimar jî li wan zêde dibin. Bi vî awayî dibin heşt heb. “Ev, vî, vê, van” şûna tiştên nêz digirin; “Ew, wî, wê, wan” jî şûna tiştên dûr digirin.

Ev, vî, vê, van

Ew, wî, wê, wan

**Mînak:** Pirtûk li ser masê ye → ew li ser masê ye

Ji jiyane hez bike → ji wê hez bike

Zarokan bîne → wan bîne

Heval ji ku tê → ev ji ku tê

Tu kevir bavêje → tu viya bavêje

**Hişyarî:** Divê cînavkên nîşaniyê û rengdêrên nîşaniyê neyên tevlihevkin.

**Mînak:** Ev av çî xweş e (rengdêra nîşaniyê).

Ev çî xweş e (cînavka nîşaniyê).

**Nîşe:** Peyva “ha” wateya nîşaniyê dide. Carinan ji cînavkan cuda, carinan jî weke qertaf bi wan ve tê nivîsîn.

**Mînak:** Evê ha = Eviya/viya  
Ewê ha = Ewiya/wiya  
Evên ha = Evana/vana  
Eva ha = Evaya/vaya  
Ewa ha = Ewaya/waya  
Ewên ha = Ewana/wana



### 3- CÎNAVKÊN NEDIYARIYÊ:

Ev cînavkê şûna navdêrên nediyar digirin. Hin cînavkê nediyar ev in: kes, yek, filan, ewk, çîk, tu, tişt, hin, hemû, gelek, piç, tev, pir, gî, giş, çend...

**Mînak:** Kes nikare me asteng bike.

Hemûyan azadiya xwe bi dest xist.

Gelek hatin.

Ewkê me nas dike.

**Nîşe:** Divê cînavkê nediyariyê û rengdêrên nediyariyê neyên tevlihevkirin

**Mînak:** Hemû mirov hatin (rengdêr e)

Hemû hatin (cînavk e)

### 4- CÎNAVKÊN PIRSIYARIYÊ

Bi rîya pirsê cihê navdêran digirin, hin cînavkê pirsiyariyê ev in: Kî, çi, kîjan, ku, çend...

**Mînak:** Kî çû bajêr?

Kê got?

Çi ji banî de ket?

Kîjan pir jîr bû?

Tu li ku bû îro?

Çendan porteçal xwar?

**Nîşe:** Divê cînavkê pirsiyariyê û rengdêrên pirsiyariyê neyên tevlihevkirin.

**Mînak:** Kîjan heval tê?(rengdêr e)

Kîjan tê?(cînavk e)

### 5- CÎNAVKA “XWE”yê

Çend fonksiyonên cînavka ‘xwe’yê hene:

a. Karê ku tê kirin vedigerîne ser kirdeyê.

**Mînak:** Ew xwe pir dicibîne.

Ez xwe dişom.

b. Di ravekan de wateya xweditiyê çê dike.

**Mînak:** Ez ji yara xwe hez dikim.

Ew ji birayê xwe hez dike.

c. Bi daçekan re tê bikaranîn û hokeran çê dike.

**Mînak:** Ez ji xwe re nan dixwim.

(di wateya “bi tena serê xwe” de hatiye bikaranîn.)

Evîn ji xwe re pirtûkan kom dike

(di wateya “ji bo xwe “de hatiye bikaranîn)

d. Di biwêjan de tê bikaranîn.

**Mînak:** Heta ez çûm ji xwe çûbû (jixweçûn)  
Dîsa xwe berdaye (xweberdan)

### 6- CÎNAVKA “HEV”Ê

Ev cînavk, karê ku bi hev re û beramberî hev tê kirin nîşan dide. Qalibên wê yên din jî hene: Hevûdu hev û din; lê ji ber ku “hev” bi tena serê xwe jî heman wateyê dide “hev” dikare bê tercîhkirin.

**Mînak:** Em ji hev hez dikin.  
Ew hev naêşînin.  
Hûn bi hev re dişixulin.

**Nîşe:** Cînavka “hev”ê di çêkirina biwêjan de pir tê bikaranîn.

**Mînak:** Me bi hev çinî (bihevçûn).  
Em li hev nakin (lihevkirin).

### B- CÎNAVKÊN QERTAFÎ

Cînavkên qertafî jî di rola cînavkê de ne, lê ew ne weke peyv in, qertafî ne. Carinan tên dawiya lêkeran û daçekan.

Du cure cînavkên qertafî hene:

a. Cînavkên Pêwendiyê: **(-)(y)a, -(y)ê-, (y)ên**

b. Cînavka “ê”yê

**a- Cînavkên Pêwendiyê:** Ev cînavk(-a, -ê, ên) di eslê xwe de qertafên raveberê ne; lê ji ber ku ravebera wan ketiye ji dêvla raveberê pêwendiyê bi peyva piştî xwe re çê dikin.

**Mînak:** Deriyê dibistanê → ê dibistanê

Evîna min → a min

Pirtûkên min → ên min

Dema ravebera raveka navdêrî û raveka rengdêrî hevbeş be û ravek ketin nav hev cînavkên pêwendiyê dikevin van forman:

Piştî dengdarekê

Hevalê min **ê** baş

Hevala min **a** baş

Hevalên min **ên** baş

piştî dengdêrekê

hevalê Hîwa **yê** baş (yekjimar û nêr)

hevala Hîwa **ya** baş (yekjimar û mê)

hevalên Hîwa **yên** baş (pirjimar)

- Li hin herêman jî bo her sê formên jor jî “-î” tê bikaranîn.

Hevalê min **î** baş, hevala min **î** baş, hevalên min **î** baş

**Nîşe:** Cînavkên pêwendiyê berî lêkeran bèn wan dikin lêkernav.

**Mînak:** Ê dixwe (kesê ku dixwe)  
Ên girtî (ên ku girtî)

**b- Cinavka “ê”yê:** Ev cînavk tê dawiya lêkerê û dawiya daçekê û şûna peyva piştî lêker an daçekê digire. Loma jî dibin du beş:

**Mînak:**

**Paşlêkerî**

Min pirtûk da wî→ min pirtûk dayê.

Ez çûm Mêrdînê→ ez çûmê.

**Paşdaçekî**

Min ji yara xwe hez kir→ min jê hez kir.

Min li wî pirsî→min lê pirsî.

Yek ji wan baş bû→yek jê baş bû.

# HOKER

- Hoker
- Hin Taybetiyên Hokeran
- Hokerên Çawaniyê
- Hokerên Demê
- Hokerên Cî û Bergehê
- Hokerên Mêjerê
- Hokerên Pirsîyariyê
- Hokerên Nîşaniyê
- Sazbûna Hokeran
  - Hokerên Xwerû
  - Hokerên Pêkhatî
  - Hokerên Hevedanî

# HOKER

Peyvên ku tesîrê li lêker, lêkernav, rengdêr û dîsa li hokeran dikin hoker in. Lê herî pir ji bo lêkeran tîk bikaranîn û lêkeran ji aliyê rewş, dem, mêjer, bergeh û pirsê ve diyar dikin.

**Mînak:** Pir dipeyive (bandor li lêkerê ye).

Yê ku pir dipeyive nehatiye (bandor li lêkernavê ye).

Rojên pir xweş li pêş me ne (bandor li rengdêrê ye).

Pir xweş dipeyive (bandor li hokerê ye).

## Hoker dibin pênc beş:

**1- Hokerên Çawaniyê:** Wateya lêker, rengdêr û hokerê ji hêla çawanî û rewşî ve dinimîne. Ji bo ku mirov vê hokerê bibîne divê pirsên weke çawa, çima, ji lêker, rengdêr û ji hokerê bike.

**Mînak:** Ew xweş dipeyive. (çawa dipeyive?)

Ji bo kes nepeyive naçe. (çima naçe?)

Min got wiha neke. (çawa neke?)

**2- Hokerên Demê:** Wateya pêveberê ji hêla demê ve diyar dike. Ji bo mirov hokera demê bibîne divê pirsên weke 'kengî, heta kengî, ji kengî ve ye... ji pêveberê bike.

**Hin lêkerên demê ev in:** Duh, îro, îşev, sibê, bişev, biroj, êvarkî, berêvarkî, paşê, berê, hê nuh, hê jî, carna...

**Mînak:** Sibê were mala me. Duh ew ji vir çû.

Îsal nan tune ye. Mirov carinan gêj dibin

Aliyê êvarê were.

**Nîşe 1:** Dibe ku wateya demê bi awayekî din jî çê bibe.

**Mînak:** Di xortaniya xwe de zewicî.

Hîn ku ez bi te re nexeyîdîme, ji vir here.

**Nîşe 2:** Hokerên demê dema ku wateya demê nedin dibin navdêr.

**Mînak:** Nivro ne xweş e. Şev naqede.

**3- Hokerên Cî û Bergehê:** Lêkerê ji aliyê wateya cî û bergehê ve tamam dike.

**Mînak:** Herin pêş Derkevin derve

Ew çûn jêr Neçin hundir

**Hişyarî:** Hokerên cî û bergehê divê xwerû bin. Eger bi daçekan re bîkaranîn dibin tîker û bireser.

**Mînak:** Alavan bibin **zor** (hoker). Alav **li zorê** mane (tîker)

**4-Hokerên Mêjerê:** Tên pêşiya pêveber, rengdêr û hokeran û wan ji hêla mêjer û radeyî ve diyar dikin. Hin hokerên mêjerî ev in: Pir, zehf, gelekî, hindik, piçkî... Bi pirsê "çiqas" em dikarin wê bibînin.

**Mînak:** Keçikeye pir xweş e (bandor li rengdêrê ye).

Pir xweş derbas bû (bandor li hokerê ye).

Wê gelekî xwar (bandor li pêveberê ye).

**5-Hokerên Pirsyariyê:** Peyvên ku dem, sedem, mêjer û çawaniya lêkerê bi riyê pirsê diyar dikin, hokerên pirsyariyê ne. Çima, çawa, kengê, heta kengî, ji kengî ve... Hokerên pirsyariyê ne.

**Mînak:** Ew kengî çû?

Çima li te xist?

Çawa meşiya?

**6-Hokerên Nîşanê:** Hokerên nîşanê nêzbûn an dûrbûna tiştê ku tê kirin an jî diqewime nîşan dide. "Va" ji bo kirin an qewimînên nêz, "wa" jî bo yên dûr tê bikaranîn.

**Mînak:** Va min çê kir. ("çêkirin" hatiye nîşandan)

Va ez nan dixwim. (bûyera "xwarin"ê hatiye nîşandan)

## SAZBÛNA HOKERAN

Hoker li gorî sazûna xwe dibin sê beş:

**a.Hokerên Xwerû:** Ji hêmanekê pêk tên. Qertafên çêker nagirin.

**Mînak:** Duh, sibê, jor, jêr,

**b. Hokerên Pêkhatî:** Qertafên çêker digirin û dibin pêkhatî.

**Mînak:** Evarkî, havînî, camêrane, pêrar, dizîka...

**c. Hokerên Hevedanî:** Hokerên hevedanî bi çar awayan çê dibin.

**1-** Ji du peyvên çê dibin: çawa (çi+awa), îşev (ev+şev), îsal (ev sal)

**2-** Di nava raveka rengdêran de çê dibe: sala bê, dema borî, wê gavê her car, tu car

**3-** Bi alikariya daçekan: Berî êvarê, berî esrê, ji sibehê pê de, bi xweşkayî

**4-** Bi peyvên dubestî çê dibin: Hema hema, kêma zêde, şilf û tazî

# DAÇEK

→ **Daçek**

→ **Daçekên Sereke**

- Bi
- Bi....de
- Bi....re
- Bi....ve
- Di....de
- Di....re
- Li
- Ji
- Ji....bo
- Ji...re
- Ji....de
- Ji...ve
- Tenê
- Bi qasî
- Weke

→ **Hin Taybetiyên Daçekan**

→ **Sazbûna Daçekan**

- Daçekên Xwerû
- Daçekên Qalibî

## DAÇEK

Daçek ew bêje ne ku bi tena serê xwe tu wateya wan tune ye; lê di nava hevokê de bi bêjeyên din re tên bikaranîn û wateyên cuda cuda didin hevokê.

**Çend daçekên sereke ev in:** Bi, bê, bi....re, bi.....ve, li, ji, ji bo, ji....de, ji.....re, ji.....ve, di, di....de, di....re, tenê, wekî, bi qasî, ber, di ber, alî, gor, cem, fena, mîna, rex, qey, heçko, ligel, (digel, tevî)

**Bi:** Gelek rolên vê daçekê hene.

a. Wateya bikaranîna navgîniyê dide: Sêv bi kêrê jê kir.

b. Wateya “li gorî min” dide: Bi min ev şaş e.

c. Dabeşiyê dide peyvan: Dudu bi dudu dimeşin.

d. Bi peyvên bergehî re tê bikaranîn: Bi ser çiya de çû, ber bi çiyê ve çû.

e. Sondan çê dike. Bi xwedê, bi serê te.

**Nîşe:** Neyiniya daçeka “bi” jî “bê” ye

**Mînak:** Ez bi te serbilind im.

Bê te jiyana naçe serî

**Bi..... de:** Wateya ber bi alîkî nîşan dike.

**Mînak:** Bi wir de çû.

Bi vir de hat.

Bi ser de ket.

**Bi.....re:** Bihevrebûnê nîşan dide:

**Mînak:** Ez bi wî re çûm.

Ew bi diya xwe re çû.

**Bi....ve:** Wateya ber bi alîkî û zeliqînê nîşan dike.

**Mînak:** Bi wir ve çû.

Bi jor ve hilkişî.

Wêne bi dîwêr ve kir.

Ber bi min ve hat.

**Di.....de:** Hundirê tişteki yan cihekî nîşan dide. Hin wateyên din jî çê dike.

**Mînak:** Di mal de me.

Di dibistanê de me.

Di beroşê de goşt heye.



**Di ber....de**

Di ber welat de hat kuştin. (wateya “ji bo” dide.)  
 Di ber xwe de dipeyîvî. (wateya “bi xwe re” dide.)  
 Di ber min de da. (wateya “ji şûna min” dide.)

**Di.....re:** Wateya “derbasbûnê” dide.

**Mînak:** Ez di wir re çûm.  
 Ez di wir re hatim.  
 Di nav xelkê re bihurî.

**Li:** Cihê lêbûnê, berpêbûnê nîşan dide. Dibe têrker û bireser.

**Mînak:** Ew li mal e. (têrker-lêbûnê nîşan dike)  
 Li pirtûkê binêre. (têrker-berpêbûnê diyar dike).  
 Min li te pirsî. (bireserê diyar dike).

**Ji:** jêderketinê û jêçêbûnê diyar dike. Carinan bireserê diyar dike.

**Mînak:** Ji malê têm. (têrker-jêderketinê diyar dike)  
 ji min hez bike. (bireserê diyar dike)  
 Kaxiz ji daran çê dibe. (jêçêbûnê diyar dike-têrker)  
 Ji min xeydî. (têrkerê diyar dike)

**Ji bo:** Wateya armancê û sedemê dide hevokê.

**Mînak:** Ji bo te ez hatim. (armanc-hoker)  
 Ji bo ku em dereng hatin, em nekirin hundir.  
 (sedem-encam-hoker)

**Ji...de:** Cih û aliyê ku tevger jê dest pê dike nîşan dide.

**Mînak:** ji wir de hat.  
 Ji vir de çû.

**Ji.....re:** Wateya berpêbûnê dide. Dibe ku armancê jî bide.

**Mînak:** Ji min re kulîlkê bistîne (berpêbûn)  
 Ji gund re kar dike (armanc)

**Ji...ve:** Aliyê tevgerê nîşan dide, hin wateyên din jî dide.

**Mînak:** Ji min ve xuya nake. (ji aliyê min ve)  
 Ji wir ve hat. (cihê hatinê diyar dike)  
 Ji ber min ve jî bixwe. (ji dêvla min ve)

**Tenê:** Ev jî wateya tenê, hew, xwerû dide.

**Mînak:** Tenê ji te hez dikim.  
 Bila tenê ew were.

**Nîşe:** Li gorî bikaranînê ev daçek dibe hoker û rengdêr:

**Mînak:** Ew tenê dijî. (hoker)  
Tenê tu ji min hez bike. (daçek)  
 Keçika tenê bînin vir. (rengdêr)

**Bi qasî:** Ev daçek ji aliyê mêjerê ve wateya wekhevîyê çê dike.

**Mînak:** Min bi qasî te xwar. (wekhevî)

Mêrikê bi qasî dêwekî. (wekhevî)

**Weke(mîna-fena-nola):** Ev jî daçeka şibandinê ye.

**Mînak:** Weke bavê xwe egît bû. (şibandin)

Weke te dixwar. (şibandin)

### **Hin Taybetiyên Daçekan**

a. Daçek carinan dibin qertaf û peyvên nuh çê dikin:

**Bêguman, biav...**

b. Daçek alîkariya çêkirina lêkerên hevedanî dikin:

Lêxistin, pêxistin, jêkirin...

c. Alîkariya biwêjan dikin:

Bi serî bûn, li ber xwe ketin, li ber xwe dan...

d. Daçek peyvên piştî xwe diyar dikin :

Li malê, ji sûkê, ji min, bi yekî, wek wan...

### **SAZBÛNA DAÇEKAN**

**Daçek li gorî sazûna xwe dibin du beş:**

a. **Daçekên xwerû:** Ev cure daçek bi tena serê xwe tên bikaranîn.

**Mînak:** Ji, li, bi, tenê, hew, weke

**Nîşe:** Daçekên mîna hew, tenê, weke... Daçekên bêjeyî ne.

b. **Daçekên qalibî:** Ev daçek ji pêşdaçek û paşdaçekan an jî ji daçekê û hêmaneke din pêk tên.

**Mînak:** Bi....re,

bi....de,

ji.....re,

dî....de,

ji bo (bûyîn),

bi qasî...

## GIHANEK Û BANEŞAN

- Gihanek
- Bikaranînên Gihanekan
- Gihanekên ji Yek Hêmanê Pêk Tên
- Gihanekên ji Du Hêmanan Pêk Tên
- Gihanekên Qalibî

- Baneşan
- Yên ku di Binyada Xwe de Baneşan in
- Yên ku li gorî bikaranînê dibin baneşan
- Qertafên Baneşanî
- Peyvên Olanî Yên ku Dibin Baneşan
- Li Gorî Bikaranînê Wateyên Cuda yên Baneşanê

## GIHANEK

Peyvan, komên peyvan û hevokan bi hev ve girê didin, bi tena serê xwe nayên bikaranîn. Hin gihanekên sereke ev in: An, û, ango, jî lê, lê belê, belkî, çimkî, gerçî, ku, an... an, ya....yan, ya.....ya, çi.....çi, eger, heke, ha...ha, bes, him.....him, ji lewre, ne.....ne

### **Mînak:**

Berfîn **û** Gulê pirtûkê dixwînin.(du peyv bi hev ve girê dane)

Min nan xwar; **lê** ez têr nebûm.( du hevok bi hev ve girê dane)

**Ne** beşçeyê me **û** **ne** jî beşçeyê we xweş in. (du ravek bi hev ve girê dane)

**Gihanek li gorî bikaranîna xwe hin wateyan jî didin hevokê:**

### **Mînak:**

Min **jî** ew pirtûk xwendibû (weke mirovên din).

**Ku** amede bûbe em dikarin biçin (şert).

Ez geriyam; **lê belê** min nedît ( rewşên li dijî hev).

Bavê min dibêje **ku**: "Hûn naşixulin." (axaftin)

Nehat cem min **ku** ez tiştekî jê re bibêjim ( sedem-encam).

**Ne** dişixule **ne** tev digere (du tevgerên neyînî).

**Hem** dişixule **hem** tev digere (du tevgerên erênî).

**Ya** ez **ya** ew (tercîh).

Ez hatim **ku** te bibînim (armanc).

Hevalê **ku** hat (alîkariya çêkirina lêkernavan dike).

**Hin gihanek ji yek hêmanê pêk tên:**

an, û, ku, jî, lê, loma, bila

**Hin gihanek ji du hêmanan pêk tên:**

Çimkî (çima ku), nexwe (ne xwe),

belkî (belê ku), gerçî (eger çi)...

**Hin gihanek ji qaliban pêk tên:**

Lê belê, ji lew re, hem.... hem, ne.....ne, hem.....hem jî, ya.....ya

## BANEŞAN

Baneşan ew peyv in ku em wan di dema heyecan, tirs, kêfxweşî, qehr, heyirîn, bangkirin, ecibandinê û hwd. de bi kar tînin.

### **Baneşan dibin sê beş:**

**1- Yên ku di binyada xwe de baneşan in:** Hin peyv hene ku di eslê xwe de baneşan in.

**Mînak:** Ax! Ay! Oy! Ox! Deh! Ey! Hey! Ha ho! Wax! Wey! Wa!...

**2- Yên ku li gorî bikaranînê dibin baneşan:** Ev peyv di eslê xwe de ne baneşan in; lê bi bilêvkirinê û bi qertafên baneşanî dibin baneşan. Peyvên raweya fermanî dibin baneşan.

**Mînak:** Eferim! Bixwe! Bisekine! Heyf!

### **Qertafên Baneşanî:**

**-o:** Ji bo yê nêr: Ehmedo! Kuro! Hevalo!

**-ê:** Ji bo yê mê: Esmayê! Keçê! Hevalê!

**-ino:** Ji bo pirjimaran: Xelkino! Hevalino! Keçino!

**Nîşe:** Carinan qertafa baneşanî ya mê li şûna ya nêr tê bikaranîn. Carinan jî qertafa baneşanî ya nêr li şûna ya mê tê bikaranîn. Ji ber du sedeman dibe ku hatibe gotin: 1- Heqaret 2- Samîmîyet û hezkirin

**Mînak:** Ehmedo! dibe → Ehmedê! Xecê! dibe →Xeco!

**3- Peyvên Olanî:** Peyvên ku ji olanê çê dibin peyvên baneşanî ne.

**Mînak:** Xiş! Teq! Bom! Firr! Şişş! Pix!...

### **Li gorî bikaranîna xwe wateyên cuda cuda didin hevokê:**

Waa! Ew jî çû! (heyirîn)

Ax! Ev çi bû hat serê me. (xemgînî)

Ax! Zaroktiya min. (bêrîkirin)

Gelî zarokan! Guhdar bin. (bangkirin)

Off! Dîsa hat. (acizbûn)

Way! Çi xweş e. (ecibandin)

Piştî baneşanan hevok bi tîpa mezin dest pê dike: Go teq! Ez pir tirsiyam.

Baneşan dema ku di hevokê de be ew hevok hevoka baneşanî ye.

# LÊKER

- Navên Lêkeran
- Di lêkeran de kes
- Li gorî wateya xwe lêker
- Di lêkeran de rawe
- Raweyên Demê
  - Demên Borî
  - Dema Niha
  - Dema Bê
- Raweyên Xwestekî
  - Daxwazî/bilanî
  - Şertî
  - Viyanî
  - Fermanî
- Li gorî avaniya demê lêker
- Lêkerên Demên Xwerû
- Lêkerên Demên Hevedanî
  - Demên Çîrokî
    - Çîrokiya Dema Boriya Dûdar
    - Çîrokiya Dema Niha
    - Çîrokiya Dema Bê
    - Çîrokiya Raweyên Xwestekî
- Pevguherîna wateyên raweyan
- Lêkera “bûn”ê
- Lêkera “kirin”ê
- Li gorî sazûna xwe lêker
- Lêkerên Xwerû
- Lêkerên Pêkhatî
- Lêkerên Hevedanî
- Lêkerên Alîkar
- Lêkerên Biwêjî
- Ji Aliyê Ristbûnê ve Lêker
- Lêkerên Birist
- Lêkerên Bêrist
- Lêkerên Din

# LÊKER

Lêker, kar, tevger û kirina heyberan nîşanî mirov didin. Cihê ku lêker lê hebe, tevger, kar û bûyîn heye. Lêker, qertafên deman û kesan digirin û darazan çê dikin.

## Navên Lêkeran

Dema ku em raderê li lêkeran bar kin, navên lêkeran derdikevin holê. Di Kurmancî de rader qertafa -(i)n e. Piraniya lêkerên Kurmancî bi qertafên -î, -iya, -a, -t, -and'ê çê bûne. Piştî van qertafan jî rader tê û navên lêkeran çê dike.

### Mînak:

<u>Navê Lêkerên Pêkhatî</u>	<u>Navdêr</u>	<u>Qertaf</u>	<u>Rader</u>
Ken-î-n	Ken	-î	-n
Kol-a-n	Kol	-a	-n
Bez-ya-n	Bez	-iya	-n
Rij-and-in	Rij	-and	-in
Paras-t-in	Paras	-t	-in

### Navê Lêkerên Xwerû

	<u>Lêker</u>	<u>Rader</u>
Hat-in	Hat	-in
Çû-n	Çû	-n
Ma-n	Ma	-n

Qertafên ku lêkeran çê dikin pênc in û yê herî pir tèn bikaranîn -î û -and' e. -î di hin lêkeran dageriyaye a-'yê, di hinan jî de dageriyaye -iya'yê. Qertafa -and'ê jî di hin lêkeran de dageriyaye -t'yê. Li gorî herêman her du form jî tèn bikaranîn.

-î: Ev qertaf tê dawiya navdêran û bi piranî lêkerên negerguhêz çê dike û di hin lêkeran de qertafa -î'yê guheriyê bûye qertafa -a. Di hin lêkeran de jî guheriyê û bûye -iya.

### Mînak:

Kolîn bûye kolan      çêrîn bûye çêran      kutîn bûye kutan  
Kêlîn bûye kêlan      kêlîn bûye kelan      pêçîn bûye pêçan  
Revîn bûye Reviyan      meşîn bûye meşiyên      gerîn bûye geriyên  
Çêrîn bûye çêriyan      bezîn bûye beziyan      kêlîn bûye keliyan

**Nîşe:** Lêkerên ku bi -î'yê çê dibin piranî negerguhêz in. Lê lêkerên mîna "pîrsîn, kutîn, kolîn, nivîsîn, kêlîn..." gerguhêz in.

**-and:** Ev qertaf tê dawiya navdêran û lêkerên gerguhêz û dançêker çê dike.

<b>Mînak:</b>	<b><u>Gerguhêz</u></b>	<b><u>Dançêker</u></b>
	Rev-and-in	Pirs-and-in
	Ken-and-in	Nivîs-and-in
	Meş-and-in	Axiv-and-in

Di hin lêkeran de qertafa –and’ê dageriyaye –t’yê.

Guhêrandin	bûye Guhertin	Qeşirandin	bûye Qeşartin
Nihêrandin	bûye Nihêrtin	Alisandin	bûye Alastin
Bihîsandin	bûye bihîstîn	Axivandin	bûye Axaftin
Guvêşandin	bûye guvaştin	Pelixandin	bûye pelaxtin

**Nîşe:** Wateya herdû forman yek e lê di hin lêkeran de tenê forma –t’yê maye.

**Mînak:** Avêjtin, firoştin, girtin, xwestin, hejmartin, parastin, spartin, veşartin, şuştin, koştin, kuştin, Ajotin

**Hişyarî:** Di hin lêkerên negerguhêz de tîpa –t’yê aîdê koka peyvê ye tu tîkiliya wê bi –t’ya lêkerçêker re tune ye.

**Mînak:** Ketin, hatin, Şikestin...

### Di Lêkeran de Kes

Lêker qertafên kesane distînin û li gorî kesane ev qertaf diguherin. Qertafên kesane li dawiya lêkeran tîna nivîsîn.

<b>Kes</b>	<b>Kişandina lêkerê</b>	<b>Kişandina lêkerê</b>
<u>Yekjimar</u>		
1. Ez→-im’ê distîne	Di -xw + im	Çû + m
2. Tu→-î’yê distîne	Di-xw + î	Çû + yî
3. Ew→-e’yê distîne	Di-xw + e	Çû -
<u>Pirjimar</u>		
1. Em→-in’ê distîne	Di-xw + in	Çû + n
2. Hûn→-in’ê distîne	D-ixw + in	Çû + n
3. Ew→-in’ê distîne	Di-xw + in	Çû + n

**Hişyarî:** Di dema boriya tîdeyî de lêkerên negerguhêz qertafa kesê sêyem û yekjimar e’yê nagirin.

**Mînak:** Ew hate kuştin. (-e zêde ye)



## A- LI GORÎ WATEYA XWE LÊKER

**a. Lêkerên Pêkanîne:** Kirde karekî dike an pêk tîne. Di vî karî de navgînekê bi kar tîne. Ev cure lêker gerguhêz in.

**Mînak:** Birîn, xwendin, nivîsîn...

**b. Lêkerên Rewşê:** Rewşa kesekî yan jî tiştekî diyar dikin û negerguhêz in.

**Mînak:** Raketin, meşîn, rabûn, rûniştin...

**c. Lêkerên Bûyîne:** Qewimînên ku vîna mirovan tê de tune ye diyar dikin û negerguhêz in.

**Mînak:** Mezinbûn, mirin, tîbûn, birçîbûn...

## B- DI LÊKERAN DE RAWE

Du raweyên lêkeran hene: Raweyên demî û raweyên xwestekî. Raweyên demî wateya demê didin lêkeran. Di deman de du kokên lêkeran hene; Ji bo dema niha û bê kokek, ji bo dema borî jî kokeke cuda tê bikaranîn.

**Mînak:** Lêkera “Xwarin”ê

### Koka Dema Borî

Min **xwar**. (‘xwar’ koka dema borî)

### Koka Dema Niha û Bê

Ez dixwim. (‘**xw**’ koka dema niha)

Ez ê bixwim. (‘**xw**’ koka dema bê)

Dema em qertafa raderê ‘-in’ê ji lêkeran bavêjin koka dema borî bi dest dikeve û ev kok ji bo hemû demên borî tîbî bikaranîn.

<b>Mînak:</b>	<b><u>Lêker</u></b>		<b><u>koka dema borî</u></b>
Girtin	-in bê avêtin	girt	Min girt.
Parastin	-in bê avêtin	parast	Min parast.
Kelandin	-in bê avêtin	keland	Min keland.
Meşandin	-in bê avêtin	meşand	Min meşand.
Reviyan	-(i)n bê avêtin	reviya	Ew reviya.
Keliyan	-(i)n bê avêtin	keliya	Xwarin keliya.
Kirin	-in bê avêtin	kir	Wî kir.
Bûn	-in bê avêtin	bû	Ew bû.

## 1- RAWEYÊN DEMÊ

**A- Dema Borî:** Bûyer an qewimînên ku bi dawî bûne diyar dike. Di dema borî de eger lêker gerguhêz be kirde diyarbûyî ye û pêveber li gorî kes û yekjimarî û pirjimariya bireserê qertafan destine (ergatîfî). Dema borî di nava xwe de dibe du beş:

**a. Dema Boriya Têdeyî:** Bûyer an qewimînên ku kirde bixwe tê de ye diyar dike. Dema ku em raderan ji lêkeran bavêjin koka dema boriya têdeyî ya li gorî kesê sêyem û yekjimar dimîne. Ev kok ji bo hemû demên borî tèn bikaranîn. **Mînak:**

<u>L. Negerguhêz</u>	<u>Koka dema boriya têdeyî</u>	<u>Mînak</u>
Geriya-n	Geriya	Leyla <u>geriya</u>
Kelijî-n	Kelijî	Ew pê ve <u>kelijî</u>
Hati-n	Hat	Zîn <u>hat</u>

<u>L. Gerguhêz</u>	<u>Koka dema boriya têdeyî</u>	<u>Mînak</u>
Bezand-in	Bezand	Wî hesp <u>bezand</u>
Pirsî-n	Pirsî	Te ji wî <u>pirsî</u>
Pelaxt-in	Pelaxt	Min ew <u>pelaxt</u>

**Nîşe:** Di dema borî de di lêkerên gerguhêz de kirde diyarbûyî ye pêveber li gorî kes û yekjimarî û pirjimariya bireserê qertafan digire.

**Mînak:** Te ez kuştim. (Lêkera 'kuştin'ê li gorî bireserê ('ez'ê) hatiye kişandin-ergatîfî).

Wî sêv xwar.

(Sêv yekjimar e; loma pêveberê tu qertaf negirtiye).

Wî sêv xwarin.

(Sêv pirjimar e; loma pêveberê qertafa pirjimarîyê girtiye).

**b. Dema Boriya Dûdar:** Bûyer an qewimînên ku kirdeyê bihîstiye diyar dike. Dema ku em

-e'yê li koka dema borî zêde kin dema boriya têdeyî bi dest dikeve. Tîpa dawîn a lêkerê dengdar be di kesê sêyem de ev qertaf dibe -iye, tîpa dawî ya lêkerê dengdêr be ev qertaf dibe “-(y)e”.

**Mînak:**

<u>L. Negerguhêz</u>	<u>Koka dema boriya têdeyî</u>	<u>Mînak</u>
Geriya-n	Geriya	Leyla geriya-ye.
Kelijî-n	Kelijî	Ew pê ve kelijî-ye.
Hat-in	Hat	Ew hat-iye.

**L. Gerguhêz**

Bezand-in

Pirsî-n

Pelaxt-in

**Koka dema boriya têdeyî**

Bezand

Pirsî

Pelaxt

**Mînak**

Wî hesp bezand-iye.

Te ji min pirsî-ye.

Min ew pelaxt-iye.

**Hişyarî:** Li hin herêman ji bo kesê duyemîn di dema boriya dûdar de ji dêvla –e'yê qertafa –î'yê tê bikaranîn; lê ev çewt e.

**Mînak:** Tu hatiyî(çewt)

Tu hatiye(rast)

**Neyîniya Dema Borî:** Qertafa neyîniya dema borî –ne ye.

**Mînak:** Wî hesp nebezand. (neyîniya têdeyî)

Te ji min nepirsiye. (neyîniya dûdar)

Qertafa neyîniyê berî koka lêkerê û pê ve tê nivîsîn. Eger lêker bi pêrkîr be, dikeve nava pêrkîr û lêkerê.

**Mînak:** Min av venexwar

Xwe li min ranegirtiye

**B- Dema Niha:** Vegotin û bûyer di heman demê de pêk tên.

Qertafa dema niha di- ye. Koka dema niha ne weke dema borî ye. Bi taybetî di lêkerên bêrist de pir tên guhertin; eger raweya fermanî bê zanîn kok jî eşkere dibe.

**Mînak:**

**Lêker****R. Fermanî****Koka Dema Niha****Dema Niha**

Revîn

bi-**rev**-e

rev

di-**rev**-im

Kenîn

bi-**ken**-e

ken

di-**ken**-im

Ketin

bi-**kev**-e

kev

di-**kev**-imKenandin bi-**kenîn**-e

kenîn

di-**kenîn**-im

Xwarin

bi-**xw**-e

xw

di-**xw**-im

Kirin

bi-**k**-e

k

di-**k**-imRevandin bi-**revîn**-e

revîn

di-**revîn**-im

Kujtin

bi-**kuj**-e

kuj

di-**kuj**-im

Lêkerên ku bi pêrkîr bin qertafa dema niha “di” dikeve navbera pêrkîr û koka lêkerê.

**Mînak:** Ez ve-**di**-xwim

Ew ra-**di**-keve

**Neyîniya Dema Niha:** Neyîniya dema niha bi qertafa –na'yê çê dibe û –di nayê bikaranîn û ji bo lêkerên “karîn” û “zanîn”ê jî “ni” tê bikaranîn.

**Mînak:** Nakenim, **nikarim**

**Naxwim, nizanim**

**Nîşe:** Dema lêker bi pêrkît be qertafa –na dikeve nava pêrkît û lêkerê.

**Mînak:** Ra-na-zêm  
Ve-na-xwim

**C- Dema Bê:** Di Kurmancî de du heb demên bê hene.

**a. Dema bê :** Ji bo bûyerên ku wê di pêşerojê de pêk bên tê bikaranîn; vegotin heye lê bûyer hêj neqewimiye. Piştî kirdeyê daçekên dê/wê/ê tên û qertafa dema bê “bi-“ berî koka lêkerê tê û piştî koka lêkerê li gorî kesan qertafên kesane tên bikaranîn. Eger raweya fermanî bê zanîn kok jî eşkere dibe.

Kirde dê/wê/ê bi+koka dema niha+qertafên kesane

Ez dê bi+ken+im

**Mînak:**

<u>Lêker</u>	<u>R. Fermanî</u>	<u>Koka Dema Niha</u>	<u>Dema Bê</u>
Revîn	bi-rev-e	rev	Ez ê bi-rev-im
Kenîn	bi-ken-e	ken	Ez ê bi-ken-im
Ketin	bi-kev-e	kev	Ez ê bi-kev-im
Kenandin	bi-kenîn-e	kenîn	Ez ê bi-kenîn-im
Xwarin	bi-xw-e	xw	Ez ê bi-xw-im
Kirin	bi-k-e	k	Ez ê bi-k-im
Revandin	bi-revîn-e	revîn	Ez ê bi-revîn-im
Kuştin	bi-kuj-e	kuj	Ez ê bi-kuj-im

**b. Dema Bê ya Têkûz:** Ev dem ji bo kirin û bûyînên ku di demeke diyar ya bê de wê pêk bê, biqewime û xelas bibe tê bikaranîn. Ev dem mîna demên din pir nayê bikaranîn.

Kirde dê/bê/ê koka dema borî+kişandina lêkera bûnê ya dema bê+qertafên kesane

**Mînak:** Heta tu bigihîjî wir ez dê hatibim.

Yekşema pêşiya me tê xebitîbe.

Heta tu nan çêkî em dê ji birçina miribin.

Dema ji bo dema borî tê bikaranîn wateya ihtîmalê dide.

Mînak: Do ew dê hatibe. Min dê berê jî xwaribe.

**Neyiniya Dema Bê:** Neyiniya dema niha bi qertafa –ne’yê çê dibe û ‘bi’ nayê bikaranîn û. Dema lêker bi pêrkît be qertafa –ne dikeve nava pêrkît û lêkerê.

**Mînak:** Ez ê nerevim  
Ew dê nekene  
Ez ê venegerim  
Tu dê hilnegirî

## 2- RAWEYÊN XWESTEKÎ

**a. Raweya Xwestekî/Bilanî:** Wateya hêvîkirin û xwestina kirina karekî dide. Gihanekên mîna “xwezî” û “bila” tên bikaranîn, lêker qertafa bi- û qertafên kesane distîne. Koka lêkerê ya dema niha tê bikaranîn.

### **Mînak:**

(Xwezî /bila) ez bi-kev-im.

(Xwezî /bila) tu bi-xw-î.

(Xwezî /bila) ew bi-xwaz-e .

### **Neyinî**

(Xwezî /bila) ez ne-kev-im.

(Xwezî /bila) tu ne-xw-î.

(Xwezî /bila) ew ne-xwaz-e .

Lêkerên ku bi pêrkît bin di raweya xwestekî de qertafa “bi” nagirin; qertafa neyiniyê jî dikeve navbera pêrkît û koka lêkerê.

**Mînak:** (Xwezî/bila) tu ra-kev-î ra-ne-kev-î

(Xwezî/bila) ew da-gir-e da-ne-gir-e

(Xwezî/bila) em ve-k-in ve-ne-k-in

**b. Raweya Şertî:** Pêkhatina bûyerê bi şertan ve girêdayî ye. Gihanekên mîna “eger”, “heke” û “ku” tên bikaranîn, lêker qertafa bi- û qertafên kesane digire. Koka lêkerê ya dema niha tê bikaranîn.

**Mînak:** (Eger / heke/ ku) tu bi-rev-î, tu dê bigihîjî ser.

(Eger / heke/ ku) ez zêde bi-xw-im, ez dê biêşim.

(Eger /heke/ ku ) ew bi-meş-e, wê rihet bibe.

Lêkerên ku bi pêrkît bin di raweya şertî de qertafa “bi” nastînin

### **Mînak:**

(Eger / heke/ ku)tu ra-kev-î tu dê dereng bimînî.

(Eger / heke/ ku)ew da-gir-e hûn jî alî wî bikin.

(Eger /heke/ ku )em ve-k-in em ê neçin.

Di forma neyînî de qertafa neyînî “-ne” dikeve navbera pêrkît û koka lêkerê.

### **Mînak:**

(Eger / heke/ ku)tu ra-ne-kev-î tu dê baş nebî.

(Eger / heke/ ku)ew da-ne-gir-e hûn jî alî wî bikin.

(Eger /heke/ ku )em ve-ne-kin em ê neçin.

**c. Raweya Viyanî:** Wateya hewcedariya kirin an bûyîna karekî, tiştekî nişan dide. Peyva **divê** tê serê hevokê, lêker qertafa bi- û qertafên kesane distîne. Koka lêkerê ya dema niha tê bikaranîn.

### **Mînak:**

Divê ez bi-rev-im.

Divê tu bi-xw-î.

Divê hûn bi-ç-in.

### **Neyinî**

Divê ez ne-rev-im

Divê tu ne-xw-î

Divê hûn ne-ç-in

Lêkerên ku bi pêrkît bin di raweya viyanî de qertafa “bi” nastînin. Qertafa neyiniyê “-ne” dikeve navbera pêrkît û koka peyvê.

**Mînak:** Divê ez ve-xw-im. Divê ez ve-ne-xw-im.  
Divê ez ra-kev-im. Divê ez ra-ne-kev-im .

**d. Raweya Fermanî:** Ji bo kesê duyemîn (yekjimar/pirjimar) fermana kirina kar dide. Piraniya lêkeran bi alîkariya daçeka “bi” û qertafa –e ‘yê çê dibin. Qertafa –e ji bo yekjimariyê; -in jî ji bo pirjimariyê tê bikaranîn.

**Mînak:**

<u>Lêker</u>	<u>R.Fermanî</u>	<u>Neyînî</u>	<u>Hevok</u>
Revîn	bi-rev-e	ne-rev-e	Tu ji vir bireve.
Revandin	bi-revîn-e	ne-revîn-e	Tu min birevîne.
Kenîn	bi-ken-in	ne-ken-in	Hûn bikenin. (pj.)
Kenandin	bi-kenîn-in	ne-kenîn-in	Hûn bikenînin. (pj.)

Lêkerên ku bi pêrkît bin di raweya fermanî de qertafa “bi” nastînin; qertafa neyîniyê “ne” dikeve navbera pêrkît û koka lêkerê.

**Mînak:** Raketin ra-kev-e ra-**ne**-kev-e  
Hilgirtin hil-gir-e hil-**ne**-gir-e  
Vekolîn ve-kol-e ve-**ne**-kol-e  
Dagirtin da-gir-e da-**ne**-gir-e

Çend heb lêker hene ku di raweya xwe ya fermanî de bêrist in û bêpîvan in.

**Mînak:**

<u>Lêker</u>	<u>Raweya Fermanî</u>
Girîn	bigirî
Rûniştin	rûnê
Guran	biguro
Xwarin	bixwe
Bûn	bibe
Kirin	bike

### C- LI GORÎ AVANIYA DEMÊ LÊKER

Li gorî avaniya deman lêker dibin du beş:

**a. Lêkerên Demên Xwerû:** Dema ku di lêkerê de demek bi tenê hebe, ew lêker ji aliyê demê ve xwerû ye.

**Mînak:** Ez îro çûm. (Dema borî)  
Ez îro di-ç-im. (Dema niha)  
Em dê bixebitinç. (Dema bê)

**b. Lêkerên demên hevedanî:** Dema ku di lêkerê de du dem hebin, ew lêker ji aliyê demê ve hevedani ye. Çîrokiya raweyên demê û xwestekê ji aliyê dema xwe de hevedanî ne.

**A- Çîrokiya Deman**

**1- Çîrokiya Dema Niha:** Bi qertafa dema niha “di” û bi koka dema borî çê dibe. Di forma neyinî de “ne” berî “di”yê tê bikaranîn.

**Mînak:**

<u>Q. Dema Niha</u>	<u>+Koka Dema borî</u>	<u>Q. Kesane</u>	<u>Hevok</u>
Di	Hat	-im	Ez dihatim/ nedihatim
Di	Hat	-î	Tu dihatî/ nedihatî
Di	Hat	-	Ew dihat/ nedihat
Di	Hat	-in	Em/hûn/ew dihatin/nedihatîn

**2- Çîrokiya Dema Bê:** Bi daçeka dema bê “-dê, -ê” û bi qertafa dema bê “bi-“ û koka dema borî ya lêkerê, qertafên kesane û qertafa çîrokîyê –a’yê çê dibe. Di forma neyinî de “bi” radibe “ne” tê bikaranîn.

**Mînak:**

<u>Q. D. Bê</u>	<u>Koka D. Borî</u>	<u>Q. Kesane</u>	<u>Q. Çîrokî</u>	<u>Hevok</u>
bi	Hat	-im	-a	Ez dê bihatima
bi	Hat	-î	-a	Tu dê bihata
bi	Hat	-	-a	Ew dê bihata
bi	Hat	-in	-a	Em/hûn/ew dê bihatina

Formeke din jî heye:

**Mînak:** Ez dê hatibûma/nehatibûma. (koka dema borî+koka “bûn”ê ya dema borî+qertafên kesane+qertafa çîrokîyê –a)

**3- Çîrokiya Dema Boriya Dûdar:** Koka dema borî, koka dema boriya lêkera “bûn”ê û bi qertafên kesane çê dibe.

<b>Hişyarî:</b> Di kişandina kesê duyem de qertafa kesane –î dikeve. Piştî qertafa çîrokî –a’yê divê qertafên kesane neyên.
<b>Mînak:</b> Tu dê bihatayî (çewt) Tu dê bihatiya→bihata (rast, “-î” û “y” dikevin) Em dê bihatana (çewt) Em dê bihatina(rast) Ez dê bihatama (çewt) Ez dê bihatima(rast)

**Mînak:**

<u>K. D. Borî</u>	<u>L. Bûn</u>	<u>Q. Kesane</u>	<u>Hevok</u>
ket	bû	-im	Ketibûm
ket	bû	-î	Ketibûyî
ket	bû	-	Ketibû
ket	bû	-in	Ketibûn

## B- Çîrokiya Raweyên Xwestekî

Çîrokiya hemû raweyên xwestekî bi heman rêbazê çê dibin.

**Nîşe:** -i'ya navbera "ket" û "bûn"ê dengdêra alîkar e.

**Forma yekem:** Bi peyvên raweya xwestekî (eger, xwezî, divê), qertafa bi-, koka lêkerê ya dema borî, qertafên kesane û qertafa çîrokiyê –a'yê çê dibe. Di neyiniya vê formê de "bi" radibe "ne-"tê bikaranîn.

### Peyvên R. Xwestekî K. D. Borî Q. Kesane Q. Çîrokiyê Li gorî cînavkan

Eger/Xwezî/divê	bi+çû	-im	-a	ez biçûma
Eger/Xwezî/divê	bi+çû	-î	-a	tu biçûya(biçûyiya)
Eger/Xwezî/divê	bi+çû	-	-a	ew biçûya
Eger/Xwezî/divê	bi+çû	-in	-a	em/hûn/ew biçûna

**Forma duyem:** Bi peyvên raweya xwestekî. (eger, xwezî, divê), koka lêkerê ya dema borî, koka dema borî ya lêkera "bûn"ê, qertafên kesane û qertafa çîrokiyê –a'yê çê dibe.

### Peyvên R. Xwestekî K. D. Borî Q. Kesane Q. Çîrokiyê Li gorî Cînavkan

Eger/Xwezî/divê	çû+bû	-im	-a	ez çûbûma
Eger/Xwezî/divê	çû+bû	-î	-a	tu çûbûya(çûbûyiya)
Eger/Xwezî/divê	çû+bû	-	-a	ew çûbûya
Eger/Xwezî/divê	çû+bû	-in	-a	em/hûn/ew çûbûna

### **Pevguherînên Wateyên Raweyan**

Carinan dem ji dêvla hev tîn bikaranîn. Wateya xwe didin hev.

**Nîşe:** Di lêkerên gerguhêz de pêveber ne li gorî kirdeyê; li gorî yekjimarî û pirjimariya bireserê qertafan distîne.

**Mînak:** Eger/xwezî/divê min nan bixwara. (yekjimar).  
Eger/xwezî/divê min nan bixwarina. (pirjimar).  
Eger/xwezî/divê min nan xwaribûya. (yekjimar)  
Eger/xwezî/divê min nan xwaribûna. (pirjimar)

**Mînak:** Sibê ez diçim gund.

(Hevok dema niha ye lê wate wateya dema bê ye)

Hemo diçe mala me, ez ne li mal im.

(Hevok dema niha ye, wateya dema boriya dûdar dide)

Ew ê ku tê wê mamosteyê me be

(dema bê wateya viyanîyê dide)

Sibê hûn ê karê xwe bikin.

(dema bê wateya fermanê dide]



## LÊKERA “BÛN”Ê

Hin peywirên lêkera “bûn”ê hene:

1- Weke lêkera bingehîn tê bikaranîn

**Mînak:** Ez bûm mamoste.  
Ez dibim mamoste.

2- Weke lêkera alîkar bi navan re tê bikaranîn û lêkerên hevedanî çê dike û cuda tê nivîsîn.

**Mînak:** Ez perîşan bûm.  
Ez ji bo te dîn bûm.

3- Tê dawîya navdêran û wan dike pêveber. Her tim ji navdêran cuda tê nivîsîn.

**Mînak:** Ez mamoste bûm.  
Ez mamoste me.

(Di dema niha de qertafên kesane li şûna “bûn”ê tên bikaranîn.)

Ev dar e.

Ew pirtûk bû.

4- Tê dawîya lêkerên ku tenê demek di wan de heye û wan ji aliyê deman de dike hevedanî.

**Mînak:** Ew duh hatibû.  
Ez bûbûm mamoste .

5- Lêkerên biwêjî çê dike.

**Mînak:** Keçikeke gelekî li hev bû  
Miroveke pir pozbilind bû.

6- Navdêrên hevedanî çê dike.

**Mînak:** Xweşikbûna te li ber çavan e  
Ev rezîlbûna me besî me ye.

## Lêkera Bûnê Li Gorî Raweyan

### L. bingehîn

#### **Dema Borî**

Ez bûm mamoste

#### **Dema niha**

Ez dibim mamoste

#### **Dema Bê**

Ez ê bibim mamoste

#### **Raweya şertî**

Eger ez bibim mamoste

#### **Raweya Vîyanî**

Divê ez bibim mamoste

#### **Raweya Fermanî**

Bibe mamoste

### L. Alîkar

Ez dîn bûm

Ez dîn dibim

Ez ê dîn bibim

Dîn bibe

### L. Alîkar ya Navdêran

Ez mamoste bûm

Ez mamoste me

Ez ê mamoste bim

Eger ez mamoste bim

Divê ez mamoste bim

Mamoste be

### **Raweya Xwestekî**

Xwezî bibim mamoste Xwezî dîn bibim Xwezî ez mamoste bim

### **Çirokiya D. Borî dû.**

Ez bûbûm mamoste Ez dîn bûbûm \_\_\_\_\_

### **Çirokiya D. Niha**

Ez dibûm mamoste Ez dîn dibûm \_\_\_\_\_

### **Çirokiya D. Bê**

Ez ê bibûma mamoste Ez ê dîn bibûma Ez ê mamoste bûma

### **Çirokiya Şertî**

Eger ez bibûma mamoste Eger ez dîn bibûma Eger ez mamoste bûma

### **Çirokiya Viyanî**

Divê ez bibûma mamoste Divê ez dîn bibûma Divê ez mamoste bûma

### **Çirokiya Xwestekî**

Xwezî ez bibûma mamoste Xwezî ez dîn bibûma Xwezî ez mamoste bûma

## **NEYÎNIYA LÊKERA “BÛN”Ê**

Neyîniya lêkera Bûn'ê bi qertafa neyînî ne'yê çê dibe, dema ev qertaf bên bikaranîn qertafên demî “dî” û “bî” radibin. Qertafa “ne” ji navdêran cuda; bi lêkeran bi hev ve tê nivîsîn. Di dema niha de qertafa neyinîyê dibe “na”.

### **Mînak:**

#### **Dema Borî**

Ez **nebûm** mamoste. Ez **ne** mamoste bûm.

#### **Dema Niha**

Ez **nabim** mamoste. Ez **ne** mamoste me.

#### **Dema bê**

Ez ê **nebim** mamoste Ez ê **ne** mamoste bim.

## **LÊKERA “KIRIN”Ê**

Çend rolên wê hene:

**1-** Weke lêkera bingehîn tê bikaranîn.

**Mînak:** Te got, min jî wanî kir.

Çi kir, te kir.

**2-** Weke lêkera alîkar tê bikaranîn.

**Mînak:** Te derd li min peyda kirin.

Tu, dilê min xweş dikî.

**3-** Bi lêkerên bingehîn re tê bikaranîn û wateya xwestin, niyet û nêzîkbûna kirin an bûyîne dide lêkera bingehîn.

**Mînak:** Ez dikim herim Mêrdînê.

Ez dikim nên bixwim.

4- Biwêjan çê dike.

**Mînak:** Te bi vê tevgerê rûyê me reş kir.  
Wan diranên xwe li me tûj kirine.

5- Navdêrên hevedanî pêk tîne

**Mînak:** Boyaxkirina malê pir zehmet bû.  
Serjêkirina mirîşkê ez êşandim.

## LI GORÎ SAZBÛNA XWE LÊKER

Lêker li gorî avaniya xwe dibin sê beş:

**A- LÊKERÊN XWERÛ:** Lêkerên ku qertafên çêker nestendine û ji hêmanekê pêk tên xwerû ne.

**Mînak:** Xwar(in), bir(in), mir(in), Hat(in) Ket(in) Çû(in)

**B- LÊKERÊN PÊKHATÎ:** Navdêrên ku qertafên çêker distînin û dibin lêker, lêkerên pêkhatî ne. Piraniya lêkerên pêkhatî ji kokên navdêran çê dibin.

**a. Bi parkîtan: -î, -iya, -a, -and, -t**

**Mînak:** Ken-î-(n), rev-î-(n), Bez-and(in), rev-and(in), kesax-t+(in), pelax-t+(in), kol-a-(n), pêç-a-n,

**b. Bi pêrkîtan:** Dema pêrkîtên mîna Ve-, da-, ra-, hil-, wer tên pêşiya lêkerên xwerû ev pêrkît lêkerên nuh çê dikin.

**Mînak:** Ve-xwar(in), da-ket(in), ve-ket(in), ra-ket(in), hil-kir(in), hil-ket(in), wer-kir(in), ve-got(in)

**c. Bi Pêrkît û bi parkîtan:** Carinan jî hem bi parkît û hem jî bi pêrkîtan çê dibin.

**Mînak:** Da-ger-and(in) hil-ber-and(in)Ve-ger-and(in)

**C- LÊKERÊN HEVEDANÎ:** Lêkerên ku ji du an jî zêdetêr hêmanan pêk hatine ne.

Navdêrek û lêkereke alîkar tên ba hev û lêkereke hevedanî çê dikin. Lêkerên alîkar jî ev in: bûn, kirin, ketin ,xistin, dan

**Mînak:** Germbûn, korkirin, nexweşketin, xeberdan, handan (teşwîqkirin), sorbûn, tûjkirin, derengketin, dûrxistin... (navdêr+lêkera alîkar)

Hinek lêker jî Bi alîkariya daçek û cînavkan çê dibin. Carinan navdêr jî lê zêde dibin.

**Mînak:** Lêgerîn, serjêkirin, lêxistin, birêketin, destpêkirin

## LÊKERÊN ALÎKAR

**A-** Lêkerên alîkar ên ku bi navdêran re tên bikaranîn: Ev cûre lêker bi navdêran re tên bikaranîn û lêkerên hevedanî çê dikin.

**Nîşe:** Ev lêker, dema ku weke pêveber bên bikaranîn divê ji hev cuda bên nivîsîn, dema ku di formên dançêker, tebatî û navdêrîn de bin bi hev ve tên nivîsîn.

**Mînak:** Min mirîşk ser jê kir.  
Min mirîşk da serjêkirin.  
Mirîşk hat serjêkirin.  
Serjêkirin ne karê min e.

**Mînak:** Sorkirin, nermbûn, xeberdan

**B-** Lêkerên alîkar ku bi lêkerên bingehîn re tên bikaranîn: Ev cûre lêker lêkera bingehîn ji hin aliyan ve temam û diyar dikin.

### 1- Lêkerên Têranyî

Di Kurmancî de sê heb lêker hene ku bi lêkerên bingehîn re tên bikaranîn û wateya têrîkirina teorîk (zanîn), psîkolojîk (wêrîn) û pratîkî (karîn) didin lêkerê. Ev lêker dişibin **model verb**'ên Îngilîzî; mîna Di hemû deman de nayên bikaranîn; di dema niha û bê de û di çîrokiya wan de tên kişandin.

**a. Zanîn:** Ev lêker wateya têrîkirina hêza zanebûnê ya ji bo lêkera bingehîn dide. Li gorî deman dema tê kişandin qertafên “di” û “bi” nastînin; lê qertafên kesane distînin.

	<u>Gerguhêz</u>	<u>Negerguhêz</u>
<b>Dema Niha</b>	Ez zanim bixwim	Ez zanim biçim
<b>Dema Bê</b>	Ez ê zanibim bixwim	Ez ê zanibim biçim
<b>Çîrokiya D. Niha</b>	Min zanîbû bixwara	Ez zanîbûm biçûma
<b>Çîrokiya D. Bê</b>	Min dê zanîbûya bixwara	Ez dê zanîbûma biçûma
<b>Raweya Şertî</b>	Eger ez zanibim bixwim	Eger ez zanibim biçim
<b>Raweya Bilanî</b>	Xwezî ez zanibim bixwim	Xwezî ez zanibim biçim
<b>Raweya Vyanî</b>	Divê ez zanibim bixwim	Divê ez zanibim biçim
<b>Raweya Fermanî</b>	Zanibe bixwe	Zanibe biçe

**Ç. R. Şertî** Eger min zanîbûya bixwara Eger ez zanîbûma biçûma

**Ç. R. Xwestekî** Xwezî min zanîbûya bixwara Xwezî ez zanîbûma biçûma

**Ç. R. Vyanî** Divê min zanîbûya bixwara Divê Ez zanîbûma biçûma

**b. Karîn:** Ev lêker, wateya têrîkirina hêza kirinê ya ji bo lêkera bingehîn dide. Li gorî deman dema tê kişandin qertafên “di” û “bi” nastînin; lê qertafên kesane distînin. Ji aliyê wateyê ve mîna “can”a Îngilîzî ye.

	<u>Gerguhêz</u>	<u>Negerguhêz</u>
<b>Dema Niha</b>	Ez karim bixwim	Ez karim biçim
<b>Dema Bê</b>	Ez ê karibim bixwim	Ez ê karibim biçim

<b>Çîrokiya D. Niha</b>	Min karîbû bixwara	Ez karîbûm biçûma
<b>Çîrokiya D. Bê</b>	Min karîbûya bixwara	Ez dê karîbûma biçûma

<b>Raweya Şertî</b>	Eger ez karibim bixwim	Eger ez karibim biçim
<b>Raweya Bilanî</b>	Xwezî ez karibim bixwim	Xwezî ez karibim biçim
<b>Raweya Viyanî</b>	Divê ez karibim bixwim	Divê ez karibim biçim
<b>Raweya Fermanî</b>	Karibe bixwe	Karibe biçe

**Ç. R. Şertî** Eger min karîbûya bixwara Eger ez karîbûma biçûma  
**Ç. R. Xwestekî** Xwezî min karîbûya bixwara Xwezî ez karîbûma biçûma  
**Ç. R. Viyanî** Divê min karîbûya biwxara Divê Ez karîbûma biçûma  
**c. Wêrîn** : Ev lêker wateya têrîkirina hêza cesaretê ji bo kirina lêkera bingehîn dide. Li gorî deman dema tê kişandin qertafên “dî” û “bî” nastînin; lê qertafên kesane distînin.

**Nîşe:** Lêkera “karîn” ji bo destûrxwestina kirin an bûyîna tiştekî jî tê bikaranîn û dibe hevoka pirsiyariyê. Di Îngilîzî de jî ev wateya wê heye. ( Can I go?)  
**Mînak:** Ez dikarim herim?

<b><u>Gerguhêz</u></b>	<b><u>Negerguhêz</u></b>	
<b>Dema Niha</b>	Ez wêrim bixwim	Ez wêrim biçim
<b>Dema Bê</b>	Ez ê wêribim bixwim	Ez ê wêribim biçim
<b>Çîrokiya D. Niha</b>	Min wêrîbû bixwara	Ez wêrîbûm biçûma
<b>Çîrokiya D. Bê</b>	Min wêrîbûya bixwara	Ez dê wêrîbûma biçûma

<b>Raweya Şertî</b>	Eger ez wêribim bixwim	Eger ez wêribim biçim
<b>Raweya Bilanî</b>	Xwezî ez wêribim bixwim	Xwezî ez wêribim biçim
<b>Raweya Viyanî</b>	Divê ez wêribim bixwim	Divê ez wêribim biçim
<b>Raweya Fermanî</b>	Wêribe bixwe	Wêribe biçe

**Ç. R. Şertî** Eger min wêrîbûya bixwara Eger ez wêrîbûma biçûma  
**Ç. R. Xwestekî** Xwezî min wêrîbûya bixwara Xwe ez wêrîbûma biçûma  
**Ç. R. Viyanî** Divê min wêrîbûya biwxara Divê ez wêrîbûma biçûma  
 Di dema borî de lêker gerguhêz be pêveber (lêkera bingehîn) li gorî bireserê qertafan digire û kirde divê di forma diyarbûyî (oblîk form) de be.

**Mînak:** Min zanîbû sêv bixwara (yekjimar)  
 Min zanîbû sêv bixwarina (pirjimar)  
 Min karîbû sêv bixwara (yekjimar)  
 Min karîbû sêv bixwarina (pirjimar)  
 Min wêrîbû sêv bixwara (yekjimar)  
 Min wêrîbû sêv bixwarina (pirjimar)

Di demên borî de lêkera bingehîn divê qertafa çîrokiyê –a'yê bistîne û koka dema borî bê bikaranîn.

**Mînak:** Ez zanîbûm biçim (çewt)  
Ez zanîbûm biçûm (çewt)  
Ez zanîbûm biçûma (rast)  
Ez karîbûm biçim (çewt)  
Ez karîbûm biçûm (çewt)  
Ez karîbûm biçûma (rast)  
Ez wêrîbûm biçim (çewt)  
Ez wêrîbûm biçûm (çewt)  
Ez wêrîbûm biçûma (rast)

**2- Lêkerên Din ên Alîkar:** Ev lêker jî bi lêkereke bingehîn re tên bikaranîn û ji hin aliyan ve bandorê li lêkera bingehîn dikin. Kirin, xwestin, dan, hatin

**Nîşe:** Lêkerên “karîn” û “zanîn” di formên neyîniyê de qertafa ni'yê distînin.

**Mînak:** Nizanim bixwim  
Nizanî biçî  
Nikarim bixwim  
Nikarî biçî

**Kirin:** Ev lêkeraya wateya nêzîkbûn û xwesteka kirin an bûyîne dide lêkera bingehîn.

**Mînak:** ez **dikim** bixwim  
ez **dikim** herim  
tu **dikî** çi bikî?

**Xwestin:** Ev lêker, wateya daxwaza bûyîn an kirina lêkera bingehîn dide.

**Mînak** Ez dixwazim bixwim.

**Hişyarî:** Di raweya çîrokî de hem “kirin” û hem jî lêkera bingehîn qertafa çîrokiyê –a'yê distîne û koka dema borî tê bikaranîn.

**Mînak:** Ez dikira biçim (çewt)  
Ez dikira biçûm (çewt)  
Ez dikira biçûma (rast)

Ez dixwazim herim.  
Tu dixwazî çi bikî?  
Ez dixwazim tu baş bibî.  
Min xwest tu baş bûbûya.  
Te xwest bibî çi ?

**Dan:** Ev lêker, bi lêkera bingehîn re tê bikaranîn û dançêkeriyê çê dike.

**Mînak:** Xanî da çêkirin.  
Nan da xwarin.  
Mêr da kuştin.

**Nîşe:** Lêkera 'xwestin' dema bi serê xwe be lêkera bingehîn e.

**Mînak:** Ez sê tiştan ji te dixwazim.

**Hat:** Ev lêker dema ku bi lêkera bingehîn re tê bikaranîn lêkerên tebatiyê (pasîf) çê dike.

**Mînak:** Ew hat kuştin  
Gund hat xerakirin.

### **LÊKERÊN BIWÊJÎ**

Ev lêker qalib in. Ji ber ku di biwêjan de tînan bikaranîn lêkerên biwêjî ne. Ji dudu an zêdetir hêmanan dikarin pêk bên.

**Mînak:** Guhdan, serhildan, bêhtengbûn, çavpêketin, eyar

**Nîşe:** Weke lêkera bingehîn jî tê bikaranîn

**Mînak:** Ew hat mala me.

nerm kirin, dest li piştê xistin, bêhna şîr ji dev hatin.

### **JÎ ALIYÊ RISTINA XWE VE LÊKER**

Di kurmançî de du kokên lêkeran hene; yek jê koka dema borî, ya din jî koka dema niha û bê ye. Ji ber ku piraniya lêkerên kurmançî jî navdêran çê bûne di navbera koka dema borî û dema niha û bê de pir guhertin çê nabin û kok xwe diparêzin. Ev lêker loma jî birist in; lê di lêkerên xwerû de koka dema borî û koka dema niha û bê pir diguherin û kok xwe neparêzin. Loma jî ev lêker bêrist in.

**a. Lêkerên Birist:** Dema di navbera koka dema borî û ya niha û bê de di koka lêkerê de guhertin çê nebe lêker birist e.

<b><u>Koka lêkerê</u></b>	<b><u>Lêker</u></b>	<b><u>Koka Dema Borî</u></b>	<b><u>Koka D. Niha û Bê</u></b>
Bez	bezîn	bez -î	bez
Ken	kenîn	ken -î	ken
Ger	gerîn	ger -î	ger
<b><u>Koka lêkerê</u></b>	<b><u>Lêker</u></b>	<b><u>Koka D. Borî</u></b>	<b><u>Koka D. Niha û Bê</u></b>
Kut	kutan	kut-a	kut
Kol	kolan	kol-a	kol
Çêr	çêran	çêr-a	çêr

<u>Koka lêkerê</u>	<u>Lêker</u>	<u>Koka D. Borî</u>	<u>Koka D. Niha û Bê</u>
Bez	bezandin	bez-and	bezîn
Kiş	kişandin	kiş-and	kişîn
Ger	gerandin	ger-and	gerîn

<u>Koka lêkerê</u>	<u>Lêker</u>	<u>Koka Dema Borî</u>	<u>Koka Dema Niha û Bê</u>
Ajo	ajotin	ajo-t	ajo
Bihîs	bihîstin	bihîs-t	bihîs
Guher	guhertin	guher-t	guher

**b. Lêkerên Bêrist:** Du qategoriyên lêkerên bêrist hene :

-Eger di navbera koka dema borî û ya niha û bê de di koka lêkerê de guhertin çê bibe lêker bêrist e. Ji xeynê lêkera “mirin”ê hemû lêkerên xwerû bêristin. (mirin, dimirin, bimirin)

<u>Koka lêkerê</u>	<u>Lêker</u>	<u>Koka Dema Borî</u>	<u>Koka Dema Niha û Bê</u>
Bir	Birin	bir	b
Da	Dayîn	da	d
Hat	Hatin	hat	hê
Xist	xistin	xist	x
Bû	bûn	bû	b
Xwar	xwarin	xwar	xw
Ma	man (mandin)	ma (mand)	mîn
Kir	kirin	kir	k

**2-** Hinek lêker di Kurmancî de hene ku di hinik deman de têt bikaranîn lê di hinik deman de li şûna wê lêkereke din têt bikaranîn.

<u>Lêker</u>	<u>Koka D. Borî</u>	<u>Koka D. Niha û Bê</u>	<u>R. Fermanî</u>
Anîn	anî	nayê bikaranîn	nayê bikaranîn
Hiştin	hişt	nayê bikaranîn	nayê bikaranîn
Şikestin	şikest	nayê bikaranîn	nayê bikaranîn
Werîn	nayê bikaranîn	nayê bikaranîn	were
Herîn	nayê bikaranîn	her	here

Li şûna van lêkeran formên van lêkerên din têt bikaranîn. Ev lêkerên din jî lêkerên cuda; lê hemwate ne.

Anîn	→	înan
Hiştin	→	hêlan
Werîn	→	hatin
Şikestin	→	şikîn/şikiyar
Herîn	→	çûn



Kişandina Lêkerêk Gerguhêz û Yek Negerguhêz Li Gorî Dem û Kesên

Lêker	Kes	Dema Boriya Têdeyî	Dema Boriya Dûdar	Dema Niha	Dema Bê	Cîrokiya Dema Boriya Dûdar	Cîrokiya Dema Niha	Cîrokiya Dema bê
(Lêkera Negerguhêz) Ketin	Kesê 1.Y.	Ez ketim	Ez dikevîm	Ez dê bikevim	Ez ketibûm	Tu ketibûyî	Tu diketim	Ez dê biketima/ketibûma
	Kesê 2.Y.	Tu ketî	Tu dikeví	Tu dê bikeví	Tu ketibûyî	Ew ketibû	Tu diketî	Tu dê biketiya/ketibûya
	Kesê 3.Y.	Ew ket	Ew dikeve	Ew dê bikeve	Ew ketibû	Em ketibûn	Ew diket	Ew dê biketa/ketibûya
	Kêsê 1.P.	Em ketin	Em dikevin	Em dê bikevin	Hûn ketibûn	Hûn diketin	Em diketin	Em dê biketina/ketibûna
	Kesê 2.P.	Hûn ketin	Hûn dikevin	Hûn dê bikevin	Hûn ketibûn	Hûn diketin	Hûn diketin	Hûn dê biketina/ketibûna
Kesê 3.P.	Ew ketin	Ew dikevin	Ew dê bikevin	Ew ketibûn	Ew diketin	Ew diketin	Ew dê biketina/ketibûna	
Ketin (Forma Neyînî)	Kesê 1.Y.	Ez neketim	Ez nakevîm	Ez dê nekevim	Ez neketibûm	Tu neketibûyî	Ez nediketim	Ez dê neketima/neketibûma
	Kesê 2.Y.	Tu neketî	Tu nakeví	Tu dê nekeví	Tu neketibûyî	Ew neketibû	Tu nediketî	Tu dê neketiya/neketibûya
	Kesê 3.Y.	Ew neket	Ew nakeve	Ew dê nekeve	Ew neketibû	Em neketibûn	Ew nediket	Ew dê neketa/neketibûya
	Kêsê 1.P.	Em neketin	Em nakevîn	Em dê nekevîn	Hûn neketibûn	Hûn nediketin	Em nediketin	Em dê neketina/neketibûna
	Kesê 2.P.	Hûn neketin	Hûn nakevîn	Hûn dê nekevîn	Hûn neketibûn	Hûn nediketin	Hûn nediketin	Hûn dê neketina/neketibûna
Kesê 3.P.	Ew neketin	Ew nakevîn	Ew dê nekevîn	Ew neketibûn	Ew nediketin	Ew nediketin	Ew dê neketina/neketibûna	
(Lêkera gerguhêz) Xwarin	Kesê 1.Y.	Min xwar	Ez dixwîm	Ez dê bixwîm	Min xwaribû	Te xwaribû	Min dixwar	Min dê bixwara/xwaribûya
	Kesê 2.Y.	Te xwar	Tu dixwî	Tu dê bixwî	Te xwaribû	Wî/wê xwaribû	Te dixwar	Te dê bixwara / xwaribûya
	Kesê 3.Y.	Wî/wê xwar	Ew dixwe	Ew dê bixwe	Wî/wê xwaribû	Me xwaribû	Wî/wê dixwar	wî/wê dê bixwara/xwaribûya
	Kêsê 1.P.	Me xwar	Em dixwîn	Em dê bixwîn	Me xwaribû	We xwaribû	Me dixwar	Me dê bixwara/xwaribûya
	Kesê 2.P.	Wê xwar	Hûn dixwîn	Hûn dê bixwîn	We xwaribû	Wan xwaribû	We dixwar	We dê bixwara/xwaribûya
Kesê 3.P.	Wan xwar	Ew dixwîn	Ew dê bixwîn	Wan xwaribû	Wan xwaribû	Wan dixwar	Wan dê bixwara/xwaribûya	

Kişandinina Hin Lêkeran Li Gorî Dem û Kesan

Kes	Lêker	Dema Boriya Têdeyî	Dema Boriya Dûdar	Dema Niha	Dema Bé	Çirokiya Dema Boriya Dûdar	Çirokiya Dema Niha	Çirokiya Dema bê
Ez	Reviyan	Koka dema bori + qertafên kesane + e	Koka dema bori + bûn + qertafên kes	Dê/wê/ê +bi+koka dema niha+qert. kes.	Ez ê birevîm Ez ê bêim Ez ê bimînim Ez ê bibim Ez ê bikevim Ez ê bixwîm Ez ê bifiroşim Ez ê bikujim Ez ê biparêzim Ez ê bimeşînim Ez ê bikelînim Ez ê bipirsîm Ez ê bikolîm Ez ê bidîm	Ez reviyabûm Ez hatibûm Ez mabûm Ez bûbûm Ez ketibûm Min xwaribû Min firotibû Min kuştibû Min parastibû Min meşandibû Min kelandibû Min pirsibû Min kolabû Min dabû	Ez direviyam Ez dihatim Ez dimam Ez dibûm Ez diketim Min dixwar Min difiro Min dikuşt Min diparast Min dimeşand Min dikeland Min dipirsî Min dikola Min dida	Ez ê bireviyama- reviyabûma Ez ê bihatima- hatibûma Ez ê bimama- mabûma Ez ê bibûma- bûbûma Ez ê biketima- ketibûma Min ê bixwara- xwaribûya Min ê bifirota- firotibûya Min ê bikuşt- kuştibûya Min ê biparasta- parastibûya Min ê bimeşanda- meşandibûya Min ê bikelanda- kelandibûya Min ê bipirsîya- pirsibûya Min ê bikolaya- kolabûya Min ê bidaya- dabûya
	Hatîn							
	Man							
	Bûn							
	Ketin							
	Xwarin							
	Firotin							
	Kuştin							
	Parastin							
	Meşandin							
Kelandin								
Pirsîn								
Kolan								
Dan								
Tu	Reviyan	Tu reviyayî	Tu reviya(yî)ye	Tu direvî Tu têyî Tu dîminî Tu dibî Tu dikewî Tu dixwarî Tu difiroşî Tu dikuştî Tu diparastî Tu dimeşandî Tu dikelandî Tu dipirsî Tu dikola Tu da	Tu dê birevî Tu dê bêyî Tu dê birimî Tu dê bibî Tu dê bikevî Tu dê bixwî Tu dê bifiroşî Tu dê bikujî Tu dê biparêzî Tu dê bimeşînî Tu dê bikelînî Tu dê bipirsî Tu dê bikolî Tu dê bidî	Tu reviyabû(yî) Tu hatibûyî Tu mabûyî Tu bûbûyî Tu ketibûyî Te xwaribû Te firotibû Te kuştibû Te parastibû Te meşandibû Te kelandibû Te pirsibû Te dikola Te dabû	Tu direviya(yî) Tu dihatî Tu dimayî Tu dibûyî Tu diketî Te dixwar Te difiro Te dikuşt Te diparast Te dimeşand Te dikeland Te dipirsî Te dikola Te dida	Tu dê bireviya(yî)ya- reviyabûya Tu dê bihatiya- hatibûya Tu dê bimayîya- mabûya Tu dê bibûyîya- bûbûya Tu dê biketîya- ketibûya Te dê bixwara- xwaribûya Te dê bifirota- firotibûya Te dê biparasta- parastibûya Te dê bimeşanda- meşandibûya Te dê bikelanda- kelandibûya Te dê bipirsîya- pirsibûya Te dê bikolaya- kolabûya Te dê bidaya- dabûya
	Hatîn							
	Man							
	Bûn							
	Ketin							
	Xwarin							
	Firotin							
	Kuştin							
	Parastin							
	Meşandin							
Kelandin								
Pirsîn								
Kolan								
Dan								
								Nîşe: Di lêkerên negerguhêz de qertafa kesê duyemîn -î berî -a ye tê û dikeve

Ew	Reviyan Hatın Man Bün Ketin Xwarin Firotin Kuştin Parastin Meşandin Kelandin Pirsın Kolan Dan	Ew reviyaye Ew hatiye Ew maye Ew büye Ew ketiye Wf/wé xwariye Wf/wé firotiye Wf/wé kuştıye Wf/wé parastıye Wf/wé meşandıye Wf/wé kelandıye Wf/wé pirsıye Wf/wé kolaye Wf/wé daye	Ew direve Ew té Ew dimine Ew dibe Ew dikve Ew dixwe Ew difroşe Ew dikuje Ew diparêze Ew dimeşşine Ew dikelîne Ew dipirse Ew dikole Ew dide	Ew dê bireve Ew dê bê Ew dê bimîne Ew dê bibe Ew dê bikeve Ew dê bixwe Ew dê bifroşe Ew dê bikuje Ew dê biparêze Ew dê bimeşşîne Ew dê bikelîne Ew dê bipirse Ew dê bikole Ew dê bide	Ew reviyabû Ew hatibû Ew mabû Ew bûbû Ew ketibû Wf/wé xwaribû Wf/wé firotibû Wf/wé kuştibû Wf/wé parastibû Wf/wé meşandibû Wf/wé kelandibû Wf/wé pirsibû Wf/wé kolabû Wf/wé dabû	Ew direviya Ew dihat Ew dima Ew dibû Ew diket Wf/wé dixwar Wf/wé difrot Wf/wé dikuşt Wf/wé diparast Wf/wé dimeşand Wf/wé dikeland Wf/wé dipirsî Wf/wé dikola Wf/wé dida	Ew dê bireviyaya-reviyabûya Ew dê bihata-hatibûya Ew dê bimaya- mabûya Ew dê bibûya- bûbûya Ew dê biketa- ketibûya Wf/wé dê bixwara- xwaribûya Wf/wé dê bifirota- firotibûya Wf/wé dê bikuşt- kuştibûya Wf/wé dê biparasta- parastibûya Wf/wé dê bimeşanda- meşandibûya Wf/wé dê bikelanda- kelandibûya Wf/wé dê bipirsıya- pirsibûya Wf/wé dê bikolaya- kolabûya Wf/wé dê bidaya- dabûya
Em	Reviyan Hatın Man Bün Ketin Xwarin Firotin Kuştin Parastin Meşandin Kelandin Pirsın Kolan Dan	Em reviyane Em hatine Em mane Em büne Em ketine Me xwariye Me firotiye Me kuştıye Me parastıye Me meşandıye Me kelandıye Me pirsıye Me kolaye Me daye	Em direvin Em tén Em diminin Em dibin Em dikvein Em dixwin Em difroşin Em dikujin Em diparêzin Em dimeşşinin Em dikelînin Em dipirsın Em dikolin Em didin	Em dê birevin Em dê bèn Em dê bimînin Em dê bibin Em dê bikevin Em dê bixwin Em dê bifroşin Em dê bikujin Em dê biparêzin Em dê bimeşşinin Em dê bikelînin Em dê bipirsın Em dê bikolin Em dê bidin	Em reviyabûn Em hatibûn Em mabûn Em bûbûn Em ketibûn Me xwaribû Me firotibû Me kuştibû Me parastibû Me meşandibû Me kelandibû Me pirsibû Me kolabû Me dabû	Em direviyan Em dihatin Em diman Em dibûn Em diketin Me dixwar Me difrot Me dikuşt Me diparast Me dimeşand Me dikeland Me dipirsî Me dikola Me dida	Em dê bireviyana-reviyabûya Em dê bihatina-hatibûya Em dê bimana- mabûya Em dê bibûna- bûbûya Em dê biketina- ketibûya Me dê bixwara- xwaribûya Me dê bifirota- firotibûya Me dê bikuşt- kuştibûya Me dê biparasta- parastibûya Me dê bimeşanda- meşandibûya Me dê bikelanda- kelandibûya Me dê bipirsıya- pirsibûya Me dê bikolaya- kolabûya Me dê bidaya- dabûya
Me	Reviyan Hatın Man Bün Ketin Xwarin Firotin Kuştin Parastin Meşandin Kelandin Pirsın Kolan Dan	Me reviyane Me hatine Me mane Me büne Me ketine Me xwariye Me firotiye Me kuştıye Me parastıye Me meşandıye Me kelandıye Me pirsıye Me kolaye Me daye	Me direvin Me tén Me diminin Me dibin Me dikvein Me dixwin Me difroşin Me dikujin Me diparêzin Me dimeşşinin Me dikelînin Me dipirsın Me dikolin Me didin	Me dê birevin Me dê bèn Me dê bimînin Me dê bibin Me dê bikevin Me dê bixwin Me dê bifroşin Me dê bikujin Me dê biparêzin Me dê bimeşşinin Me dê bikelînin Me dê bipirsın Me dê bikolin Me dê bidin	Me reviyabûn Me hatibûn Me mabûn Me bûbûn Me ketibûn Me xwaribû Me firotibû Me kuştibû Me parastibû Me meşandibû Me kelandibû Me pirsibû Me kolabû Me dabû	Me direviyan Me dihatin Me diman Me dibûn Me diketin Me dixwar Me difrot Me dikuşt Me diparast Me dimeşand Me dikeland Me dipirsî Me dikola Me dida	Me dê bireviyana-reviyabûya Me dê bihatina-hatibûya Me dê bimana- mabûya Me dê bibûna- bûbûya Me dê biketina- ketibûya Me dê bixwara- xwaribûya Me dê bifirota- firotibûya Me dê bikuşt- kuştibûya Me dê biparasta- parastibûya Me dê bimeşanda- meşandibûya Me dê bikelanda- kelandibûya Me dê bipirsıya- pirsibûya Me dê bikolaya- kolabûya Me dê bidaya- dabûya

Nîşe:Lêker li gorî cînavkên "em/me, hûn/we, ew/wan" bi heman awayî çê dibe û heman qertafî disîfinin loma di tabloyê de "hûn/we, ew/wan" nehatiye dayîn.

Li gori dem û kesan kişandina lêkerêke bipêkît

	Dema Têdeyi	Dema Boriya	Dema Boriya Dûdar	Dema Niha	Dema Bê	Çirokiya Dema Boriya Dûdar	Çirokiya Dema Niha.	Çirokiya Dema Bê
<b>Lêker</b>	<b>Kes</b>	Koka dema borî	Koka dema borî + e/ye	Pêkît+di+koka dema niha + qertafên kesane	Dê/lêwê +bi+koka niha+ qertafên kesane	Koka dema borî+ bûn	Pêkît+di+koka dema borî	Form1.koka dema borî+a Form2.Koka dema borî+bûn+a
(Lêkera pêkhatî) vexwarin	Kesê 1.Y.	Min vexwar	Min vexwariye	Ez vedixwim	Ez dê vexwim	Min vexwaribû	Min vedixwar	Min dê vexwara/vexwaribûya
	Kesê 2.Y.	Te vexwar	Te vexwariye	Tu vedixwî	Tu dê vexwî	Te vexwaribû	Te vedixwar	Te dê vexwara / vexwaribûya
	Kesê 3.Y.	Wî/lwê vexwar	wî/lwê vexwariye	Ew vedixwe	Ew dê vexwe	Wî/lwê vexwaribû	Wî/lwê vedixwar	wî/lwê dê vexwara/vexwaribûya
	Kesê 1.P.	Me vexwar	Me vexwariye	Em vedixwin	Em dê vexwin	Me vexwaribû	Me vedixwar	Me dê vexwara/vexwaribûya
	Kesê 2.P.	We vexwar	We vexwariye	Hûn vedixwin	Hûn dê vexwin	We vexwaribû	We vedixwar	We dê vexwara/vexwaribûya
	Kesê 3.P.	Wan vexwar	Wan vexwariye	Ew vedixwin	Ew dê vexwin	Wan vexwaribû	Wan vedixwar	Wan dê vexwara/vexwaribûya
<b>Lêker</b>	<b>Kes</b>	Dema Boriya Têdeyi	Dema Boriya Dûdar	Dema Niha	Dema Bê	Çirokiya Dema Boriya Dûdar	Çirokiya Dema Niha	Çirokiya Dema Bê
(Lêkera pêkhatî) Forma neynî vexwarin	Kes	pêkît+qertafa neynî+koka dema borî	koka dema borî + e/ye	pêkît+qertafa neynî(na)+koka dema niha+ qertafên kesane	Dê/lêwê pêkît+qr.neynî+koka dema niha+qert.kesane	Pêkît+qertafa neynî+ koka dema borî+ bûn	Pêkît+qertafa neynî+di+koka dema borî	Form1.pêkît+qertafa dema borî+a Form2.pêkît+qertafa dema borî+bûn+a
	Kesê 1.Y.	Min venexwar	Min venexwariye	Ez venaxwim	Ez dê venexwim	Min venexwaribû	Min venedixwar	Min dê venexwara/venexwaribûya
	Kesê 2.Y.	Te venexwar	Te venexwariye	Tu venaxwî	Tu dê venaxwî	Te venexwaribû	Te venedixwar	Te dê venexwara / venexwaribûya
	Kesê 3.Y.	Wî/lwê venexwar	Wî/lwê venexwariye	Ew venaxwe	Ew dê venexwe	Wî/lwê venexwaribû	Wî/lwê venedixwar	Wî/lwê dê venexwara/venexwaribûya
	Kesê 1.P.	Me venexwar	Me venexwariye	Em venaxwin	Em dê venaxwin	Me venexwaribû	Me venedixwar	Me dê venexwara/venexwaribûya
	Kesê 2.P.	We venexwar	We venexwariye	Hûn venaxwin	Hûn dê venaxwin	We venexwaribû	We venedixwar	We dê venexwara/venexwaribûya
Kesê 3.P.	Wan venexwar	Wan venexwariye	Ew venaxwin	Ew dê venaxwin	Wan venexwaribû	Wan vedixwar	Wan dê venexwara/venexwaribûya	

# AVANIYA LÊKERAN

- Avaniya Lêkeran
- Li Gorî Kirdeyê
  - Lêkerên Tebat
  - Lêkerên Lebat
  - Lêkerên Xweyîni
  - Lêkerên Hevîni
- Li Gorî Bireserê
  - Lêkerên Gerguhêz
  - Lêkerên Negerguhêz
  - Lêkerên Dançêker

## AVANIYA LÊKERAN

Taybetiyên lêkeran yên di warê têkiliya kirde û bireserê de, avaniya lêkeran pêk tînin. Avaniya lêkeran li gorî kirde û bireserê tê ravekirin.

### A- LI GORÎ KIRDEYÊ LÊKER

**a. Lêkerên Lebat :** Di van lêkeran de kar ji aliyê kê ve tê kirin diyar e; kirde bi awayekî eşkere diyar e.

**Mînak:** Eyşeyê govend digerland. (kê govend digerland diyar e.)  
Ew nanê tenûrê dixwe. (kî nanê tenûrê dixwe diyar e)

**b. Lêkerên Tebat:** Ev lêker bi alîkariya lêkera alîkar 'hatin'ê çê dibin. Kar ji aliyê kê tê kirin ne diyar e. "Hat" berî lêkera bingehîn tê û qertafên demê û yên kesan digire. Lêkera bingehîn qertafên demê û yên kesane nagirin û di forma raderî de ne.

**Mînak:** Govend **hat gerandin** (kê govend gerandiyê ne diyar e.)  
Nanê tenûrê **hat xwarin**. (kê nanê tenûre xwariyê ne diyar e)

**Nîşe 1:** Ji bo ku lêkerên tebatî bên çêkirin divê lêker gerguhêz bin. Çê nabe ku 'hatin' berî lêkerên negerguhêz bîn.

**Mînak:** Hat revîn (çewt)  
Hat çûyîn (çewt)  
Hat mirin (çewt)

#### **Ji forma gerguhêz, tebatî**

Hat pirsîn      hat jiyîn,      hat axivîn,

#### **Ji forma dançêker, tebatî:**

Hat pirsandin      hat jiyandin      hat axivandin

**Nîşe 2:** Gelek caran ji dêvla ku forma gerguhêz û tebatî bê bikaranîn; forma wê ya dançêker tê bikaranîn. Ev çewtî pir tê kirin. Wateya "hat pirsîn" cuda ye, wateya "Hat pirsandin" cuda ye. Divê li şûna hev neyên bikaranîn.

**c. Lêkerên Xweyînî:** Dema cînavka 'xwe' bi lêkerên gerguhêz re bê bikaranîn û karê ku tê kirin li kirdeyê vegeŕîne dibe lêkera xweyînî.

**Mînak:** Rojê hezar carî **xwe** dikujim      Tu çima **xwe** aciz dikî? Di wê de **xwe** dibînim.

**d. Lêkerên Hevînî:** Lêkerên gerguhêz dema ku bi cînavka "hev"ê re tînin bikaranîn wateya hevîniyê didin. Karek ji aliyê gelek kesan ve bi hev re û li beramberî hev tê kirin.

**Mînak:** Em ji hev re nameyan dişînin.  
Me bi hev re xwar.

## B- LI GORÎ BIRESERÊ LÊKER

**a- Lêkerên Gerguhêz** :Lêkerên ku dikarin bireserê bistînin gerguhêz in. Piraniya lêkerên gerguhêz bi qertafa lêkerçêker –and’ê tîn çêkirin.(di dema niha û bê de bi qertafa –în’ê çê dibe.)

**Mînak:** Min ew kenand. Ez wî dikeninim.  
Te ez bezandim. Tu min dibezinî.  
Ez te dibînim. Min nivîsî.

**b. Lêkerên Negerguhêz:** Lêkerên ku nikarin bireserê bigirin negerguhêz in. Piraniya lêkerên negerguhêz bi qertafa –î’yê çê dibin negerguhêz in.

**Mînak:** Ez keniyam (ez kenîm) ez kelijîm  
Ez reviyam (ez revîm) ez bêhnijîm

**Nîşe:** Hin lêkerên ku bi qertafa –î’yê çê dibin, gerguhêz in: pirsîn, kolîn, nivîsîn...

**c. Lêkerên Dançêker:** Di dançêkeriyê de kar ji aliyê kirdeyê ve nayê kirin. Kirde kar bi hin kesên din dide kirin. Dançêkerî bi du awayan çê dibe;

Bi lêkera alîkar “dan”ê çê dibe: Lêkera alîkar “dan” tê beriya lêkerên gerguhêz û dançêkeriyê çê dike.

**Mînak:** Min da pirsîn. Min da kolan. Min da xwarin.

Bi qertafa lêkerçêker -and’ê çê dibe: Qertafa lêkerçêker –and piranî lêkerên gerguhêz çê dike. Lê di hin lêkeran de dançêkeriyê çê dike. Ev lêker çend heb tenê ne.

**Mînak:** Min pirsand. Min nivîsand. Min axivand. Min jiyand.

**Nîşe:** Lêkera ku bi and’ê bûbe dançêker dema ku lêkera “dan” jî bistîne gerguhêziya wê xurtir dibe

**Mînak:** Min da pirsandin Min da kolandin Min da axivandin,  
Min da jiyandin.

## LÊKERNAV

- Lêkernav
- Lêkernava Navdêrîn
- Lêkernava Rengdêrîn
- Lêkernava Hokerîn



## LÊKERNAV

Lêkernav ew peyv in ku di eslê xwe de lêker in lê di nava hevokê de dibin navdêr, rengdêr û hoker. Dişibe lêkerê lê ne lêker e, êdî bûye navdêr. Lêkernav weke lêkerên din tên kişandin û di nava hevokê de ne di peywira lêkerê de ne êdî. Lêkernav dibin hêmanên hevokê.

### Lêker

Wan nan xwar

Kirde (lêkernava rengdêrîn)

### Lêkernav

Keçika ku nan xwar, hat

Kurik mezin bûn

Kirde (lêkernava navdêrîn)

Mezinbûn di mejî de ye.

Ew duh hat.

Hoker (lêkernava hokerîn)

Dema ku ew duh hat ez ne li mal bûm.

Sê cure lêkernav hene:

### **1- Lêkernava Navdêrîn** ( navê lêkerê- raderî)

Dema ku em raderê bi koka lêkerê ve kin lêkernava navdêrîn çê dibe.

**Mînak:** Gerbûn zivistanî girîng e.(kirde)

Kenîn tiştêkî xweş e.(kirde)

Ji meşîna te hez dikim.(bireser)

Me dev ji kolandinê ber da. (bireser)

**Nîşe:** Ji ber ku di forma navdêran de ne mîna navdêran dikarin ravekan çê kin û bi daçekan re bêb bikaranîn.

**Mînak:** Gerbûna min

Di kenîna te de qehr heye. (têrker)

**Hişyarî:** Hinek lêkernavên navdêrî weke lêkernav jî tên bikaranîn û carinan bi temamî dibin navdêr û êdî ne lêkernav in.

**Mînak:** Xwarin amade ye yan na?

Berî her tiştî gotin hebû.

## 2- Lêkernava Rengdêrîn

Lêker dema ku di nava ravekên rengdêrîn de hatibe bikaranîn lêkernava rengdêrîn çê dibe. Bi van awayan çê dibe.

Lêker di raveka rengdêrîn de tê bikaranîn. Gihaneka “ku”yê jî alîkariyê dike.

**Mînak:** Nanê ku sar bûye nayê xwarin. (kirde)  
Ez hevalê ku hat, baş nabînim. (bireser)  
Mirovê ku em wî nas dikin nehatiye. (kirde)  
Keçika ku zanîngehê dixwîne, ev e. (kirde)

Lêker di nava raveka rengdêrîn de tê bikaranîn û koka dema borî qertafa –î’yê distîne.

**Mînak:** Nanê şewitî, ne xweş e. (kirde)  
Ez cilên şûştî dixim selikê. (bireser)

**Nîşe:** Dibe ku gihaneka “ku” jî bê bikaranîn.

**Mînak:** Dendikên ku qelandî bin, xweş in.  
Cilên ku şûştî bin paqij in.

## 3- Lêkernava Hokerî

Lêker di peywira hokerê de bê bikaranîn dibe lêkernava hokerî. Divê lêkernava hokerî bersivê bide pirsên “kengî” û “çawa”.

**Mînak:**  
Dema ku ji dayik bû, pir giriyabû. (hoker).  
Roja ku bavê min ji hecê hat, ez ne li malê bûm. (hoker).  
Her ku tu bikenî, tu yê baş bibî. (hoker).

Carinan lêker bi neyiniya xwe re dubare dibe û dibe lêkernava hokerî

**Mînak:** Hat nehat li me xist. (hoker).  
Kir û nekir nebû. (hoker).  
Nan xwar nexwar çû. (hoker).  
Me bûyer bihîst nebihîst em çûn. (hoker).

## HÊMANÊN HEVOKÊ

- Hevok
- Sazbûna Hevokan
- Pêveber
- Kirde
  - Kirdeya Bireserî
  - Kirdeya Nixumî
- Têkiliya Kirde û Pêveberê
- Bireser
- Têrkera Cih û Bergehê
- Têrkera Hokerî

## HÊMANÊN HEVOKÊ

### HEVOK:

Hevok ramanekê, hestekê, bûyerekê, rewşekê bi bêjeyan di nava forma wate û mantixê de ji me re vedibêje. Divê di hevokê de darazek hebe, hevok bê daraz nabe. Daraz di pêveberan de heye û pêveber an lêker e an jî navdêr e û bi alîkariya lêkereke alîkar bûye pêveber.

### Mînak:

Ez nên dixwim. (lêkera xwarin hatiye kişandin)

Newxeş im. ( navdêr bi alîkariya lêkera bûn'ê bûye pêveber)

Ji bona ku di hevokê de darazek hebe divê du hêmanên bingehîn di hevokê de hebin (kirde, pêveber) wekî din hin hêmanên alîkar jî dikarin têkevin hevokê.

**Hêmanên bingehîn:** Pêveber, kirde

**Hêmanên Alîkar:** Bireser, têrker, hoker

Pêveber û kirde hêmanên bingehîn ên hevokê ne; lê pêveber ji hemûyan girîngtir e. Pêveber tune be hevok saz nabe. Bireser û têrker jî hêmanên alîkar in. Bireser dema ku bandora kirdeyê li ser tiştê be di lêkerên gerguhêz de heye. Têrker jî weke ji navê xwe diyar e, ji hin aliyên ve hevokê têr dike û temam dike.

### Sazbûna Hevokan

Du qalibên bingehîn ên sentaksa Kurmancî hene:

**1-** Di piraniya hevokên Kurmancî de kirde di serî de û pêveber jî di dawiyê de ye. Li gorî derbandina hevokê dibe ku hêmanên alîkar têrker, bireser û hoker cih biguherînin.

**Kirde+(têrker-bireser-hoker)pêveber**

**Mînak:** Ez li malê taştê saet li heftan dixwim.

(kirde+têrker+bireser+hoker+pêveber)

Ez taştê saet li heftan li malê dixwim.

(kirde+bireser+hoker+têrker+pêveber)

Ez saet li heftan li malê taştê dixwim.

(kirde+hoker+têrker+bireser+pêveber)

**Nîşe:** Dema ku em bixwazin derb li kirdeyê be, em kirdeyê berî pêveberê tînin.

**Mînak:** Saet li heftan li malê taştê ez dixwim.

2- Hevokên ku lêkerên wateya berbiçûnî. (datîf) di wan de hebin kirde di serî de ye û pêveber jî berî têrkerê tê. Jixwe ev hevok bê bireser in.

**Kirde+pêveber+têrker**

**Mînak:** Ez diçim male.

Tu hildikişî çiyê.

**Nîşe:** Dema ku hoker têkeve nava vê hevokê berî pêveberê tê.

**Mînak:** Ez duh diçûm male.

**Pêveber**

Pêveber kar, kirin, bûyer, daxwaz, raman û darazê bi demê û kesan têkil dike. Hêmana herî girîng a hevokê pêveber e. Pirsên hêmanên din ji pêveberê tên kirin lê ji bona ku em pêveberê bibînin em pirsekê nakin.

**Hin Taybetiyên Pêveberê**

Pêveber dibe ku li dawiyê, dibe ku li nava hevokê û dibe ku li serê hevokê be.

**Mînak:** Ew duh çû.

Ew çû malê.

Çû dibistanê.

Pêveber an lêkera kişandî ye yan jî navdêrek e ku bi alîkariya lêkera bûn'ê bûye pêveber.

**Mînak:** Azadî xebatê dixwaze. (lêkera kişandî).

Em îro azad in. (navdêr bi alîkariya lêkera "bûn"ê bûye pêveber).

Pêveber dibe ku ji peyvekê yan jî ji çend peyvan pêk hatibe. Divê mirov ji bîr neke pêveber dema ku qalib be nayê parçekirin. (ravek, lêkerên hevedanî, lêkerên biwêjî qalib in).

**Mînak:** Azad pirtûkê dixwîne ( peyvek tenê).

Hogir miroveke genc e

(ravek bûye pêveber divê neyê parçekirin).

Rojda nexweş ketiye (lêkereke hevedanî).

Me li ber xwe da (lêkereke biwêjî).

Di hevokên dirêj de carinan pêveber hevpar in.

**Mînak:** Ne min û ne jî wî xwar ( ne min xwar û ne jî wî xwar).

Ew jî, ez jî, em dixwînin (ew jî dixwîne ez jî dixwînim).

**Nîşe:** Hinek hevok hene ku ji aliyê sazûnê ve kêm in. Di wan de ji dêvla temamkirina hevokê hêmanek tenê tê gotin. Yanî em di serê xwe de wateyê temam dikin.

**Mînak:** - Te nan xwar?  
- Belê. (min xwar)

Ne bi wê hêkê, ne jî bi wê qidqidikê. (pêveber nehatiye gotin)

### **Kirde**

Ew kes an tiştê ku kar, tevger, kirin, bûyîna lêkerê pêk tîne kirde ye. Di hevokên lêkerî de kirde kar, tevger, bûyîn û çalakiyê pêk tîne. Di hevokên navdêrî de kirde dibe mijara hevokê. Ji bona ku em kirdeyê bibînin divê em pirsên weke “kî-kê” û “çî” ji pêveberê bikin. “Kî-kê” ji bo mirovan “çî” jî ji bo heyberên din e.

**Mînak:** Delal pirtûkê dixwîne. ( Kî pirtûkê dixwîne?)

Delalê pirtûk dixwend. (Kê pirtûk dixwend?)

Dar pelên xwe diweşîne. ( Çî pelên xwe diweşîne?)

Ez îro pir nexweş im.

(Kî nexweş e- kirde kar nake, mijar ew e.)

Mirîşka ku pir hêk dikir miriye.

(Çî miriye- Kirde ji ber ku qalib e nayê parçekirin.)

**Hişyarî:** Di dema boriya gerguhêz de û di çîrokiyên dema boriya gerguhêz de ji ber ku bireser li gorî lêkerê diyar dibe divê kirde bê bikaranîn. Ku neyê bikaranîn wê şaşî çê bibin. Û di wan deman de ji ber ku kirde diyar e pirsê kirdeyê jî dibe “kê”

**Mînak:**

Sêv xwarin.

(gelo kê sêv xwarin, te, min, wan, wî, wê, we, ne xuya ye)

Min sêv dixwarin

Wan sêv dixwarin

### **Kirde dibin du beş:**

#### **Kirdeya Bireserî**

Dema ku lêker tebat e, ji ber ku yê ku kar dike ne diyar e, bireser dikeve şûna kirdeyê. Loma jî ev kirde dibe kirdeya bireserî; ji ber ku ew kirde di eslê xwe de bireser e.

**Mînak:**

Pol hat şûştin. (pol ketiye şûna kirdeyê; lê di eslê xwe de ew bireser e. Ji ber ku kirde ne diyar e şûna kirdeyê girtiye)

Nan hat çêkirin. (nan kirdeya bireserî ye)

### Kirdeya Nixumî

Dema ku lêker tebat be û peyvên mîna “ji aliyê..... ve”, “ji hêla ..... ve” bîn bi kar anîn, kirdeya nixumî derdikeve holê. Bireser dibe kirdeya nixumî. Tiştê balkêş kirde jî di nava hevokê de ye lê ew jî ji ber daçekên “ji.....ve” dibe têrker.

**Mînak:** Pirtûk                      ji aliyê bavê min ve                      hat xwendin.  
Kirdeya B.                      Kirdeya N.                      pêveber

Nan                      ji hêla wan ve                      hat xwarin.  
Kirdeya B.                      Kirdeya N.                      Pêveber

**Nîşe:** Carinan di hevokên dirêj de kirde dibe hevpar

**Mînak:** Bavê min nan xwar, nimêj kir û çû raket. (kirde hevpar e)

**Nîşe:** Di dema borî de, dema kirde hevpar be û lêkerekê negerguhêz û yek jê jî gerguhêz be, kirde li gorî ya gerguhêz çê dibe.

**Mînak:**                      Min çû nan xwar ( **Ez çûm min** nan xwar)  
Ez çûm nan xwar(çewt e)

### Têkiliya Kirde û Pêveberê

Di navbera kirde û pêveberê de li gorî kesan, li gorî yekjimar û pirjimariyê têkiliyek heye. Dema ku ev têkilî bê binpêkirin wateya hevokê xirab dibe.

**a. Kirde Cînavk be:** Dema ku kirde cînavkên xwerû bin pêveber jî li gorî wan qertafên kesane digirin.

**Mînak:**    Ez dixwim                      Ez çûm  
              Tu dixwî                      Tu çûyî  
              Ew dixwe                      Ew çû  
              Ew dixwin                      Ew çûn

**Nîşe:** Di dema borî de lêker negerguhêz be qertafa kesê sêyem –e nayê bikaranîn.

**Mînak:** Ew hat vir. (“ew hate vir” çewt e)

**Nîşe:** Qertafa kesê duyemîn –î piştî qertafên deman nayê.

**Mînak:**                      Tu dê bihatiyayî(çewt)  
                                  Tu dê bihata(bihatiya-rast)

**b. Kirde Komenav be:** Dema ku kirde komenav be, pêveber yekjimar e.

**Mînak:** Pez diçêre.  
Daristan bêxwedi ye.

**c. Kirde Rengdêrên Nediyar û Pirjimar be:** Peyvên her kes, tu kes, qet kes dema ku kirde bin pêveber yekjimar; kirde “ hemû kes, hin kes, gelek kes “ be pêveber pirjimar e.

**Mînak:** Her kes nan dixwe.  
Tu kes napeyive.  
Qet kes nehatibû.  
Hemû kes hatine.  
Hin kes li te dipirsin.  
Gelek kes birçî mane.

### **Bireser**

Tiştê ku di tesîra karê ku kirde dike de dimîne bireser e. Bireser di lêkerên gerguhêz de hene. Di dema niha û dema bê de ji ber ku bireser divê diyar be, qertafên diyariyê distîne. Di dema borî de lêker gerguhêz be bireser qertafên diyariyê nastîne. (ergatîfî). Piştî ku mirov kirdeyê bibîne, bi pirsên “kî-kê-çî” bireser tê dîtîn.

**Mînak:** Ez sêvê dixwim. (ez çi dixwim?)  
Tu yê wê pirtûkê bixwînî. (Tu yê çi bixwînî?)  
Ez wî dibînim. (ez kê dibînim?)  
Te ez dîtîm. ( te kî dît?)

### **Çend Nîşe Li ser Bireseran**

**a. Carinan bireser dibe hevpar:**

**Mînak:** Pirtûka min bir, xwend û dîsa anî.  
(pirtûka min bireser e û hevpar e)

(**pirtûka min bir, pirtûka min xwend, pirtûka min dîsa anî.**)

**b. Hevokên hundirîn bireser in:**

**Mînak:**

Cegerxwîn gotiye: “Ebrû şevê, şêrîn devê lêvhingivê xanim...”

**Hişyarî:** Di peveberên ku ji navdêrê pêk hatine de bireser tune ye.

**Mînak:** Jiyana bi te re pir xweş e.



### **Têrkera Cih û Bergehê**

Cihê ku bûyer lê ye, lê diqewime, ber pê diçe, jê derdikeve nîşanî me dide. Di Kurmancî de têrkera cih û bergehê bi daçekan re tîn bikaranîn Ji bona ku em têrkera cih û bergehê bibînin divê em van pirsan ji pêveberê bikin:ji ku, ji ku de, li ku, bi ku de, bi ku ve, ji kê, ji ku ve, di ku de...

**Mînak:** Ez ji mal tîm(ji ku tîm?).  
Ez li malê dimînim(li ku dimînim?).  
Do ji Mêrdînê hat(ji ku hat?).  
Ew bi wir de çû( bi ku de çû?).

### **Têrkera Hokerî**

Rewş, sedem, dem, bergeh, mêjer û çawaniyê diyar dike. Pirsên têrkera hokerî gelek in, weke: Kengî, çima, bi kê re, ji bo çi, ji ber çi, çiqas, ku...

**Mînak:** Ew sibê diçe(kengî?)  
Ji ber ku em dereng hatin em nekirin hundir. (çima?)  
Ji te pir hez dike. (çiqas?)  
Bi diya xwe re çû bajêr. (çawa çû)

# CUREYÊN HEVOKÊ

→ **Li gorî wateyên xwe hevok**

- Hevokên Erênî
- Hevokên Neyînî
- Hevokên Pirsiyariyê
- Hevokên Baneşanî
- Hevokên Xwestekî

→ **Li Gorî Cureyên Pêveberê Hevok**

- Hevokên Lêkerî
- Hevokên Navdêrî

→ **Li Gorî Cihê Pêveberê Hevok**

- Hevokên Bîrist
- Hevokên Bêrist
- Hevokên Kêm

→ **Li Gorî Avaniya Xwe Hevok**

- Hevokên Xwerû
  - Hevokên Hevedanî
- Hevokên Hevedanî yên Lêkernavî  
Hevokên Hevedanî yên Têkel  
Hevokên Hevedanî yên Şertî  
Hevokên Rêzîn  
Hevokên Rêzîn yên Serbixwe  
Hevokên Rêzîn yên Girêdayî

# CUREYÊN HEVOKÊ

## A- LI GORÎ WATEYÊN XWE HEVOK

### a. HEVOKÊN ERÊNÎ

Di van hevokan de pêkanîneke erênî heye. Çalakî pêk tê. Hevokên ku di wan de qertafa neyîniyê tune be erênî ne.

#### 1- Hevokên ku li gorî teşe û wateyê erênî ne

**Mînak:** Pirtûk da min, wî nan xwar, ez îro diçim,

#### 2- Hevokên ku li gorî teşeyê neyînî lê li gorî wateyê erênî

**ne:** ji ber ku du tiştên neyînî tên ba hev dibin erênî -.- = +

**Mînak:** Ne ku ji te hez nakim. (ez ji te hez dikim), ne ku nexwar. (xwar)

### b. HEVOKÊN NEYÎNÎ

Di van hevokan de pêkanîneke neyînî heye. Çalakî pêk nayê. Hevokên ku di wan de qertafên neyîniyê heb in neyînî ne. Bê qertafên neyîniyê jî wateya neyîniyê çê dibe. Ya herî girîng wate ye.

#### 1- Hevokên ku li gorî wate û teşeyê neyînî ne.

**Mînak:** Ez nê naxwim, ew ne pirtûk e, ew ê nexwîne

#### 2- Hevokên ku li gorî teşeyê erênî lê li gorî wateyê neyînî

**ne:** Piranî bi teşeya pirsê tên çêkirin.

**Mînak:** Ma mirov bi wî bawer dibe? Di vê sermê de mirov derdikeve derve?

### c. HEVOKÊN PIRSIYARIYÊ

Hevokên ku wateya pirsê di wan de hene ev in. Hevokên pirsê yan bi derba gotinê tên çêkirin yan jî bi peyvên pirsê.

**Mînak:** Gelo em ê azadiya xwe bi dest bixin?

Ma ew neçûne?

Aya wê bixwe?

Kengê diçe?

Kê xwar?

Hatiye?

Te xwar?

**Nîşe:** Hevokên pirsiyarî yên bêbersiv: Ev hevok jî di teşeya pirsê de ne; lê hewce nake ku mirov bersivê bide. Piştî van hevokan pirsnişan tê bikaranîn.

**Mînak:** Nizanim ez ê çi bikim?  
Ma mirov bi wî re diçe seyde?

#### d. HEVOKÊN BANEŞANÎ

Ev cure hevok wateya peroşiyê, tirsê, kêfxweşiyê, hêrsbûnê, ecibandinê, xemgîniyê... dide me. Piştî van hevokan baneşan tê bikaranîn.

**Mînak:** Ax! Dilê min, Xelkino dengê min tê we! Gelî hevalan!  
Divê em jîr bin!

#### e. HEVOKÊN XWESTEKÎ

Di van hevokan de daxwazî, şert, viyan û ferman hene.

**Mînak:** Xwezî min pir bixwenda.  
Eger ez venegerim tu negirî.  
Divê tu tim hişyar bî.  
Zû here, zû were.

#### B- LI GORÎ CUREYÊN PÊVEBERÊ HEVOK

Pêveber bi du awayan çê dibe. Pêveber dibe ku lêkereke kişandî be, an jî bi alîkariya lêkera 'bûn'ê pêk hatibe.

##### a. HEVOKA LÊKERÎ

Hevoka ku pêvebera wê ji lêkereke kişandî pêk hatiye hevokeke lêkerî ye.

**Mînak:** Te pirtûk **dixwend**.                      Ez pir **dixebitim**.  
Ew duh **hatibû**.                                      Min kar **betal kir**.  
Ji bo hatina te **spas dikim**                      Tu her **hebî!**

##### b. HEVOKA NAVDÊRÎ

Pêveber ji navdêrê an jî peyveke ku bi eslê xwe navdêr e pêk tê, bi alîkariya lêkera "bûn"ê ev navdêr dibin pêveber.

**Mînak:** Îro dinya **bi mij e**.                      Serkeftin **xwendin e**.  
Ew **hevalê min bû**.                      Destê te **xwar e**.  
Pirtûk **ev bûn?**

**Nîşe:** Dema ku lêkernav bibin pêveber ew hevok hevokeke navdêri ye.

**Mînak:** Ev çawa **xwendin e?**

## C- LI GORÎ CIHÊ PÊVEBERÊ HEVOK

### a. Hevokên Bîrist:

Di Kurmancî de du cure qalibên hevokan yê bîngê hene. Hêmanên hevokê li gorî van qaliban rêz dibin. Cihê kirdeyê û têkeran ne muhîm e, ya muhîm cihê pêveberê ye.

**1- Forma Yekem:** Kirde+(têker+bireser+hoker)+pêveber.

**Mînak:** Ez li mal dixebitim. Ew min dibîne.  
Ew duh çû. Ez li malê pir xebitîm.

**2- Forma Duyem:** Kirde+pêveber+têker

**Mînak:** Ez diçim malê Min rahişt pirtûkê

### b. Hevokên Bêrist:

Dema ku cihê pêveberê ne li gorî qaliban be, hevok dibe bêrist.

**1- Li gorî forma yekem**

**Mînak:** Ez dixebitim li malê. (Ez li malê dixebitim)  
Min dibîne ew. (Ew min dibîne)

**2- Li gorî forma duyem**

**Mînak:** Diçim malê ez . (Ez diçim malê)  
Rahişt pirtûkan wî (Wî rahişt pirtûkan)

### c. Hevokên Kêm:

Di van hevokan de pêveber bi kar nayê. Her çiqas bi kar neyê jî mirov tê derdixe ku pêveber çî ye.

**Mînak:** - Te nan xwar?  
- Belê. (Belê min xwar)  
- Rê bi çûnê, kar bi şixulê. (diqede)

## D- LI GORÎ AVANIYA XWE HEVOK

### a. HEVOKÊN XWERÛ

Di van hevokan de pêveberê tenê heye. Ev hevok darazekê tenê vedibêjin. Pêveber an lêkereke kişandî ye yan jî navdêrek e ku bi alîkariya lêkera "bûn"ê bûye pêveber.

**Mînak:** Dîrok fedîkar e kalo.  
Ez îro naçim dibistanê.  
Wê pirtûk xwend.  
Me nan xwarin.

### **b. HEVOKÊN HEVEDANÎ**

Di van hevokan de darazeke bingehîn û yek an bêtir darazên alîkar hene. Daraza bingehîn di kîjan hevokê de be ew hevoka bingehîn e. Yên din jî hevokên alîkar in.

Li gorî taybetiyên xwe dibin sê beş:

### **c. HEVOKÊN HEVEDANÎ YÊN LÊKERNAVÎ**

Hevokên ku di nava wan de lêkernav hene hevokên wisa ne. Hevoka alîkar bi lêkernavê çê dibe û weke hêmaneke hevokê bi pêveberê re tê girêdan.

**Mînak:** Nanê ku şewitî ye ne ye me ye. (lêkernava rengdêrî)  
h.alîkar

Dema ku tu hatî em ê bixwin. (lêkernava hokerî)  
h. alîkar

Xwendina pirtûka tiştêkî baş e. (lêkernava navdêrî)  
h. alîkar

Kenîna te, me jî dikenîne. (lêkernava navdêrî)  
h. alîkar

Xwîna ku wê birije, xwîna me hemûyan e. (lêkernava rengdêrî)  
h. alîkar

Yên ku binî wan hatine xêzkirin hevokên alîkar in û lêkernav hatine bikaranîn; yên din jî hevokên bingehîn in.

### **d. HEVOKÊN HEVEDANÎ YÊN TÊKEL**

Dema ku hevokeke din bikeve nava hevokê , hevoka hevadanî ya têkel çê dibe. Ew hevok alîkar e; daraza bingehîn di hevoka bingehîn de ye.

**Mînak:** Bavê min digot "divê mirov her tim hişyar be!"

Digot "ez ê jî sibê werim"

Ji bo bibêjin "serê we sax be" çûn mala wan

Yên binê wan hatine xêzkirin hevokên alîkar in; yên din bingehîn in.

### e. HEVOKÊN HEVEDANÎ YÊN ŞERTÎ

Hevoka alîkar ji şertê çê dibe. Hevoka bingehîn li gorî şertê bi xwe ve girê dide. Şertê ku di hevoka alîkar de ye pêk neyê bûyera hevoka bingehîn jî pêk nayê.

**Mînak:** Ku ew neyê ez jî nayê.

Eger nan bixwe wê bi ser keve.

Heke tu nexebitî tu yê pûanekî baş nestînî.

Yên ku binî wan hatine xêzkirin hevokên alîkar in û bi şertê çê bûne; daraza bingehîn di hevokên bingehîn de ne.

### f. HEVOKÊN RÊZÎN

Her hevok bi tena serê xwe darazekê vedibêje û bi bêhnok an jî bi xalbêhnokan bi hev ve hatine girêdan. Ev cure hevok li gorî girêdanên hêmanî dibin du cure:

#### 1- Hevokên Rêzîn yên Serbixwe

Hin hevokên serbixwe bi bêhnok û bi xalbêhnokan bi hev ve tên girêdan. Lê hêmanên hevpar di nava wan de tune ne.

**Mînak:** Bavê min digot, me guhdarî dikir.

Min jê re got wer neke; wî jî xwe diengirand.

Ga guherande bizinê, bizin jî guherande mirîşkê.

#### 2- Hevokên Rêzîn yên Girêdayî

Hin hevokên serbixwe bi bêhnok û bi xalbêhnokan bi hev ve tên girêdan. Lê di van hevokan de divê hêmaneke hevpar hebe.

**Mînak:**

Tu ji bîr bikî; Xwedê ji bîr nake. (tiştê jibîrkirinê hevpar e)

Seferê me çû seferê, hat kerê berê. (Sefer hevpar e).

## ŞAŞIYÊN VEGOTINÊ

- Şaşiyên Vegotinê
- Çewtiya Fikirîna bi Tirkî
- Çewtiyên Sentaksê
- Peyvên ku ne di cî de tîn bikaranîn
- Peyvên ku di daraziyê çê dikin
- Peyvên ku Beleheq tîn bikaranîn
- Peyvên ku Cihê Wan yê Hevokê Çewt e
- Çewtiyên Ergatîfî û Aqûzatîfîyê (Diyarkirinê)
- Xirabkirina Biwêj û Gotinên Pêşyan
- Kêmasiya Hêmanên Hevokê
- Neliheviya Kirde û Pêveberê
- Çewtiyên Raweya Tebatî
- Çewtiyên Raweya Dançêker
- Çewtiyên Raweyî



# ŞAŞIYÊN VEGOTINÊ

Dema ku em hest û ramanên xwe vedibêjin divê vegotina me zelal, vekirî, herikbar û sade be. Dema şaşiyên vegotinê hebin, vegotin şolî dibe, tevlihevtir dibe û dikule. Mixabin ji ber ku bi Kurmancî perwerde nehatiye dayîn, pirsgirêkên şaşiyên vegotinê jî gelek in.

## 1- Çewtiyên Fikirîna bi Tirkî

Ji ber ku em di bandora fikirîna zimanekî din de dimînin em li gorî mantixa Kurmancî napeyivin û bi taybetî di biwêjan de em çewtiyan dikin.

### ÇEWT

Em ê vê mijarê hildin dest.  
Min berçavk xist çavê xwe.  
Ew min nagire cidiyê.  
Ev îşê me nabîne.  
Pir xweşiya min çû.  
Civînê gelekî ajot.  
Ji ber çavê min reviyaye.

Xewa min reviyaye.

Min trêna revand.  
Avêt piş guhê xwe.  
Bi demê re wê biguhere.  
Wî peyv avêt keçikê.  
Wan ez anîm lîstikê.  
Min xewa xwe stend.  
Rûyê xwe daliqandiye.

### RAST

Em ê li ser vê mijarê bisekinin.  
Min berçavk da ber çavê xwe.  
Ew min bi tiştêkî nahesibîne.  
Ev bi kêrî me nayê.  
Kêfa min pir jê re hat.  
Civînê gelekî dewam kir.  
Çavê min pê neketiye.  
(Bala min pê neketiye.)  
Xewa min herimî ye.  
(Xew li min herimî ye.)  
Ez negiham ser trêna.  
Di ser guhê xwe re avêt.  
Hêdî hêdî wê biguhere.  
Wî dev avêt keçikê.  
Wan ez xistim feqê.  
Ez têr raketim  
Rûyê xwe tirs kiriyê.

## 2- Çewtiyên Sentaksê

Carinan bi tesîra sentaksa Tirkî em hevokan çewt saz dikin.

### ÇEWT

Cîhan ji kurdan re deyndar e.  
Min top lîst.  
Ew ders dişixule.

### RAST

Cîhan deyndarê kurdan e.  
Min bi topê lîst.  
Ew li dersê dişixule  
Ew darsa xwe dişixule.

Mêvanê xwe germ pêşwazî kirin. Mêvanê xwe bi germî pêşwazî kirin.

### 3- Peyvên ku ne di cî de hatine bikaranîn

Peyvên ku ne di cî de tên bikaranîn vegotinê xera dikin.

**Mînak:**

**ÇEWT**

**RAST**

Vê nexweşiyê hişt ku bavê min bimre. Vê nexweşiyê kir ku bavê min bimre.

Ez vê peyvê pir dixebitînim. Ez vê peyvê pir bi kar tînim.

Em ê sibê civînekê bigirin (bistînin). Em ê sibê civînekê çê kin.

Evana got û wiha pê de çû:

Evana got wiha dewam kir:

Qonferans bi dawî hat.

Qonferans bi dawî bû.

Me çay xwar.

Me çayê vexwar.

Bermayiyên Romayê baş nayên parastin. Xirbeyên Romayê baş nayên parastin.

Porê min mezîn bûye.

Porê min dirêj bûye.

Heta niha gavên şênber nehatine avêtin. Heta niha gavên berbiçav nehatine avêtin.

### 4- Peyvên ku Dijdarziyê çê dikin

Hin peyv hene ku divê bi hev re neyên bikaranîn. Dema ku bi hev re bî bikaranîn di warê daraziyê de nakokî derdikeve holê.

**Mînak:** Sibê teqez belkî ez bêm.

(peyvên teqez û belkî bi hev re divê neyên bi kar anîn).

Ev bûyer ez dibêjim qey wê miheqeq pêk were.

(peyvên qey û miheqeq bi hev re nabe).

Ji sedî sed, dibe ku em bi ser Kevin.

(ji sedî sed û dibe ku dijdaz in).

Kêm zêde tam çil û pênc deqe derbas bû. (kêm zêde-tam).

Ez baş zanim divê niha hatibe. (baş dizanim-divê).

### 5- Peyvên ku Beleheq Tên Bikaranîn

Peyvên ku heman wateyê didin divê bi hev re neyên bikaranîn. Lewre yek têrê dike ne hewce ye ku mirov her diwan jî bi hev re bi kar bîne.

**Mînak:** Axavtin û peyivînên hatin kirin pir dirêj bûn. (axaftin û peyivîn heman tişt in. (çewt)

Axaftinên hatin kirin pir dirêj bûn. (rast)

Pirsa ku hat pirskirin ne baş bû. (pirs jixwe tên pirsîn) (çewt)

Pirsa ku hat kirin ne baş bû. (rast)  
Ew bûye mamosteyê zimanê Kurmancî. (ziman beleheq e)  
Şîno û Nûrê her du ji hev hez dikin. (her du beleheq e)  
Hindik ma bû ji xênî dikira biketa. (hindik ma beleheq e)  
Xwendevanê qama wî herî qut Rêdar bû. (qam beleheq e)

**6- Peyvên ku Cihên Wan Yên Hevokê Çewt in:** Di avakirina hevokê de divê mirov peyvan rast bi cî bike. Dema ku peyv rast neyên rêzkerin vegotin xirab dibe.

**Mînak:** Îro pir hevaleyê min yê hêja hat. (çewt)  
Îro hevaleyê min ê pir hêja hat. (rast)

### 7- Çewtiyên Ergatîfî û Aqûzatîfîyê (Diyarkirinê)

Di dema borî de eger lêker gerguhêz be divê kirde diyar, bireser xwerû û pêveber li gorî bireserê be(ergatîfî)

**Mînak:**

#### ÇEWT

Te min kuşt.

Min wan hevalan dît.

Ez ji te re gotim.

#### RAST

Te ez kuştim.

Min ew heval dîtin.

Min ji te re got.

Di dema borî de eger lêker negerguhêz be divê kirde neyê diyarkirin.

**Mînak:** ÇEWT

Min çû malê.

Te do hat ku?

Wan bi me kenyan.

**RAST**

Ez çûm malê.

Tu do hatî ku?

Ew bi me kenyan.

Di dema niha û bê de eger lêker gerguhêz be kirde xwerû, bireser diyarkirî û pêveber li gorî kirdeyê (ya xwerû) ye.

**Mînak:** ÇEWT

Ez ew nas dikim.

Ez ê sêv bixwim.

Wan êzingan dişikînin .

**RAST**

Ez wî/wê nas dikim.

Ez ê sevê/sêvan bixwim.

Ew êzingan dişikînin.

Navdêrên ku piştî lêkerên datîf. (berbiçûnî) tên divê diyarbûyî be.

**Mînak:** ÇEWT

Kurê wî çû esker.

**RAST**

Kurê wî çû eskeriyê.

Tu dereng hatî mal.  
Min rahişt saz lêxist.

Tu dereng hatî malê.  
Min rahişt sazê lêxist.

Navdêrên ku piştî daçekan tên divê diyar bibin.

**Mînak:** ÇEWT

Ew ji mal tê.  
Ez ji bizin hez dikim.  
Xensê li ders şixulî.

**RAST**

Ew ji malê tê.  
Ez ji bizinê/bizinan hez dikim.  
Xensê li dersê şixulî.

Di ravekên navdêran de raveker divê diyar bin. Di navdêrên nêr de pir nayê bikaranîn.

**Mînak:**

ÇEWT

Ji me re qala azadî bike.  
Pirsgirêka Kurd bûye navnetewî.  
Şaredarê Amed baş dixebite.  
Wî helbesta kes neeciband.

**RAST**

Ji me re qala azadiyê bike.  
Pirsgirêka Kurdan bûye navnetewî.  
Şaredarê Amedê baş dixebite.  
Wî helbesta kesî neeciband.

Diyarkirina hejmaran li gorî zayend û mêjera wan çê dibe. Hejmarê "yekê" mê ye; ji diduyan heta nozdehan pirjimar in; ji xeynî dehê yên ku bi sifirê diqedin jî nêr in. Peyv jî li gorî wan tên diyarkirin.

**Mînak:**

ÇEWT

Hezar mirovan govend gerand.  
Bi sedan xwendekaran serî lê da.  
Panzdeh sevî bîne.  
Ji yekê heta nozdehî hejmart.

**RAST**

Hezar mirovî govend gerand.  
Bi sedan xwendekarî serî lê da.  
Panzdeh sêvan bîne.  
Ji yekê heta nozdehan hejmart.

**8- Xerakirina Biwêj û Gotinên Pêşyan:** Biwêj û gotinên pêşyan qalib in û divê neyên xirabkirin.

**Mînak:**

ÇEWT

Kurmê şîrî heta extiyarî.  
Rûyê te naşewite ez çi bikim?  
Giyayê malê tahl e.

**RAST**

Kurmê şîrî heta pîrî.  
Pozê te naşewite ez çi bikim?  
Giyayê hewşê tahl e.

## 9- Kêmasiyên Hêmanên Hevokê

**a. Kemasiya Kirdeyê:** Di hevokên hevedanî de kirdeya ku ji bo hevoka yekem tê bikaranîn dibe ku ji bo ya duyem ne guncav be.

**Mînak:**

**ÇEWT:** Dengê bavê wî xirab bû û pir aciz bû

**RAST:** Dengê bavê wî xirab bû û bavê wî (ew) pir aciz bû

Di hevoka yekem de kirde “dengê bavê wî” ye; lê di hevoka duyem de kirde divê “bavê wî” be. Lewre yê ku aciz bûye bavê wî ye; ne dengê bavê wî ye.

Ji şanoyê hez dikim lê bi kêrî min nayê.

Ji şanoyê hez dikim lê şano bi kêrî min nayê

**b. Kêmasiya Bireserê:** Di hevokên hevedanî de hêmaneke hevoka yekem mîna biresera hevoka duyem tê bikaranîn. Lê divê bireser li hevoka duyem bê zêdekirin.

**Mînak:**

**ÇEWT:** Bi pirtûkan kêfxweş dibe û dixwîne.

**RAST:** Bi pirtûkan kêfxweş dibe û wan dixwîne

Di hevoka yekem de hêmana “bi pirtûkan” ji bo hevoka duyem jî hatiye bikaranîn; lê divê em ji bo hevoka duyemîn biresera “wan-pirtûkan” bi kar bîne. Lewre yên ku tên xwendin pirtûk in.

Ez ji wî hez dikim û diparêzim

Ez ji wî hez dikim û wî diparêzim

**c. Kêmasiya Têrkerê:** Di hevokên hevedanî de hêmaneke hevoka yekem mîna ku têrkera a duyem be tê bikaranîn. Lê divê têrker li hevoka duyem bê zêdekirin.

**Mînak:**

**ÇEWT:** Li gorî wan tevbigerin û tiştêkî nebêjin.

**RAST:** Li gorî wan tevbigerin û ji wan re tiştêkî nebêjin.

Hêmana hevoka yekem ya “li gorî wan” weke hêmana hevoka duyem jî hatiye bikaranîn; lê divê ji bo hevoka duyem têrkera “ji wan re” bê bikaranîn lewre tiştêkî divê “ji wan re” neyê gotin.

**Mînak:**

Min bangî wî kir û tiştin xwestin.

Min bangî wî kir û tiştin jê xwestin.

**d. Kêmasiya Pêveberê:** Di hevokên hevedanî de dibe ku pêvebera hevokekê li ya din neyê.

**Mînak:**

**ÇEWT:** Ne zimanê wan dixebitî ne dest û lingên wan.

**RAST:** Ne zimanê wan dixebitî ne dest û lingên wan dixebitîn.

Pêvebera hevoka yekem “dixebitî” ji bo ya duyem jî hatiye bikaranîn; lê divê ji bo hevoka duyem “dixebitîn” bê bikaranîn lewre di hevoka duyem de pirjimarî heye.

Ez bîaqil lê ew beredayî bû.

Ez bîaqil bûm lê ew beredayî bû.

**10- Neliheviya Kirde û Pêveberê:**

Di hevokan de divê kirde û pêveber li hev bikin.

**ÇEWT**

Nanê ku tê ez û tu dixwî.

Du xort û yek keç bû.

**RAST**

Nanê ku tê ez û tu dixwin

Du xort û yek keç bûn

Kirde û pêveber ji aliyê erênî û neyînî ve divê hev bigirin.

**ÇEWT**

Hemû tişt nikarin min ji rêya min bikin.

Her kes sibê nayê dibistanê.

Hemûyên wan jî naxebitin.

Ne min nexwar, ne wî nexwar.

**RAST**

Tu tişt nikarin min ji rêya min bikin.

Tu kes sibê nayê dibistanê.

Yek ji wan jî naxebitin.

Ne min xwar ne wî xwar.

**11- Çewtiyên Avaniya Tebatî**

**a.** Di avaniya tebatî de lêkerên gerguhêz û dançêker li şûna hev divê neyên bikaranîn. Wateyên wan ji hev cuda ne.

**FORM A**

Evaya berê jî hatibû pirsandin. Evaya berê jî hatibû pirsîn.

Berê jî tişteki wanî hatibû jiyandin. Berê jî tişteki wanî hatibû jiyîn.

**FORM B**

Ev name ji zû de hatiye nivîsandin. Ev name ji zû de hatiye nivîsîn.

Do li ser vêya hatiye axivandin. Do li ser vêya hatiye axivîn.

Çaleke mezin hatiye kolandin. Çaleke mezin hatiye kolîn(kolan)

Apê Ehmed pir tê nasandin. Apê Ehmed pir tê nasîn.

**Nîşe:** Dema em dibêjin “hat pirsîn” tiştek ji aliyê yekî hatiye pirsîn. (Form B) Lê dema em dibêjin “hat pirsandin” tiştek ji aliyê yekî bi yekî din hatiye pirsîn. (Form A) Loma jî divê li şûna hev neyên bikaranîn

**b.**Lêkerên negerguhêz di raweya tebatî de nayên bikaranîn. Qalibekî wisa di Kurmancî de tune ye.

**Mînak:** Di vê riyê de hat çûyîn (çewt)

Di wê kuçê de hat meşîn (çewt)

Li ser vê meselê hat kenî (çewt)

Ji bo wê hat mirin (çewt)

## 12- Çewtiyên Avaniya Dançêker:

Di avaniya dançêker de divê lêkerên gerguhêz û dançêker li şûna hev neyên bikaranîn. Wateyên wan cuda ne.

**Mînak:**

### FORM A

Min berê dabû pirsandin.

Wî ev biryar da nivîsandin.

Bavê min çal da kolandin.

Em ê di dil de bidin jiyandin.

**Nîşe:**Dema em dibêjin “Min ew da pirsîn” em karê pirsînê bi

yekî din didin kirin. (FORM B) Lê dema em dibêjin “Min ew da pirsandin” em karê pirsînê bi yekî din didin kirin, ew jî bi yekî din dide kirin. (FORM A).

### FORM B

Min berê dabû pirsîn

Wî ev biryar da nivîsîn.

Bavê min çal da kolan (kolîn).

Em ê di dil de bidin jiyîn

## 13- Çewtiyên Raweyî

Di çîrokiya raweyên xwestekî de divê lêkera bingehîn qertafa raweyî a-‘yê bistîne.

**Mînak:**

### ÇEWT

Divê ez çûbûme wir.

Eger min xwaribûye.

### RAST

Divê ez çûbûma wir.

Eger min xwaribûya.

Lêkerên mîna karîn, zanîn, wêrîn, kirinê dema di dema borî de tîbî bikaranîn divê lêkera bîngêhîn di forma dema borî de be û qertafa raweyî –a'yê bîstîne. Di vî warî de pîr çewtî tîbî kirin.

**Mînak:**

**ÇEWÎ**

Min zanîbû bîxwîm.  
Ez karîbûm biçîm .  
Min wêrîbû bîkîm.  
Min dikira bîxwînim.

**RAST**

Min zanîbû bîxwara.  
Ez karîbûm biçûma.  
Min wêrîbû bîkîra.  
Min dikira bîxwenda.

c. Lêkerên mîna karîn, zanîn, wêrîn, kirin bi lêkerên bîngêhîn re tîbî bikaranîn. Kîrde ne li gorî vana li gorî lêkerên bîngêhîn tîbî diyarkirin.

**Mînak:**

**ÇEWÎ**

Min karîbû biçûma.  
Ez karîbû bîxwara.  
Wan zanîbû bîhatîna.  
Ez newêrîbûm bîxwara.  
Wî dikira biçûya .

**RAST**

Ez karîbûm biçûma.  
Min karîbû bîxwara.  
Ew zanîbûn bîhatîna.  
Min newêrîbû bîxwara.  
Ew dikira biçûya.



## RASTNIVÎS

- Rastnivîs
- Nivîsîna Tîpên Mezin û Tîpên Biçûk
- Nivîsîna Peyvên Dîrokê
- Nivîsîna “î” û “ê” ya berî y’yê
- Nivîsîna “û” û “u” ya berî w’yê
- Hinek Peyvên ku Çewt Tê Bikanan û Rastiya Wan
- Nivîsîna Peyvên Biyanî yê Taybet
- Nivîsîna Peyvên Perçînkirî Dubestî û Biwêjan
- Nivîsîna Daçekan
- Nivîsîna Qertafên Diyariyê û Raveberê
- Nivîsîna Qertafên ku Tê Pêveberê
  - Pêveber Navdêr be
  - Pêveber Lêker be
- Nivîsîna Qertafa Neyiniyê
- Nivîsîna Lêkeran
  - Rastnivîsa Lêkerên Hevedanî
  - Di Lêkerên Pêkhatî de Nivîsîna Qertafan
- Nivîsîna Peyvên ku di Dawiya Rêzê de Hîlnayên
- Nivîsîna Hejmaran

# RASTNIVÎS

Ziman li gorî bikaranîna xwe dibe zimanê devkî û zimanê nivîskî. Zimanê devkî dema ku têkeve nivîsê divê li gorî hin pîvanên rêzimanî bê nivîsîn. Di Kurmancî de ji ber ku heta niha perwerdehî çê nebûye, di warê rastnivîsê de li ser hin tiştan lihevkirinek çê nebûye û hewceyî nîqaşê ne. Armanca pîvanên ku di vê mijarê de hatine dayîn ew e ku, ziman hêsantir bê nivîsîn û tevlihevî der nekeve. Li ser hin mijaran hîn jî nîqaş dewam dikin; di vî warî de li ser van pîvanên li jêrê dikarin bêt fikirîn.

## NIVÎSÎNA TÎPÊN MEZIN Û TÎPÊN BIÇÛK

### A- Hemû Hevok bi Tîpên Mezin Dest Pê Dikin

**Mînak:** Ez ji te pir hez dikim.  
Welatê me pir şêrîn e.

### B- Hemû Navên Taybet Mezin Tê Nivîsîn:

1- Navên serenav bi tîpên mezin û navên cins jî bi tîpên biçûk tên nivîsîn. Nav û paşnavên kesan bi tîpên mezin tên nivîsîn.

**Mînak:** Celadet Bedirxan  
Osman Sebrî

2- Navên heywanan yê taybet mezin tên nivîsîn.

**Mînak:** Îro Çavreş pir birçî bûye.  
We nan da Qero?

3- Bêjeyên namdarî, pîşeyî û hurmetî eger bûbin nasnav mezin tên nivîsîn.

**Mînak:** Duh Elî Beg hate mala me.  
Em çûn mala Sebriyê Mereşî.  
Îro Ehmedê Nahtorvan jiyana xwe ji dest daye.

- Ev peyv dema ku girêdayî navan nebin biçûk tên nivîsîn.

**Mînak:** Te got xalê min Mehmûd hatiye.

4- Navên millet, ol û mezheban mezin tên nivîsîn.

**Mînak:**

Xelkino Misilmantî ne weke ya wan e.  
Bandora Kurmancî li dinyayê heye.  
Bila bi zimanên weke Kurmancî, Farisî, Erebi jî perwerde hebe.  
Dibêjin Sûnî bi hev ketine.

5- Navên sazî û dezgehan mezin tên nivîsîn.

**Mînak:**

Duh Kongeraya Navenda Çanda Mezopotamya'yê pêk hat.  
Em jî herin Zankoya Duhokê.

6- Di name û nivîsên fermî de peyvên hîtabî mezin tên nivîsîn.

**Mînak:** Hevala Hêja,  
Dostê Qedîm.

7- Navên pirtûk, kovar, rojname û sernivîsan bi tîpên mezin dest pê dikin.

**Mînak:** Te îro Azadiya Welat stend.  
Navê nivîsa wê " Têkçûna Me" bû.  
Kovara Hawarê dîsa dest bi weşanê kir.  
Navê romana wî ya yekem Reş û Spî bû.

**Nîşe:** Gihanek û daçekên nava nivîsan biçûk tên nivîsîn.

**Mînak:** Te nivîsa Xezal û Delal xwend.

8- Navên rojên neteweyî û cejnan mezin tên nivîsîn.

**Mînak:** Cejna we ya Newrozê pîroz be.  
Roja Cejna Kurmancî pîroz be li we.

9- Navên behr, gol, çiya, rûbar, deşt û çiyayan bi tîpên mezin dest pê dikin.

**Mînak:** Li Çiyayê Sîpanê mir.  
Hefta borî em çûn Behra Wanê.  
Şerê Çiyayê Bogokê bi nav û deng e .  
Îsal pir bi ber bû Deşta Licê.

10- Peyvên bergeh û aliyan eger bûbin navên cihan bi tîpên mezin tên nivîsîn.

**Mînak:** Li Rojhilata Navîn hê şer heye.  
Li Qoreya Başûr lehî rabûye.

**Nîşe:** Peyvên bergehî dema ku berî cihên taybet bînin mezin tên nivîsîn; dema ku piştî wan bînin biçûk tên nivîsîn. Lewre dema ku tê piştî cihan êdî dibe navê herêmekê.

**Mînak:** Li başûrê Qore'yê lehî rabûye.

**11-** Navên gerdûnî û kozmosî bi tîpên mezin dest pê dikin. Lê divê di wateya têgînê de bin.

**Mînak:** Di 24 saetande de Dinya tûra xwe temam dike.

Duh ji Marsê kevirekî mezin ket.

- Dema ku eleqeya van navan bi zanistê tune be biçûk tên nivîsîn

**Mînak:** Tu dibêjî çî dinya hemû bê lava bike ez ji gotina xwe danayêm

**12-** Peyvên ku piştî xal, cotexal, pirsnîşan, baneşan, tên bi tîpên mezin dest pê dikin.

**Mînak:** Tu çî dikî? De ji min re bêje

Ax! Mala min ev çû.

Lehengê me digot: Ez ê bi serbilindî bimirim.

- Dema ku piştî xalecotê mînak bên dayîn bi tîpên mezin dest pê nakin.

**Mînak:** Divê mijarê de du tişt girîng in: rendgêr û navdêr

### **NIVÎSÎNA PEYVÊN DÎROKÊ**

Dema ku rojêke diyar bê qestkirin navên meh û rojan bi tîpên mezin dest pê dikin.

**Mînak:** 21'e Adarê cejna Newrozê ye

Licê 22'ê Kewçêra sala 1993'an de hat şewitandin.

Em ê 1'ê Îlonê li taxa Derêçiyê pîroz bikin.

**Nîşe:** Dema ku rojêke diyar tune be navên roj û mehan biçûk tên nivîsîn.

**Mînak:** Ezmûna me di meha gulanê de ye

Roja îne em ê herin mizgeftê.

**Nivîsîna "î" û "ê" ya berî "y" yê**

Beriya tîpa "y" yê dema ku tîpa "î" were ev tîp kurt û dibe "i". Ji ber ku "y" tîpeke nîvdengdêr e û "î" yê qebûl nake, wê kurt dike.

**Mînak:** Sîya darê çî xweş e. (sî)

Li hêviya te mam (hêvî)

Di hinek peyvan de beriya tîpa "y" yê tîpa "ê" bê kurt dibe û dibe "i".

**Mînak:** Dê → diya min

Rê → riya me

Pê → piyê wê

**Nivîsîna "û" û "u" ya berî "w" yê**

Beriya tîpa "w" yê "û" û "u" bê kurt dibe û dibe dibin "i".

**Mînak:** Tû→tîwê reş                      du→dîwemîn  
 Xwesû→xwesîwa min                    rû→rîwê min

- Dema em li şûna “w” yê y’yê bi kar bînin hewce nake ku “û” bibe “î”. Bi vî awayê koka peyvê jî xirab nabe.

**Mînak:** Rûyê min, tûya hewşê

**Hinek Peyvên ku Çewt Tên Bikaranîn û Rastiya Wan**

**Çewt Rast Rave** Têkoşîn Têkoşîn Di+wî/wê+koşîn=têk Tîrej Tîrêj Tîr+rêj Tevlîhev Tevlîhev Tev +li+ hev Tevlîbûn Tevlêbûn Tev li wî/wê+bûn Bihîstandin

Bihîstîn

(bihîstandin)

Lêker –and û –t’yê bi hev re nastîne

Jixwe –t ji –and’ê tê Dergistî Desgirtî Veguhêzîn Hewal Heval Hev+al Hevlêr Hewlêr Pevguherîna dengdaran Arîkar Aîîkar Pevguherîna dengdaran Kelmêş Kermêş Pevghuherîna dengdaran(ker+mêş) Herem Herêm Pevguherîna dengdêran Şerjêkirin Serjêkirin Pevguherîna dengdaran Cîh Cî(cih) Ji xwe cî ji cih’ê tê Dişwar Dijwar Pevguherîna dengdarana Derbaz Derbas Pevguherîna dengadaran Zevq Zewq Pevguherîna dengdaran Aştî Aştî Ji “aştbûn”ê tê Rasttir, xurttir, şîddet, paşşiv, yekkîte Rastir

Xurtir

Şîdet

Paşîv, yekîte

Tîp xwe dûbera nake. Hevala dibînim Hevalan dibînim -n devkî de dibe ku bikeve nivîsê de nakeve. Darkê bide min Darekê bide min -e di devkî de dibe ku bikeve nivîsê de nakeve. Ez hevalna dibînim Ez hevalinan dibînim -lî û –n bi hev re ketine. Ev di devkî de ye. Nivîskî de divê hebin CNN’ê xeber pêşkêş kir. CNN’yê xeber pêşkêş kir. Di diyarkirinê de koka peyvê divê bê parastin. Qetîla wî helal e.

Ew pir kevî e Qetla wî helal e

Ew pir kevn e Piştî hin peyvên dema ku qertfeke dengdêr bê, dengdêra peyvê ya kîteya dawîn dikeve Ji roava hat

Ji rohilat hat Ji rojava hat

Ji rojhilat hat Zimanê devkî û nivîskî ne weke hev in; kok divê bê parastin Têrî nekir Têrê nekir Têr li wî/wê nekir.

## Nivîsîna Peyvên Biyanî Yên Taybet

Peyvên ji zimanên ku alfabeya latînî bikartînin ketine Kurmancî, divê guhertin di wan de çê nebe; xwendina wan dikarin di nava kevanekê de bê nîvîsîn.

**Mînak:** Shakespeare (Şekspîr) Foucault (Fûqo)  
Bacon (Beykin) Munich (Minîh)  
Marx (Marks) Calven (Qalven)

a. Hin navên biyanî yên ku ji berê de tên bikaranîn û rûniştî ne hewce nake em li orjînalê wan vegerin.

**Mînak:** Eflatûn (Platon), Faris (Pers), Cercîs (Georges)

b. Dema ku navên taybet bibin navên pergala û bizavan dikarin li gorî fonetîka Kurmancî bê nîvîsîn.

**Mînak:** Marksîzm Qalvenîzm

Dema em peyvan ji zimanên ku alfabeya latînî bi kar naynin (Yewnanî, Rûsî, Çînî, Japonî...) digirin em wan li gorî fonetîka Kurmancî dinivîsin. Ji ber ku alfabeya wan zimanan û ya Kurmancî qet li hev nayên.

**Mînak:**  
Ηροδοτος (bi Yewnanî) Herodotus Herodot  
Достоёвский (bi Rûsî) Dostoyevskî Dostoyevskî  
上海 (bi Japonî) Şanghay Şangay

## NIVÎSÎNA PEYVÊN PERÇÎNKIRÎ, DUBESTÎ Û BIWÊJAN

### Peyvên Perçînkirî

Peyvên perçînkirî ku bi qertafên mîna “-ip, -ipî” çê dibin bi hev ve tên nivîsîn.

**Mînak:** Sipsor, ripîreş, şipşîn, sipîsar

### Peyvên Dubestî

Ev cure peyv jî ji hev cuda tên nivîsîn. Lê hinek ji wan ku bi taybetî bi alîkariya dengdêrek alîkar çê bûye bi hev ve tên nivîsîn.

**Mînak:** Hêdî hêdî kêm zêde heval û hogirên zir

Pirtûk mirtûk fen û fût dar û ber cil û berg  
Helkehelk gurmegurm şilopilo şilfîtaşî

### Biwêj

Biwêjen ku ji du an pirtir hêmanan pêk tên cuda tên nivîsîn. Divê mirov forma biwêjan xirab neke.

**Mînak:** Çav pê ketin bîz jê kirin, guh nedan serî lê dan,  
Xwe berdane tehma şîr ji dev hatin

**Nîşe:** Dema ku ev biwêj weke nav bi kar bên heta sê hêmanan bi hev ve pirtir be ji hev cuda tên nivîsîn.

**Mînak:** Îro hat serlêdana me.  
Tehma şîr ji dev hatin, biwêjeke xweş e.

### **NIVÎSÎNA DAÇEKAN**

Daçek ji peyvan cuda tên nivîsîn.

**Mînak:** Em ji malê tên.  
Bi min re tê.  
Bê min çû.

- Daçek dema ku ravekê çê kin bi peyvê ve tên nivîsîn.

**Mînak:** Nanê birûn, mirovên birûmet.

- Neyîniya daçeka “bi” “bê” jî dema ku weke qertafa çêker bê bikaranîn bi peyvê ve tê nivîsîn

**Mînak:** Bêguman, bêdeng  
Bê xanimê narim (bêyî xanimê narim)

### **NIVÎSÎNA QERTAFÊN DIYARIYÊ Û RAVEBERÊ**

Qertafên diyariyê û ravekê bi peyvê ve tên nivîsîn

#### **Qertafên Diyariyê**

**Mînak:** Ez Zî<sup>nê</sup> dibînim  
Yek yekî<sup>nê</sup> dibîne  
Cîran<sup>an</sup> nan xwar.

- Dema peyv qertafên diyariyê bistînin kok divê bê parastin.

**Mînak:** Em çûn komelê (çewt). Em çûn komeleyê (rast).  
Rojnamê bîne (çewt). Rojnameyê bîne (rast).

- Di kurtkirina sazî û dezgehan de jî divê mirov vê rêgezê bin pê neke.

**Mînak:** DTP'ê kongreya xwe li dar xist (çewt)  
DTP'yê kongreya xwe li dar xist (rast)

#### **Ravek**

Qertafên raveberê jî bi peyvan ve tên nivîsîn.

**Mînak:** Evîna min (a→mê)  
Çiyayê me (-ê→nêr)  
Pirtûkên me (ên→pirjimar)

#### **Piştî qertafên nediyariyê ravek**

**Mînak:** Evîneke xweş (-eke→mê)  
Welatekî baş (-ekî→nêr)  
Hevaline rind (-ine→pirjimar)

## NIVÎSÎNA QERTAFÊN PÊVEBERÊ

Navdêr dema ku bibin pêveber lêkera (bûn) ku wan dikin pêveber cuda tê nivîsîn. Lê dema ku lêker bibe pêveber qertaf pê ve tîn nivîsîn.

**Mînak:** Ew mirovên jîr in                      Ew nên dixwin  
Ya herî xweşik ev e                              Bila ew bixwe

## NIVÎSÎNA QERTAF NEYINIYÊ “NE”YÊ

Pêşgira “ne” yê ku qertafa neyîniyê ye, dema ku bi lêkerê re bê bikaranîn pê ve; dema ku bi navdêrê re bê bikaranîn, jê cuda tê nivîsîn.

**Mînak:** bi lêkerê re                              bi navdêrê re  
Ez ê bi te re neyêm                              Ev av pir ne sar e  
Ez vî karî nakim                                  Ev tiştêkî ne xweş e

Ev qertaf bi lêkerên “karîn” û “zanîn” re bê bi kar anîn dibe “nî”

**Mînak:** Nikarim                      Nizanim

Di lêkerên bi pêrkîtan pêkhatî de qertafên neyîniyê û yên demê dikevin navbera pêrkît û lêkeran.

**Mînak:** Narazêm (şaş)                              ranazêm (rast)  
Diveşêre (şaş)                                      vedişêre (rast)  
Neveşwar (şaş)                                      venexwar (rast)

Ev qertaf dikare weke qertafa çêker jî bê bikaranîn. Wê çaxê divê bi peyvê ve bê nivîsîn.

**Mînak:**                      Nezan, nexweş

## NIVÎSÎNA LÊKERAN

### Nivîsîna Lêkerên Hevedanî

Lêkerên hevedanî dema ku bi tena serê xwe bèn bikaranîn ji hev cuda; lê dema ku di raweya tebatî, dançêker û weke navdêr bê bikaranîn bi hev ve tîn nivîsîn.

**Mînak:** Me çalakî li dar xist (bi serê xwe).  
Çalakî hate lidarxistin (raweya tebatî).  
Çalakî da lidarxistin (raweya dançêker).  
Lidarxistina çalakiyê (navdêr).



### Di Lêkerên pêkhatî de nivîsîna qertafan

Qertafa –ne di lêkerên pêrkît standine de dikeve nava pêrkît û lêkerê

**Mînak:** Navekim (çewt) Venakim (rast)  
narazêm (çewt) Ranazêm (rast)

Qertafa bi- di lêkerên pêrkît standine de nayê bikaranîn.

**Mînak:** vebike (çewt) veke (rast)  
Lêbixe (çewt) lêxe (rast)  
Rabixe (çewt) raxe (rast)

### Nivîsîna peyvên ku di dawiya rêzê de hîlnayên.

Peyvên ku nakevin dawiya rêzê li gorî kîtekirina wan ji hev vediqetin.

**Mînak:** Ku peyva “tîravêj” kete dawiya rûpelê û cih têrê nekir. Em ê wê peyvê wiha perçe bikin:

.....tîr-  
avêj →(çewt)

.....tîrav-  
êj →(çewt)

.....tî-  
ravêj →(rast)

.....tîra-  
vêj →(rast)

Mirov di dabeşkirinê de divê tîpekê li cihekî nehêle

### Mînak:

.....a-  
zîne →(çewt)

.....azîn-  
e →(çewt)

.....azî  
ne →(rast)

Qertefa peyva ku hatiye dabeşkirin hebe û bi dabirê hatibe veqetîn ne hewce ye ku mirov xêzika jêkirinê bi kar bîne.

### Mînak:

.....DTP'-  
yê →(şaş)

.....DTP'  
yê →(rast)

## Nivîsîna Hejmaran

- 0, Sifir
- 1, Yek
- 2, Du-dudu-dudo
- 3, Sê-sisê
- 4, Çar
- 5, Pênc
- 6, Şeş
- 7, Heft
- 8, Heşt
- 9, Neh
- 10, Deh
- 11, Yanzdeh
- 12, Diwanzdeh
- 13, Sêzdeh
- 14, Çardeh
- 15, Panzdeh
- 16, Şanzdeh
- 17, Hevdeh
- 18, Hejdeh
- 19, Nozdeh
- 20, Bîst
- 21, Bîst û yek
- 30, Sî
- 31, Çil
- 50, Pêncî
- 60, Şêst
- 70, Heftê
- 80, Heştê
- 90, Not
- 100, Sed
- 101, Sed û yek
- 500, Pênc sed
- 1000, Hezar
- 1000,000, Milyon...

### **Çend Taybetiyên Nivîsîna Hejmaran**

Hejmarên ku bi hev ve kelijîne divê bi hev ve bê nîvîsîn. Lê hejmarên din divê ji hev cuda bê nîvîsîn.

**Mînak:** Nozdeh (kelijiyê), Panzdeh (kelijiyê)

Sed û panzdeh, Çar sed û çil û neh

Di nîvîsîna hejmaran de carinan tîp jî tên bikaranîn. Dema ku hejmarên biçûk hebin û teqezî ne pêwîst be hejmar bi tîpan tên nîvîsîn. Bi taybetî di nîvîsînê wêjeyî de nîvîsîna bi tîpan tê tercîhkirin.

**Mînak:** Min **du** pirtûk xwendin.

Di polê de **bîst û pênc** zarok hene.

Di vegotinên zanistî de hejmar bi tîpan nayên nîvîsîn.

**Mînak:** Di salekê de 52 hefte û 365 roj hene.

Di hejmarên mezî de cihê sifiran bi tîpan tê nîvîsîn.

**Mînak:** Deynê me 7 milyar û 530 milyon bû.

## XALBENDÎ

Xal	( . )
Bêhnok	( , )
Xalebêhnok	( ; )
Xalecot	( : )
Sêxal	( ... )
Pirsnîşan	( ? )
Dunik	( “ )
Baneşan	( ! )
Kevanek	( ( ) )
Kevaneka çargoşe	( [ ] )
Dabir	( ‘ )
Xêzekin	( - )
Xêzedirêj	( – )
Xêzexwar	( / )

## XALBENDÎ

Ji bona ku mirov karibe hest û ramanên xwe baştir bîne ziman û hêsantir bike divê guh bide xalbendiyan. Xalbendî weke nîşaneyên trafîqê rê nîşanî mirov didin. Dema ku em wan bi kar naynin yan jî şaş bi kar bînin wê nivîsa me çewtîyan bihundirîne.

### **Xal (.)**

1- Tê piştî hevokên ku daraza wan tamam bûye.

**Mînak:** Em ji evîne hez dikin.

Ew dev ji doza xwe ber nadin.

2- Tê piştî peyvên ku hatine kurtkirin.

**Mînak:** Dr. Celîlê Celîl

Prz. Evîn , îng.

- Navên kurtkirî yên ku bi tîpên mezin hatine nivîsîn xalê nahundirînin.

**Mînak:** DTP, HSK,

- Piştî navê kovar û yên lewhayan jî xal nayê

**Mînak:** Kovara Rewşen, Dibistana Ehmedê Xanî

3- Ji dêvla qertafên –an –em,- emîn tê bikaranîn.

**Mînak:** Qata 4.

8. Mîhrîcana Amedê

4- Di nivîsîna dîrok û saetan de tê bikaranîn.

**Mînak:** 14.05.2008

21.03.2008

Di saet 13.00'an de

5- Dema ku kom an jî beş tên bi dor kirin piştî tîp û hejmaran tê bikaranîn.

**Mînak:** 1. A.

2. B.

3. C.

6- Pêlikên hejmarî ji hev vediqetîne

**Mînak:** 4.500.650

21.450.524

7- Di matematîkê de weke nîşaneka carkirinê tê bikaranîn.

**Mînak:** 4.4=16

2.4=8

## **Bêhnok (,)**

1- Hevokên ku xwediyê heman peywirê ne bi bêhnokê tên veqetîn yan jî kombêjeyên peyvan ji hev vediqetîne.

### **Mînak:**

Pirtûk stend, xwend, bir. (lêker ji hev veqetandine)

Ez, tu, ew em ê sibê herin. (kirdey ji hev veqetandine)

Ji malê, ji dibistanê, ji gund tên. ( têker ji hev veqetandine.)

Xatirxwestina ji hevalan, dilketina xwendina pirtûkan li dû ma.

(kombejeyan ji hev veqetandine.)

2- Piştî peyvên weke na, belê, erê tê bikaranîn.

**Mînak:** Belê, ez jî tîm.

Na, ez nawxazim.

3- Di name û hin nivîsan de piştî hîtabê tê bikaranîn.

**Mînak:** Birayê min ê bi rûmet

Xwişka min a delal

4- Di hevokên dirêj de piştî kirdeyê tê bikaranîn.

**Mînak:** Evîn, piştî ku ezmûnên xwe derbas dike diçe mala Apê Cindî.

5- Piştî peyvên ku em dixwazin derb li ser be tê bikaranîn, carinan piştî peyvên baneşanî jî tê bikaranîn

**Mînak:** Apê min, qet qala wî neke.

Naaa, ez naxwazim tu wisa bikî.

- Berî û piştî gihaneka "û" bêhnok nayê bikaranîn. Wekî din tu caran bêhnok nakeve nava ravek û peyvên dubestî.

6- Tê berî û piştî peyv û hevokên navîn

### **Mînak:**

Midûrê dibistanê, Elî Beg, duh hat.

Dema ku ket hundir, nizanim dîn bûbû, mîna kerê ziriya.

Dikeve nava hejmarên parçeyî û beşên wan nîşan dide.

**Mînak:** 15,5

3,2

7- Beriya hin gihanekan tê bikaranîn

**Mînak:** Min jê xwest, lê nekir.

Tu na, bila ew were.

8- Di pêşgotin û nameyan de cih ji mêjûyê vediqetîne.

**Mînak:** Amed, 14'ê Hezîranê 2008

## **Xalbêhnok(;)**

Tê nava cure û komên ku di nava hevokê de ne û bi bêhnokan hatine veqetandin.

**Mînak:** Ji dikanê şeker, xwê, mast; ji bazarê sêv, pirteqal, mendalî stendin.

Tê nava hevokên rêzîn yên ku hêmanên wan bi bêhnokan ji hev hatine veqetandin.

**Mînak:** Netirse êdî; ew bê jî, neyê jî em ê herin.

Destê min bigire; ez ditirsim, dixofim ji demê.

Di nava hevokên ku bi gihanekên weke lewre, lê belê, lê de tê bikaranîn.

**Mînak:** Têk çû; lewre nexebitîbû.

Ez ê bêm; lê şertekî min heye.

Pir li ber xwe da; lê belê bi ser neket.

- Dibe ku berî gihanekên weke lê, lê belê, lewre bêhnok jî bîn.

**Xalecot(:)**

Ji bo na ku mînak bîn dayîn dawiya hevokê de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Cureyên bêjeyê ev in: cînavk, hoker, rengdêr...

Beriya daxuyanî û piştî peyva ku bê ravekirin tê bikaranîn.

**Mînak:** Hêmanên hevokê pênc heb in: kirde, pêveber, têrker, bireser, hoker

Rengdêr: Ew peyv in ku beriya navan tên û wan li gorî hin taybetiyên wan dinimînin.

- Xalebêhnok ji bo girêdanê; xalecot jî ji bo pênas û daxuyaniyê ye.

Beriya axaftinê tê bikaranîn.

**Mînak:** Ehmedê Xanî di destpêka pirtûka xwe de dibêje: "Sernameyê name, namê Ellah/Bê namê wî natemam e wellah."

Di matematîkê de weke nîşana dabeşkirinê tê bikaranîn.

**Mînak:** 14:7=2

- Hevoka ku piştî xalecotê tê hevokeke serbixwe be bi tîpa mezin, mînakdayîn be bi tîpên biçûk tê nivîsîn

**Sê xal(...)**

**Tê piştî hevokên ku ji ber sedemekê, nehatine temamkirin.**

**Mînak:** Min ewqas bêriya te kiriye ku...

Ku encam bi dest nekeve...

Dema ku piştî mînakan bê bikaranîn tê wê wateyê "mînakên wiha" didomin.

**Mînak:** Ma me çî nexwar: Gûz, behîv, trî, arûng...

Di hevokê de tê ber peyvên ku mirov naxwaze bibêje.

**Mînak:** Dema ku peyva p... bi kar anî ez ecêb mam.

Dema ku em ji nivîseke din tişteki wer bigirin ji bona cihê ku me wer negirtiye divê sêxal bê danîn.

**Mînak:** Cegerxwîn di helbesta xwe de dibêje: "...Yekser ku hebûn im tî nesaxî mirin tev, gavan û şivan weke paşa û şeh im ez..."

### **Pirsnîşan ( ? )**

Tê piştî hevok û peyvên ku pirsê destnîşan dikin.

**Mînak:** Çima nayê?

Kengê çû?

- Di Kurmancî de bi derblêdanê jî pirs çê dibe, tê piştî wan jî.

**Mînak:** Ew çû?

- Hinek hevokên pirsê hene ku hewceyê bersivê nake, di wan hevokan de jî divê em pirsnîşanê bi kar bînin.

**Mînak:** Ma mirov ji jiyane hez nake?

Dema ku agahiya tê dayîn bi guman be pirsnîşan dikeve nava kevanekê

**Mînak:** Ehmedê Xanî di sala 1651'ê(?) ji dayik bûye.

- Peyvên pirsê her dem hevokên pirsê çê nakin û bersiv di nava hevokê de hebe ; wê çaxê ne hewce ye ku em nîşana pirsê bi kar bînin

**Mînak:** Kengî çû, nizanîm.

- Di hevokên rêzkirî de dema ku wateya pirsê hebe pirsnîşan tê hevoka dawîn, ango ne hewce ye ku mirov du, sê pirsnîşanan bi kar bîne.

**Mînak:** Te pirtûk xwend, çi jê fêhm kir, çi ket serê te?

### **Dunik (“ “)**

Dema ku em gotina yekî din veguhêzînin divê ew gotin têkeve nava nîşaneka dunikê.

**Mînak:** Ehmed Huseynî di helbesteke xwe de digot: "Eger hat û dawîya dawî xencer di kalanê de riziya/Eger hat û dawîya dawî hespê gumanê ji hişê te re reviya..."

- Dema ku mirov gotina yekî rasterast negire, ne hewce ye ku ew tişt bikeve nava nîşana dunikê. Ji ber ku êdî ew gotin li gorî kesê ku dibêje hatiye gotin.



**Mînak:** Helbestvan pêşveçûna helbestê dişiband konaxên demê.

Di nava hevokê de peyvên ku em dixwazin balê bikşînin ser dixin nava nîşaneka dunikê.

**Mînak:** Di çêkirina hevokên Kurmancî de rola “ku” yê pir girîng e.

Navên pirtûk, rojaname, kovar û nivîskaran jî dibe ku di nava nîşaneka dunikê de be.

**Mînak:** Celadet “Kovara Hawarê” di sala 1932’an de weşand. Xebata rêzimanî ya “Celadet Bedirxan” jî bo kurdan şoreşek e. Axaftin jî carinan di nava nîşaneka dunikê de tên dayîn.

**Mînak:** “Tu kengê diçî?”

“Ez ê sibê herim.”

“Zû were.”

Ji dêvla tiştên weke hev nîşana dunikê tê bikaranîn.

**Mînak:** Herêma Amedê

“ Botanê

“ Serhedê

- Nîşanekên din di nava dunikê de tên dawiya hevokê, tu nîşanek li derveyî dunikê nayê nivîsîn.

**Mînak:** “Ew çima nehat?”

- Piştî nîşaneka dunikê qertaf bê bi dabirê nayê jêkirin li derveyî dunikê tê nivîsîn û bi dunikê ve tê nivîsîn.

**Mînak :** Em ê îro “Rengdêr”ê binivîsin.

### **Baneşan (!)**

Piştî hevok û peyvên ku kêfxweşî, xemgînî, êş, tirs, ecibandin, heyîrîn, fermanê vedibêjin tê bikaranîn.

**Mînak:** Ax! Ev çî bû hat serê me.

Zû derkeve ji vir!

Çi xweşik e!

Piştî gotinên bangkirinê tê bikaranîn.

**Mînak:** Gelî xwişk û birayan!

Xelkino guhdar bin!

- Nîşaneka baneşanê dibe ku piştî peyva ku baneşanê dide jî bê bikaranîn dibe ku piştî hevoka ku baneşaniyê dide jî bê bikaranîn.

**Mînak:** Ax! Destê min. (piştî peyvê)

Zû derkeve der! (piştî hevokê)



### **Dabir ( ‘ )**

Qertafên diyarker dema ku bê nê hejmaran û navên kurtkirî, bi dabirê tî nê veqetandin

**Mînak:** 5'ê Gulana 2008'an ez ê bê.  
DTP'yê dest bi alîkariyan kir.

Ketina tîpên dengdêr bi dabirê tî nîşandan. Bêtir di helbestan de der dikeve pêşiya me.

**Mînak:** Ç' bikim yar nayê.

Pîştî qertaf û tîpê, parkîrê hebin bi dabirê tî nê veqetandin.

**Mînak:** Ji A'yê heta D'yê hûn bersiyar in.  
Gelek peywirên qertafa -î'yê hene.

### **Xêzekin (-)**

Peyvên rêzika hevokê tîrî wan nakin, bi xêzekinê tî nê jêkirin.

**Mînak:** Kurê Rustemê Zal Cîhangîr, di dema xwe de pehlewaneke xurt bû.

Ji bo tîkiliya di navbera du bê nê hejmarê de diyarker bike tî bikaranîn.

**Mînak:** Ferhenga Kurmancî-Îngilizî derket.  
Wê 5-6 kes bê nê mala me.

Hawar di navbera salên 1932-1943'yan de der diket.

Hevok û gotinên navîn dikarin tîkevin nava xêzekinan.

**Mînak:** Midûrê dibistanê -Elî Beg- duh hat.

Dema ku ket hundir -nizanim dîn bûbû- gelekî êrîşkar bû.

Dema ku kok û qertaf ji hev cuda dibin û peyv kîte dibin xêzekin tî bikaranîn.

**Mînak:** Xap-î-n-ok (kok û qertaf)

Xwend-e (kok û qertaf)

Di-rin-de (kîtekirin)

### **Xêzedirêj (Xêza Axaftinê) ( - )**

1- Di tekstan de ji bona ku axaftinê diyarker bike tî bikaranîn.

**Mînak:** - Çima tu ji min direvî?

- Ez nereviyame ji te.

- Ê baş e.

### **Xêzexwar ( / )**

Dema rêziken helbestan bi dû hev de werin ,ji bo cûdakirina rêzikan tî bikaranîn.

**Mînak:** Bê neqşê te neqşê xamê xam e/Bê namê te name natemem e

Di rêzimanê de ji bo nîşandana guherîna qertafan tê bikaranîn.

**Mînak:** im/me, e/ye, î/yî

Di navnîşan de tê bikaranîn.

**Mînak:** Kolana Hunerê Nû:34/7

Di matematîkê de weke nîşana parîne tê bikaranîn.

Mînak: 45/3:15

## FERHENGOK

Avanî : Çatı  
Aqûzatîf: Belirtme hali  
Baneşan: Ünlem  
Bêhnok: Virgül  
Bireser: Nesne  
Biwêj: Deyim  
Cînavk: Zamir  
Cudanavî: Dolaylama  
Cûre: Çeşit  
Çavkanî: Kaynak  
Çawanî: Nitelik  
Çendîtî: Nicelik  
Çîrokî: Hikaye  
Daçek: Edat  
Dançêker: Ettirgen  
Datîf: Yönelme  
Daraz: Yargı  
Dem: Zaman  
Dema bê: Gelecek zaman  
Dema borî: Geçmiş zaman  
Dema niha: Şimdiki zaman  
Dengdar: Sessiz  
Dengdêr: Sesli  
Dengzanî: Sesbilim  
Derbandin: Vurgulama  
Dijwate: Karşıt anlam  
Dubestî: İkileme  
Dunik: Tırnak işareti  
Erênî: Olumlu  
Gerguhêz: Geçişli  
Gihanek: Bağlaç  
Gotina Navdaran: Özdeyiş  
Gotina Pêşyan: Atasözü  
Guhêz: Aktarma  
Guhêzhevî: Mecaz-ı mürsel  
Hemwate: Eş anlamlı  
Hevdeng: Eş sesli  
Hevedanî: Birleşik

Hevok: Cümle  
Hêman: Öge  
Hoker: Zarf  
Kirde : Özne  
Kîte: Hece  
Lêker: Fiil  
Lêkerên birist: Düzenli fiiller  
Lêkerên bêrist: Düzensiz fiiller  
Lêkerên tebat: Edilgen fiiller  
Lêkerên lebat: Etken fiiller  
Lêkerên xweyînî: Dönüslü fiiller  
Lêkerên hevînî: İşteş fiiller  
Lêkerên têraniyê: Yeterlilik Fiilleri  
Lêkernav: Fiillimsi  
Lêkernava hokerîn: Zarf fiil  
Lêkernava navdêrîn: İsim fiil  
Lêkernava rengdêrîn: Sıfat fiil  
Mêjer: Tekillik-çoğulluk  
Navdêr: İsim  
Nediyarî: Belirsizlik  
Neyinî: Olumsuzluk  
Nêzwate: Yakın anlam  
Nîşe: Açıklama  
Olan: Yansıma  
Peyvsazî: Sözcük yapısı  
Peywir: Görev  
Pêkhatî: Türemiş  
Pêwendî: İlgî  
Perçînkirin: Pekiştirme  
Pêrkît: Önek  
Parkît: Sonek  
Pêşgotin: Önsöz  
Pêveber: Yüklem  
Pirjimar: Çoğul  
Pirsnişan: Soru işareti  
Qertaf: Ek  
Qertafên çêker: Yapım ekleri  
Qertafên diyarker: Belirtme ekleri  
Qertafên raweyî: Kip Ekleri

Qertafên raveberê: Tamlanan ekleri  
Qertafên ravekerê: Tamlayan ekleri  
Racivîn: Büzüşme  
Rastnivîs: İmla  
Ravek: Tamlama  
Rawe: Kip  
Raweyên demî: Zaman kipleri  
Raweyên xwestekî: İstek kipleri  
Razber: Soyut  
Rengdêr: Sıfat  
Resen: Temel,basit  
Sazbûn: Yapılış,yapı  
Sêxal: Üç nokta  
Şênber: Somut  
Teşe: Şekil  
Tewang: Büküm  
Têkel: Karma  
Têgîn: Terim  
Tîp: Harf  
Vegotin: Anlatım  
Veguhêzîn: Göçüşme,Metatez  
Wate: Anlam  
Wateye bingehîn: Temel anlam  
Wateya lêkirî: Yan anlam  
Wateya têgînî: Terim anlamı  
Xal: Nokta, madde  
Xalbendî: Noktalama işareti  
Xalebêhnok: Noktalı virgöl  
Xalecot: İki nokta  
Xwerû: Yalın,basit  
Xweşnavî: Güzelleme  
Yekjimar: Tekil  
Zayend: Cinsiyet

## ÇAVKANÎ

- Agglutinative language. [ceb.wikipedia.org](http://ceb.wikipedia.org)
- Balî,A.(1992).Kürtçe dilbilgisi, rêzimana kurdî. Alan Yayıncılık
- Bilbil,Î. (2007).Di kurmanciya jorîn de tewang. Çirûsk,hejmar 1
- Ciwan,M.(1992). Türkçe açıklamalı kürtçe dilbilgisi.Weşanên Jiyana Nû
- Cowan,J. (2005) A Quick tutorial on ergativity,by way of the squid-headed one  
[recycledknowledge.blogspot.com](http://recycledknowledge.blogspot.com)
- Bedirxan,C.A.(1998). Elfebêya kurdî bingehên gramera kurmacî. Nefel
- Bedirxan,C.A. û Roger Lescot (1991).Kürtçe dilbilgisi. Doz
- Bedirxan,K. Kolay kürtçe. Doz
- Ebdulfettah,D (2006).Cînav di zimanê kurdî de. Enstituya Kurdî ya Amedê
- Ebdulfettah,D (2006).Navdêr di zimanê kurdî de. Enstituya Kurdî ya Amedê
- Ergative-absolutive language. [ceb.wikipedia.org](http://ceb.wikipedia.org)
- Nominative-accusative language. [ceb.wikipedia.org](http://ceb.wikipedia.org)
- Farqînî,Z.(1998) Pêrkîtên di zaravayê kurmacî de. Zend,hejmar 5.
- Farqînî,Z.(1996) Dahûrîna li ser parkîtên di kurmacî de. Zend,hejmar 1
- Farqînî,Z (1997) Di kurmacî de guherîna dangan.Zend,hejmar 2
- Hirorî,N.(2005) Ergatîvî mohra kurmaciyê ye. [www.gelawej.org](http://www.gelawej.org)
- Hirorî,N.(2005) Tewang û ergatîvî wek nimûne. [www.amude.com](http://www.amude.com)
- Muhammed,H. Ergatîv di kurmacî û soranî de. [www.mehname.cjb.net](http://www.mehname.cjb.net)
- Qanatê Kurdo.(1991).Gramera zmanê kurdî. Koral
- Rizgar,Baran (1993). Uygulamalı kürtçe dersleri-dersên kurdi.Lithosphere Printing Cooperative
- Sagniç,F.H (1991).Hêmana rêzimana kurmacî. Melsa Yayınları
- Tan,S. (2005). Rêziman û rastnivîsa zaravayê kurmacî.Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê
- Zêrevan,A. (1997). Bingehên rastnivîsandina kurdiyê. Nefel